Kovara Sêmehane
Hejmar: 10
Havîn 2012

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran
Ercan Yıldırım

Edîtor
M. Zahir Ertekin

Lijneya Weşanê
Ebdulhadi Botî
Seyfeddin Aykaç
Zafer Acar
Ebdulcebbar Kavak

Tîprêzî û Berg
Erdal Yıldız

Web & e- mail
www.nupelda.net
kovaranupelda@gmail.com

Tlf/Fax
Tel: 0432 215 80 60

Navnîşan
Hastane Cad. Donat İş Merkezi
Giriş Kat No:6 Beşyol VAN

Çapxane
Vameda Ofset San.Tic. Ltd. Şti.
Tel: 0432 215 80 60 VAN
www.vameda.com.tr

Biha : 5 TL
Nimroya Hesabê PTT'ê
Muğdat ALADAĞ
06365815

- Nivîsên tên şandin nayên vegerandin.
- Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
- Lijneya weşanê, di nîvîsan de dikare serrastkirin û guherînê çêbike.

NAVEROK

BI HÊVÎYA VEJÎNEKE XWERÛ	3
BÊJEYA "DA"YÊ	7
Rîsaleya Remezanê	17
MEDRESEYA AXTEPEYÊ	22
KOMELEYA WEŞAN Û GIŞTÎKIRINA	27
PERWERDEYÊ A KURDAN	27
gava tî dibim	30
GORA BEDÎUZZEMAN LI KU YE?	31
GUNDIYÊN KEDKAR	35
Helqeyeke Zêrîn Jı Edebıyata Tesewifî	37
"Dîwana Mewlana Xalid" (II)	37
Pênc gav	39
PÎVANÊN JIYANÊ	40
BÎR	44
ÇERXA HEBÛNÊ	45
Baranek Dibare Li Derva Hûrik Hûrik…	46
Serpêhatıyên Nêzê Mırınê –II-	48
- Li Qusqûnqiran/Mila Dêrê -	48
J'LORÎNAMEyê	50
Ji Serî Heta Dawî	51
CEMED	54
PÊNÛSA MIN	56
XÛLÛSÎ ABÊ: YEKEMÎN TELEBEYÊ NÛRÊ	57
HESABÊ DU DÎRHEMAN	61
Gotara Bedîuzzeman a Kurdî	64
BERPIRSYARÎ	66
PÊLÎSTIKÊN MIRINÊ	68
MEDRESE: ENSTÎTUYÊN ZIMANÊ KURDÎ	69
DÎSA BIHAR	70
DI RONAHÎ YA AYETAN DE HORMON û OBG	71
SÎR	72
ZİMANÊ KURDÎ	74
ZIMANÊ KURDÎ: DO ÎRO Û SIBÊ	75
XEBERA TO EST A?	76
HOLİ HOLA...!	76
Mirina Reş	77
ŞÊX NEBÎ	79
Çîroka Xewnê	80

Ji Edîtor

Xwendevanên ‘Ezîz!

Bi mijar û mêvanên nû dîsa em bi we re ne. Di vê demsala germ de bi nivîs û xebatên hênik em mêvanê we ne. Nûpelda gihitşe hêjmara dehan. Helbet alîkarî û xwesteka we xwendevanan jî, di vê riyê de ji me re, rêhevaltî kiriye. Û dîsa em di vê baweriyê de ne ku kovar bi alîkarî û xwedîderketina xwendevanan dijîn.

Ji bo vî zimanê dîrokî roj tune ku gavên erênî neyên avêtin. Em bawer dikin ku di pêşerojeke gelek kin de kurdî wê hemû mafê xwe yên dîrokî, çandî, perwerdehî, civakî û hwd bi dest xe û di riya jiyanê de wê bibe ronahî û çira ji bo gelê xwe. Pêşketin û geşedanên erênî yên di warê zimanê kurdî de, rola kovaran bêtir derdixe ber çavan. Kovara kurdî ya Serhedî Nûpelda jî, dixwaze roleke mezin bilîze ji bo pêşveçûn û geşbûna kurdî. Nûpelda bi giştî ji bo hemû kurdan, bi taybetî jî ji bo kurdên Serhedê dibe riyek, dibe coyek, dibe çemek û dibe aveke zelal…

Di vê hêjmarê de jî me nivîsên ji hev xweştir, ji bo we neqandine. Helbet rewşa nîvîskar û helbestvanên kurdî jî ne mîna bêrê ye. Roj bi roj hem ji aliyê xweşnivîsiya nîvîskarên kurdî, hem jî ji aliyê hêjmara wan ve rewş bi awayekî teqdîrane geştir dibe. Ev bandor helbet li ser kovara me jî tê hiskirin. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku kovara me êdî gihiştiye asta neqandina nivîsan. Loma jî min got ku me ji we re nîvîsên ji hev xweştir neqandine. Bila hevalên ku nivîsên wan nehatine weşandin xwe nexeyidînin. Lewra hemû nivîsên ku têne şandin yek bi yek dikevine depoya/barxaneya arşîvê da ku di hêjmarên dahatû de bêne nirxandin. Ji bo pêwendiya nivîskarên xwe em gelekî spasdar in.

Kek **Ahmet Demir**, rêzenivîsên ***‘Ji Deryaya Bêjeyan’*** didomîne û vê carê bêjeya ***‘Da’*** daye ber xwe. Bi rastî ev rêzenivîs bi her awayî têne ‘ecibandin û ji bo lêkolînên akademîk ên zimanê kurdî dibine bingeh. Înşaallah di demeke nêz de ev xebatên giranbiha weke pirtûk dê bigihêje ber destê zimanzan, lêkolîner û xwendevanan.

Mehmet Baran, di nivîsa xwe ya ‘***Bi Hêviya Vejîneke Xwerû’*** de weke sernîvîskar di kovarê de ciyê xwe digire û li ser rewş û psîkolojiya rohilata navîn radiweste. Bi hêvî û tetkîkên xwerû û taybet derdikeve pêşberî me.

Ayhan Meretowar, Rîsaleya Remezanê ya Bedî’uzzeman werdigerîne zimanê kurdî û di vê meha Remezanê de berê me didê hikmetên rojiyê.

Zeynelabidîn Zinar li ser medreseyên Axtepeyê disekine û ‘alim û zanayên Axtepeyê tevî berhemên wan ên kurdî dide nasandin.

Aqîl Mihacir berê xwe daye ‘Komeleyên ku Bedî’uzzeman Seîdê Nûrsî Pê re Têkildar bû’ û li ser vê mijarê nivîseke balkêş û akademîk li ber me radixe.

A.Cebbar Kavak, di dîwana Mewlana Xalidê Kurdî de malikên Farisî wergerandiye û fikr û ramana Mewlana Xalid bi xwendevanan re parve dike.

Seyfeddîn Aykaç jiyana sehabiyan didomîne û vê carê mêvanê wî yê hêja ‘Emmarê kurê Yasîr e. Di nivîsa xwe de hem tema lêkolîneriyê hem jî tema çîrokbêjiyê xistiye nav hev û temeke xwerû derxistiye holê.

Ebdurrehîm Dost li ser jiyana Kekê Xulûsî radiweste û tabloyên dewra wî weke mînak hilbijartiye.

Ji bilî van xebatên hêja gelek çîrok, jînenîgarî, helbest, ceribandin û lêkolîn di nava rûpelên vê hêjmarê de ciyê xwe girtine.

Berî ku em gotinê bi dawî bikin, em cejna we ya Remezanê pîroz dikin. Heta hêjmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de.

M. Zahir ERTEKİN

BI HÊVÎYA VEJÎNEKE XWERÛ

Mehmet BARAN

Salnî hene ku em koma mezlûman li ser vê stêrgeranê bêxwedî û bindest in. Di nav sînorên ne rast û ne sirûşt de sêwî, henciqî û qurçimî nin. Ne destek heye ku ji dil ve me hembêz bike û piparêze, ne jî mêjîyek heye ku me li ser qada satranca bêînsafan rake û bifilitîne!

Demeke dirêj e ku, li rojhilata navîn atmosfereke bîndayî heye! Ne di warê jîyînê de, ne di warê fikirînê de azadîyeke bi ewle heye, ne jî di warê gotin û vegotinê de!... Digel Efrîqayê li Asyayê rewş wanî tengezar e; digel Ewropayê li Emerîqayê rewş wanî bi pirsgirêk e. Mixabin demeke dirêj e ku pelid û 'ewanan em li her deverê avêtine qada gladyatoran û me li wê qadê bi şêweyekî hovane berra hev didin.

Demeke dirêj e ku mirovên me li welatê xwe bi destê mêtingeran ve bûne parya: Hemû karên qirêj bi wan hatine kirin; hemû suxre li stuyê wan hatine barkirin, hemû karên ber nigan bi wan hatine dîtin. Li holê ne mirovahî hatîye hiştin, ne jî rastî û dadmendî.

Li hin deveran di bin zordarîya dîktatoran de ne, li hin deveran di nav xofa milîtarik de ne mirovên me. Li hinek deran bi navê komartîyê rêveberîyeke olîgarşîk dimeşe; li hinek deran li ser navê mirovahîyê nemirovahîyeke hişk tê sepandin. Cîhnî hene ku bi dehan sal in bi fenên xelkê, milet bi hev re şer dikin; cîhnî henin ku bi planên xelkê, bira ketine yaxa birê. Gelek welat hene ku zûdav da ye bûne mêtingehên mêtingeran; gelek behîşt hene ku pir zeman e bi destên pelîdîyan ve bûne dojeha mezlûman.

Ne hilberînên wan yê wan in li wan welatên ku hatine mêtingehkirin hêrî kêm sê-çar sed sal in, ne jî keda wan li wan li wan bi kêr tê û faydê dike. Ev mişexurên ku ketine stûyên wan, çend sedsal in ked û hêzên wan dixwin, gencîneyên wan didizin, dewlemendîyên wan talan dikin.

Li alîyekî din, bila were bîranîn ku heke em **Serdema Şadîyê** û ya **Çar Yarên Guzîn** neḧesibînin, şênîyên cîhana me hew carekê di heyama Umerê lawê Evdilezîz de, carekê jî di heyama Selḧeddîn da, mirovane û dadwarane jîyane.

Car di bila were bîranîn ku dîroka vê herêmê, ma ḧeta Eyyûbîyan bi piranî bi gengeşîyê û bi alozîyê û bi dagirîyê û bi birakujîyê derbas nebûbû? Berî ku bi duristkirinên xwe ve Selḧeddîn dernekeve holê, mêtingerên wê dewrê yên xaçparêz, hindik nemabû ku ew parzemîna me tevhev bigirtana?

Bi xuyabûna xelaskarên pîroz qeḧremanê Misilmanan yê Eyyûbî ve bextê Rojhilata Navîn çawa guherî! Ew gelên ku ḧeya wê deme, parçe parçe bûn û hew şûr li stûyên hev dixistin, bi xuyabûna eyloyê Selḧeddîn ve bi carekê va çawa veguherîn û dest ji şerên navxweyî berdan? Hêzên xwe yên belavbûyî bi yek va çawa koma ser hev kirin û çalakîyên xwe hemû çawa tevlî vê senfonîya nû kirin?

Bi wê şiûr û bîrewerîyê, hemûyan armancên xwe kirin yek; yek fikirîn, yek axifîn. Ew hêzên wan ên ku ḧeya wê rojê diherikîn çolan û tê da wenda dibûn, bi hatina Selḧeddîn ve koma

ser ẅewzekî kirin. Bi vê kombûnê bawerî û gîyanekî geş kete nav dilan; bi wan veguherîn û nûjenbûnan va beden û mêjî û vîn, mîna ku nû vebijin, rabûn ser pîyan û bi xwe hatin; bi wê candarî û zindîtîyê hêzeke wisa paqij û fadil ji wê civatê hat çêkirin ku te digot mêrxasên wê hemû mêrxasên Bedrê nin.

Bi kombûna wan hêzên belavbûyî, hevgirtineke zexm hate çêkirin li ʻenîya me. Bi vê rewşa xwe ve cîhana me wek **Serdema Şadîyê** ji nû ve vejîya. Ew lep ê pîyên şikestî bi hev ve cebirîn û ew bedena du ta bûyî, qey te digot ji nû ve ciwan bû. Vejînek wisa pêkanî ku wê civatê, toz û xubara sedsalan bi carekê ve li ser xwe avêt.

Piştî ku gelê me gihaşt vê astê, hînga berê xwe da qewetên kedxwar û mêtingerên qirnî, bi têkoşîn û mucahedeyeke poladane, digel hemû nihêrîn û nirxandinên wan ên şom û bêxêr, tevhev avêtin nav pêlên behrên bêbinî.

Çuqas artêşên Ewrupayê hebûn, mîna gurên ku êrîşî pezê mêşin kin, hemû ketibûn rê û hatibûn talankirinê. Ev hovana dixwestin ku serwerîya cîhanê ya di destên Misilmanan da ye, bi destxin. Hîmê tevgera wan li ser kedxwarî û dagirkirî û mêtingerîyê bû. Dadmendî û edaleta wan li ser darê zorê bû. Kî bi hêz bûya, daxwaza wî pîvan û edalet dihat ẅesibandin. Bi van kesayetîyên xwe yên ji neẅeqîyê çêbûyî, belê, dixwestin ku rêveberîya dinyayê bi destxin.

Lêbelê îcar li vî alî, yên ku li hemberî wan sekinîbûn û têdikoşîyan, hîmên xwe danîbûn ser bawerîyeke zexm û gihîştî. Bi her alî ve zîrek û egîdên mînak û bijarte bûn. Biryarên wan li cîh û dadmend, çalakî û kirinên wan erênî û avakerane bûn. Bi her hêlê ve paqij û mengî bûn. Li alîyekî di şevên mêtingeran, ji şevan tarîtir, rojên wan dagirkeran wekî dojehê bi qeẅr û qotik bûn; lê şevên endamên gelê me î li ser bingeha bawerîyê vejîyayî mîna rojan ronahî, rojên wan pakgîyanan jî wekî behîştan bi her alî ve rewneqdar û bi nûr bû.

Belê nuha jî dagirîyek heye li ser me, li ser qada me, bi taybetî jî li ser dewlemendîyên me yên bawerî û çandî û civakî û dîrokî... Sed - du sed sal in ku, dilînên me li gor avêtinên dilên me tevnagerin! Vînên me li gor pîvanên me napîvin û li gor nirxên me nanirxînin! Xuset û xulqên me li gor gencîneya bawerîya me naşekilin! Hemû dil hatine qulubandin, hemû mêjî hatine jehrkirin û hemû kesayetên me hatine veguherîn... Wisa ku ji bo yên ku dixwazin bibînin ra, rewşeke ji **Serdema Nezanîyê** û ji **Sedsala Heftem** hezar carî xirabtir heye îro li holê...

Demeke dirêj e ku ne dest û lepên me di bin emrê me da ne, ne jî pî û lingên me li gor daxwazên me tevdigerin. Ji bo vê yekê hemû kirin û hilberînên gelê me li ser navên xelkê ne û serkevtin û qezencên gelê me li ser navê xwînmijan tên ẅesibandin.

Li ser welatên me, yanê li ser axa parzemîna Asya û Efrîqayê (Rojhilat û başûrê rojavayê Ewropayê jî di bîra me de ye) ji sedsala 16an û vî alî ve, dagirî û mijokatîyek bê însaf têye meşandin. Pênc sed sal in zalim û zordest diguherin lêbelê dagirî, mêtinî û mijokatî naguhere li ser van deveran.

Nexşeya cîhanê li gor berjewendîyên dilên mêtingeran hatîye xêzkirin; Li gor "li hev parvekirin"a kan û kanîyên sererd û binerd yên dewlemendîyan, bi destên wan sînor hatine danîn. Dever hebû ku ji heman neteweyan pêkdihat, an jî heman deşt bû; lêbelê çima ku dewlemendîyên binerd para çend mêtingeran ketibû, ew dever dibû ewqas parçe. Heke îroj axa ku Kurd li ser dijîn hatîye çar-pênc parçe kirin, meriv dikane bi awayekî riẅet bibêje ku, ev, li gor divêtîyên berjewendîyên mêtingeran yên serdemî nin. Îngilîz û Firansizan xwest ku li Rojhilata Navîn, qerteke temendirêj her dem di destên wan de hebe. Û mixabin Welatê Kurdan bûye ew qert û nêzî sed salan e ku di destên wan xwînmijan da ye.

Nişteclyên Rojhilata Navîn, ji Misilmanbûna

xwe û bi vî alî ve, bi qasî ku di sedsalên 19 û 20an de zilm û zordarî dîtin, ez wisa difikirim ku di tu sedsalan de neditin.

Li piştî du şerên Cîhanê dihat payîn ku, rengekî mirovane xuya bibe li ser qada cîhana me; lê mixabin, bi hemû fên û dubareyên xwe ve Heleneya fêlbaz, bi hemû zor û zilmdarîya xwe ve Romaya zordest û bi hemû xayîntî û minafiqtîya xwe ve Çarên xwînrij careke din derketin holê! Him wisa bi kirinên xwe ve derketin meydanê ku, hemû aqil û mêjîyên xwedî tecrube mat û şaş kirin berdan!

Ḧal ev ku, hemû egît û parastvan li hember xirabî û nerindîyên wan, di nava amadekarîyê de bûn; lêbelê îcar wekî her caran êrîş nekirin van nerindan; ji hemû taqtîkên berê cihêtir û cudatir xwe nîzîkî kozikên me kirin; vê carê bi cil û bergên xweşik, bi sewt û dengên nerm, bi xuyabûnên nûjen û bi navgînên modern, xwe nîşanî me dan. Parastvanên me yên maddî û manewî loma xam ketin û berxwe nedan û bi her hêlê ve radestî van êrîşkarên rûheval lê bîr û bawerî neyar bûn.

Bi ev cil û bergên xwe ve dilînên me vemirandin û guherandin ev ʻewanên nûjen, bi ew sewt û dengên xwe yên mestdar ve guhên me ker kirin. Bi wan dîmenên xwe yên mestkirî ve, em ji rewşa xwe ya esil fedîkar û şermend kirin; û bi wan wasîteyên xwe yên modern ve, tevgerînên me yên wekî fikirîn, nirxîn û tanişîn/şêwirîn li nav me derxistin û ji me dûrxistin. Li hember van bûyer û guherîn û veguherînan, qey te digot vînan, ji mejîyên mezin barkirine û çûne welatekî dûr.

Çi bû, bû; û wisa dixuye ku di paşeroj û ristandina îroj da cîyê xwe girt. Lêbelê ligel van hêmû xirabî û nerindîyan, nuha vejînek jî dixuyê li ser parzemîna me mîna ku di heyama Selḧeddîn de jî xuya bûbû… Di nav gelên me yên bindest da vejînek xwerû dixuyê nuha… Him bi alîyê kesayetîyê ve ye ev vejîna li ser zemîn xuya dike, him jî bi alîyê komeleyîyê ve ye! Heke ẍeletî yan jî nêrînên xirab, wana di qulwara wan a nuha da dernexînin, ne di demeke pir dûr û dirêj de, di demeke pir nêz da wê her hêlan kesk û sor bike bi gul û kulîlkan… Wê her deveran veguherîne fîrdewsan...

Di vî zemînê li pêş me da, wê tevgera cîhanê li ser dad û edaletê be; çerx, niva wê bi nûr û rohnahî be; armanca jîyîn û jîyandinê wê razîbûna Mîhrîban û xawên be. Wê gur û mîh tev biçêrin; wê mêş, ji nuh ve pêtagan girêbidin; bilbil, wê ji nuh ve li ser gulan bixwînin; perîde, wê ji nû ve peran lêdin û bi banî kevin… Keskesor wê cardin bi rûyên xwe yên rengîn û kenîn li nifşên nuh binihêrin û destên xwe ji wan re hêlkin.

Mekteb, wê ji nuh ve dest pêbikin ji bo we! Zengil wê careke din bi zimanê we lêkeve… Mamoste wê careke din bi zimanê we biaxifin… Kitêb wê careke din dengê dilên we, bi we bidin bihîstin… Defter wê careke din li gor nefesên we werin nivîsîn…

Pir xeman mexwin… Dema kêfxweşbûna

Xanî jî wê bê, dema rastbûna mizgîna Vejînkar jî wê were… Hele hinekî din bisebirin û bixebitin… Ez dibêjim ku werin em li xwe binihêrin, li karên xwe, li xebatên xwe, li dil û xeyalên xwe bimeyizînin! Mêzebikin û dûzanê bidin helwest û çalakîyên xwe û dilên xwe. Gelo dilîn û bîrên we li gor daxwazên wê nin an na? Li hember dayînên WÎ, em pêdivîyên xwe bi ẅeqî pêktînin an na? Belê divê em li xwe binihêrin û çi bi roj, çi bi şev hemû kar û xebatên xwe, serrast bikin... Bikin ku em hemû, li ẅizûra serbilindan serbilind bin... Binihêrin da ku em giş, li cem mezinan fedîkar dernekevin.

Bi serkevtbûna xortên me yên ku ewqas sal in di mekteba mulkîyeya îçtimaîyê de dixwendin, em dilgeş û bexteyar in! Rast e û li cî ye; lê em bi xwe di çi ẅalî û di çi tevgerê de ne? Bîr û bawerîya me wek hev in an na? Raman û dilînên me hevrast in an na? Lêdana dilên me li gor bîr û bawerîya me ye an na?

Li dû standina dîplomeyan, ji wan tê payîn ku ev xortên esilzade careke din werisê parzemîna xwe têxin destên xwe û alaya mirovahî û xawênîyê di asoyê gihîştinê de daçikînin!… Ez bawerim wê di pêşerojê de vê vatinîyê jî bi ẅeqî wê bi cî bînin; lê cardin bibêjim ku em li ku ne, di çi rewşê de ne û di çi tevgerê de ne? Her kes helwestên xwe li gor pêwîstîyên xwe dişekilînin; gelo hûn helwestên xwe çawa dirêsin û bi meyîzandin didin? Baldar bin, ji qefle dûr mekevin yanê li dawiyê memînin!

Ligel vê vejînê, ey xortên me yên pîroz û bi mizgîn! Di nezera qedera mêjîn da li dijî înyada felekê, di nava cisnê mirovatîyê de razên ẅîkmeta ezelî bi her awayî çirûsk çirûsk bitavînin!

BÊJEYA “DA”YÊ

Ahmet DEMİR

Bêjeya “da”yê di Kurdî de ciyekî girîng werdigre. Ne hew di Kurmancî de di hemû zaravên Kurdî de jî qîmetdar e. Bi vê forma xwe ve ev bêje ne tewnadî ye û di wateya diya mirovan da û di wateya dema borî ya “dayîn”ê da ye. Formên vê bêjeyê yê di wateya “dayîk”ê de yên tewandî “dê” û “di” nin. Ji ẍeynî van forman di Kurdî de gelek formên vê bêjeyê yên tewandî û yên ne tewandî hene. Ḧeya ji dest me bê, em ê li jêr formên vê bêjeyê yên ku di hemû zaravên Kurdî de tên bikaranîn, digel wate û peyamên wan û digel kok û qertafên wan, bi we naskirin bidin.

Dê, kesa ku em anîne cîhanê ye. Parêzkara herî ji dil, ya herî xurt û ya herî cangorî ye. Ji bo vê yekê, hemû formên “da”yê bi wê re têkildar, hemû bêjeyên jê çêkirî bi wê re watedar in. Ne dêmarî dikane dewsa wê bigre, ne jî jinbav! Di dilê zaro da ciyê diya wî/wê nayê tarîfkirin. Di jiyanê de ez dibêjim ji bo zaroyan dema herî bê siûd, a ku bê dê dimîne ye. Li ber destê dêmarî û zirdêyan mezinbûn –tew ku bê însaf û bê wîjdan bin- bi serê xwe xem e, derd e û îşkence ye (gotinên min ne li ser dêmariyên mêhrîban in). Ji bo vê yekê, dê, tiştekî din e di jiyana mirovan da.

Hin vekolîner dixwazin bêjeya “da”yê bi bêjeya “dhe-î”ya Hîndûewropî ve girêbidin. Ḧal ev ku, di vê makezimanê de ev bêje tê wateya “mêtin / mêjtin”a Kurmancî. Îcar di wateya “mêtin”ê de di zimanê Protoaryayî de “da”, di zimanê awestayî de “daenû” di Pehlewî de “dayek”, dihat bikaranîn. Di roja îroj da di zimanê Osetî de bêjeya “daejyn”ê di wateya “mêtin”ê de, di zimanê Farisî de bêjeya “daye”yê di wateya “hevşîre / ebe”yê da ye.

Ji bo vê yekê, eger bêjeya “da/dê”yê îla ku

dike bi “mêtin”ê re were têkildar kirin, li dewsa bi bêjeya “mêtin”ê re rûbirûkirinê, bi bêjeya “*dotin*”ê (bi Tirkî “*sağmak*”) re rûbirûkirin, li gor min hîn watedar û hîn li cî ye. Lewra wê çaẍê, meriv riḧet dikane bibêje, “dot”a (keçika) Kurmancî, “duxter”a Farisî, “daughter”a Îngilîzî û hwd. bi vê “dotin”a Kurmancî û “dhe-î”ya Hîndûewropî û bi “daenû”ya Awestayê û bi “dhayetî”ya Sanskrîtiyê re têkildar e!

Îcar li aliyekî din li ser çavkaniya bêjeya “da / dê”yê, divê hin nêrîn û nirxandinên cihê jî werin îfadekirin:

Wekmînak, gelo pêkan nin e ku çavkaniya bêjeya “da / dê”yê, lêkera “dayîn”ê bi xwe be? Jiber ku “da / dê” dayînkar e, yanê zaroyan dide, “dayîn” jî dayînkar e, yanê tiştan dide. Heke dawîneya raderê “-(y)în” ji forma radera “dayîn”ê were rakirin, wê were dîtin ku li holê rasterast koka lêkera “da”yê dimîne.

Li ser çavkaniya bêjeya “da”yê nirxandinek jî wiha ye: Gelo mumkin e ku bêjeya “da / dê”yê ji bêjeya “za”yê veguherîbe? Jiber ku bêjeya “za”yê

jî tiştekî nuh (zaro) tîne dinyayê, bêjeya "da"yê ("da"ya mijara me) jî tiştekî nuh (zaro) tîne cîhanê.

Her çiqas ev nêrîna dawiyê hinekî ji rêzê der dixuye jî, nenivîsandin û negotina wê jî, mijar nîvçe dihişt.

Li jor hat gotin ku, ev bêje, di hemû zaravên Kurdî de tê bikaranîn. Di Kurmancî de bêjeya "da, dad, dayik, dêl"ê, di Kirdî / Kirmancî / Dimilî / Zazakî de bêjeya "da", dadî, dayk"ê, di Hewremanî de bêjeya "eda"yê, di Soranî de bêjeya "da, dayk, dêl"ê hew çendekên ku tên bikaranîn in.

Wekî hûn dizanin, di *Serdema Antîk* da demdemî be jî dûgelên wekî Med, Pers, Part û Sasaniyan, serweriyên xwe hew li Îranê nemeşandin; ji Anatoliyê bigirin ḧeya Yewnanîstan û Makedonyayê, ji Misirê bigrin ḧeta Hindîstanê û ji Asya Navîn bigrin ḧeya Qafqasyayê û Bakurê Deryaya Reş, desthilatdariyên xwe meşandine. Wekî ku wê were texmînkirin, zimanê van dugelan jî li van zemînan belav bûye. Îroj, heke di zimanê Gurciyan da di wateya "dê" da bêjeya "deda"yê, di zimanê Lazî de bêjeya "daduli"ê (dêl) heye, di nirxandin û şîrovekirinê da, divê meriv ew têkilîyên dîrokî / mêjûyî jî bide ber çavên xwe. (Di derḧeqê Lazan da ez nuha viqasî bibêjim ku li gor agahî û çavkaniyên heyî, di aliyê merivatiyê de têkiliya wan bi Kurdên "Lek"an ra heye; lê ev mijar, jiber ku rasterast ne dabaşa bêjenasiyê ye, li vira em bi awayekî berfireh li ser nasekinin).

Bandora Kurdî li ser zimanê Tirkî jî çêbûye. Bêjeya ku di vê nivîsê de mijara me ye, "da" ye û tevlî forma xwe ya esil, di Tirkî de jî tê bikaranîn. Bêjeyek ku di wateya birayê "da"yê de tê bikaranîn "**da**yi" ye (lê, çiqas balkêş e ku bi vê formê di roja îroj da, bi qasî ku em dizanin, di Kurdî de nayê bikaranîn); yek di wateya xweha "da"yê da tê şixulandin "**da**yze / **te**yze" ye; yek di wateya dapîra şîr de tê bikaranîn "**da**ye" ye; yek di wateya murebiyê de tê emilandin, "**dad**i" ye; yek jî di wateya "Ji bo gihaştina zaroyekî an jî tiştekî alîkarî / dêtî kirin, lênihêrîn" de tê bikaranîn "**da**yelik" e. Lewra di Tirkî de bêjeya ku di wateya "da"yê de tê bikaranîn "ana / anne" ye û di warê bêjenasiyê de ev bêjeyên ku me di Tirkî da nîşan dan, bi vê

bêjeya "ana / anne"yê re, ne têkildar in; li dijî vê bi bêjeya "da"yê re têkildar û watedar in.

Di ferhengên qlasîk yên Kurdî de em rastî gelek formên vê bêjeyê tên.

Wekmînak di *Nûbihara Biçûkan* da di wateya "dê" da rasterast bêjeya "da"yê hatiye danasîn.

Di *el-Hedîye*yê de, di wateya dayikê da bêjeya "dê" û ya "da"yê, di wateya bangkirina dê da bêjeya "dayê", di wateya daşîrê da "dayîn", di wateya kuçik an jî gurên mê da "dêl", bi taybetî di wateya gurê mê da "dêlegur", di wateya marîjokê da "dêlemar", di wateya jinbavê da "dêmarî" û "damarî" yek bi yek hatiye danasîn.

Ev bêje, teva / tevlî hemû paşeroja xwe ya dewlemend û bi giranî û rûmetdariya xwe ya mezin ve, gihaştiye roja îroj û bi şêwazeke rûken û bi nêrîneke dilovîn li me dinihêre, û bi destên xwe yên fedakar û cangorî gelek diyariyan ji me re pêşkêş dike. De kerem kin em bi hev re li wan diyariyên "da"yê binihêrin!

DI KURMANCÎ DA PEYAM û FORMÊN BÊJEYA "*DA*"YÊ

Bêdê: Kesê/a ku diya wî/wê miriye, an jî lê xwedîtiyê nake. Sêwî, hêtam / êtim. Bêjeya "bêdê"yê, ji daçeka neyînî "bê-"yê û ji forma tewandî ya bêjeya "da"yê yanê ji "dê"yê çêbûye.

Bêdêbav: Kesê/a ku dê û bavê wî/wê mirine, an jî lê xwedîtiyê nakin. Sêwî, hêtam / êtim. Bêjeya "bêdêbav"ê, ji bêjeya "bêdê"yê û ji bêjeya "bav"ê çêbûye.

Bidayik: Kesê/a ku xwedî dê / dayik e. Yê/a ku diya wî/wê saẍ e; yê/a ku diya wî/wê xwedîtiyê lê dike. Ev bêje, dijwateya bêjeya "bêdê"yê ye. Bêjeya "bidayik"ê, ji daçeka erênî "bi-"yê û ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û xweşikirinê "-ik"ê çêbûye; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "i"yê.

Bidê: Yê/a ku xwedî dê ye. Yê/a ku diya wî/wê saẍ e; yê/a ku diya wî/wê xwedîtiyê lê dike. Bêjeya "bidê"yê jî, dijwateya bêjeya "bêdê"yê ye. Bêjeya "bidê"yê, ji daçeka erênî "bi-"yê û ji forma tewandî "dê"yê (ya bêjeya "da"yê) çêbûye.

Da: 1. Jina ku zaro anîye dinyayê. Jina ku bi kêmî, zaroyekî wê heye. Ev form, eslê bêjeya "dê"ya tewiyayî ye. 2. Ev nav li hin deran ji bo dapîran tê bikaranîn. 3. Dema borî ya lêkera "dayîn"ê.

Dada: Di zimanê zarokan da îfadekirina bêjeya "dayê" ye. Wekî dixuye bêjeya "dada"yê, bi ducar gotina bêjeya "da"yê çêbûye.

Dadê: Dema gazîkirina li"dad"ê de tê gotin. Bangkirina zaroyan ya diya xwe. Bêjeya "dadê" ji bêjeya "dad"ê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin.

Dadî: Jina ku li dewsa dê, li zaroyan dinihêre. Bnr.: Dadîk, dadok. Bêjeya "dadî"yê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa "-dî"yê (ji "–de"yê), an jî ji bêjeya "dad"ê û ji xurdepaşa nîsbetê "-î"yê hatiye çêkirin.

Dadîk: Jina ku li dewsa dê, li zaroyan dinihêre. Bnr.: Dadok, dadî. Bêjeya "dadîk"ê ji bêjeya "dadî"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẅezkirinê "-k"ê hatiye çêkirin.

Dadîkî: Yên ku bi dadîkê re têkildar in. Karê ku dadîk dikin. Wekî dadîkê. Bêjeya "dadîkî"yê ji bêjeya "dadîk"ê û ji xurdepaşa nîsbetê "-î"yê hatiye çêkirin.

Dadîktî: Mîna dadîkan, bi şêwaz û awayê dadîkan tevgerîn. Bêjeya "dadîktî"yê ji bêjeya "dadîk"ê û ji xurdepaşa şêwazî û awayiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dadok: Jina ku li dewsa dê, li zaroyan dinihêre. Bnr.: Dadîk, dadî. Bêjeya "dadok"ê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa "-dî"yê (ji "–de"yê) û ji a biçûkkirin û ẅezkirinê "-ok"ê; an jî, ji bêjeya "dad"ê û ji xurdepaşa piçûkeriyê û ẅezkirinê "-ok"ê hatiye çêkirin.

Daê: Di dema gazîkirina dê de tê gotin. Bangkirina zaroyan bal diya xwe ve. Bnr.: Dayê. Bêjeya "daê" ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin. Ev form bi piranî di nivîsên ku bi elifbaya Kurdî-Erebî hatine nivîsandin de derbas dibe.

Dak: Dê. Diya merivan. Bêjeya "dak"ê (bi gumaneka mezin ji "dayîk"ê) ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin, yekkirin û ẅezkirinê "-k"ê hatiye çêkirin.

Dakil: Diya çav bi kil. Diya ku çavên wê hatine kil kirin. Bi piranî di forma "dakilê" de tê bikaranîn. Bêjeya "dakil"ê, ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "kil"ê hatiye çêkirin.

Dakilê: Bangkirina dê a bi ẅez, wekî "diya mina çav bi kil!". Diya mîna çav reş. Bnr.: Dayê, dayîkê. Bêjeya "dakilê", ji bêjeya "dakil"ê û xurdepaşa bangkirinê ya mêtiyê "-ê"yê hatiye çêkirin.

Dakile: Diya mîna çav bi kil. Bêjeya "dakile"yê, ji bêjeya "dakil"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê hatiye çêkirin. Dê, dayîk.

Damarî: Jina ku li dû dê, bi bavê zaroyan ra dizewice. Ne diya bîyolojîk. Li gor zaro, bi nav kirina vê jina bavê. Kesa jina bavê kesekî / kesekê ye; lê ne diya wî / wê ye. Jinbav. Bnr.: Dêmarî, zirdê. Bêjeya "damarî"yê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "-marî"yê hatiye çêkirin. Bêjeya "marî"yê jî tê wateya dê; lêbelê di Kurmancî da zêdetir di wateya diyên ẅeywanan da tê bikaranîn. Îcar di Kirdî da bêjeya "mare"yê rasterast di wateya dê da jî tê bikaranîn.

Dan (ji "dayîn"ê): Ev bêje lêker e. 1. Dîyarî kirin, araste kirin, bexşandin, raber kirin, pêşkêş kirin (*Min kulîlkek da diya xwe*). 2. Zabûn, anîn dinyayê, riẅ dayîn (*Xwedê tu kînga dayî?*). 3. Jê çêbûn, jê peyda bûn ("*rengên xwe dan*", "*ber dan*" yanê *ber girtin*). Bêjeya "dan"ê ji bêjeya "dayîn"ê ve-

guhriye; ev lêker jî ji "da"yê û ji dawîneya raderê "-în"ê hatiye çêkirin; tîpa "î"yê ji raderê ketiye.

Dapîr: 1. Diya dê. 2. Hevşîreya ku zaroyên jinan tînin cîhanê, ebe. 3. Jina sal zêde. Bêjeya "dapîr"ê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "pîr"ê hatiye çêkirin.

Dapîrok: Diya dê. Dapîra biçûk û xweşik. Bêjeya "dapîrok"ê ji bêjeya "dapîr"ê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẖezkirinê "-ok"ê hatiye çêkirin.

Daşîr: Jina ku zaroyê/a jineke di, bi şîrê xwe dimêjîne yan jî mijandiye. Jina ku zaroyên jineke di xwedî dike an jî xwedî kiriye. Bnr.: Dêşîr, deyşîr, dayîkşîr, dayen, dayîn. Bêjeya "daşîr"ê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "şîr" hatiye çêkirin.

Dayê: Dema gazîkirina li dê de tê gotin. Bangkirina zaroyan ya diya xwe. Bêjeya "dayê" ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin. tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "ê"yê.

Dayen / Dayên: Jina ku zaroyê/a jineke din, bi şîrê xwe dimêjîne yan jî mijandiye. Jina ku zaroyên jineka di xwedî dike an jî xwedî kiriye. Bnr.: Dêşîr, deyşîr, dayîkşîr, dayîn. Bêjeya "dayen / dayên"ê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û şibihandinê "-en / ên"ê (ji "–in"ê) hatiye çêkirin.

Dayende: 1. Ya/ê ku dide, bexşende. Bêjeya "dayende"yê, ji bêjeya "da"yê û ji tîpa "y"eya ku ketiye navbera dengdêrên "a" û "e"yê û ji xurdepaşa wekîtî û têkildariyê "-ende"yê hatiye çêkirin. 2. Ya ku bi "dayen"ê dimîne, mîna wê. Bêjeya "dayende"yê, ji bêjeya "dayen"ê û ji xurdepaşa wekîtî û têkildariyê "-de"yê hatiye çêkirin.

Dayîkane: Mîna diya şîrîn; bi awayê diyake merhemetdar. Bêjeya "dayîkane"yê ji bêjeya "dayîk"ê û ji xurdepaşa pêmayîn û şibihandinê "-ane"yê hatiye çêkirin.

Dayîkatî: 1. Hesta / dilîna dayiktiyê. 2. Lebata dayiktiyê. Bêjeya "dayîkatî"yê ji bêjeya "dayîk"ê û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-atî"yê hatiye çêkirin.

Dayikê: 1. Bangkirina li dayê. 2. Jina ku wekî dê tê dîtin û giramî jê re tê nîşandan. Bêjeya "dayîkê", forma bangkirina li "dayîk"ê ya mêyîtiyê ye.

Dayikî: 1. Tiştên bi dayikê re têkildar. 2. Tiştên ku nîsbetî dayikê dibin. Bêjeya "dayîkî"yê ji bêjeya "dayîk"yê û ji xurdepaşa nîsbetê "-î"yê hatiye çêkirin

Dayikîtî: 1. Kirina dayikiyê. 2. Bi awayê dayîkê tevgerîn. Bêjeya "dayîkîtî"yê ji bêjeya "dayîkî"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dayikşîr: Jina ku zaroyê/a jineka di, bi şîrê xwe dimêjîne yan jî mijandiye. Jina ku zaroyên jineka di, xwedî dike an jî xwedî kiriye. Bnr.: Deyşîr, dêşîr, daşîr, dayen, dayîn. Bêjeya "dayikşîr"ê ji bêjeya "dayik"ê û ji bêjeya "şîr" hatiye çêkirin.

Dayiktî: Dayîkî kirin. Tevgerîna wekî dayîkan. Bêjeya "dayîktî"yê ji bêjeya "dayîk"ê û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dayî: Tiştê hatiye dayîn. Bêjeya "dayî", ji lêkera "da"yê û ji qertafa dema borî "(y)î"yê hatiye çêkirin.

Dayîn: 1. Jina ku li dewsa dê, li zaroyan dinihêre. Jina ku zaroyan diperwerîne / terbiye dike. Menendê diyan. 2. Mîna diyan, bi awayê diyan. 3. Dayika şîr, jina ku bi mişe / bi heqdestê şîr dide zaroyan. Bnr.: Deyşîr, dêşîr, daşîr, dayîkşîr, dayen. 4. Yê/a ku xwedî dê ye. Yê/a ku diya wî/wê saẍ e; yê/a ku diya wî/wê heye. Bêjeya "dayîn"ê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û şibihandinê "-în"ê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "î"yê.

Dayînî: 1. Wekî dayînan tevgerîn. Bi dayînan ra têkildar. 2. Mîna jina ku zaroyan diperwerîne; ya ku bi wê dimîne. 3. Karê bi mişe şîrdayîna zaroyan. 4. Yê ku bi karê dayînê dimîne. Bêjeya "dayînî"yê ji bêjeya "dayîn"ê û ji xurdepaşa nîsbetê "-î"yê hatiye çêkirin.

Dayik / Dayîk / Dayêk: Dê. Bi awayekî ẖezkirî gotina navê dayê. Diyeke bi tenê, bê menend. Diya diyan. Diya merivan. Bêjeya "dayk / dayik / dayîk / dayêk"ê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepa-

şa biçûkkirin û ẅezkirinê "-k, -ik, -îk, -êk"ê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "i, î, ê"yê.

Dayk: Jina ku mirov jê hatiyê dinyayê. Bi awayekî ẅezkirî gotina navê dayê. Bêjeya "dayk"ê, bi gumaneke mezin formeke bêjeya "dayîk"ê ye. Bêjeya "dayk"ê, ji bêjeya "dayîk"ê veguheriye û ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẅezkirinê "-îk"ê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "î"yê. Lêbelê tîpa "î"yê ji bêjeyê ketiye.

Daykanî: Mala ku sermiyan dê ye; tevgera malê di destê dê da ye. Bêjeya "daykanî" ê ji bêjeya "dayk"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-anî"yê hatiye çêkirin.

Daykanîtî: Tevgera ku rêveberî di destê jinan de ye. Bêjeya "daykanîtî"yê ji bêjeya "daykanî"yê û ji xurdepaşa şêwetî û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Daykemar / dayîkmar: Marîjokeke zer û mezin. Bnr.: Dêlemar, dêmar. Bêjeya "daykemar"ê, ji bêjeya "dayk"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "mar"ê hatiye çêkirin.

Dê: Jina ku herî kêm kesek jê hatiye cîhanê. Dayik, deyk, dayk, da, dadê, mak, mare, marî. Forma bêjeya "dê", forma tewandina bêjeya "da"yê ye.

Dêbav: 1. Dê û bavê kesekî/ê. 2. Dê û bav bi hev ra. Ebeweyn, dê û bav. Bêjeya "dêbav"ê, ji bêjeyên "dê" û "bav"ê çêbûye.

Dêbavtî: Mîna dêbavan tevgerîn. Bi awayê dêbavan. Bêjeya "dêbavtî"yê, ji bêjeya "dêbav"ê û ji xurdepaşa şêwetî û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dêl / dêhl / Dihl: 1. Ẅeywanên wekî kûç, kuçik, se / seg, tajî, gur, rûvî û hwd.an yên mê yên ku xwedî cewr û kudik in. Bêjeya "dêl / dêhl"ê forma "dê"yê ya ji bo ẅeywanan e; hew ji bo wan tê bikaranîn. 2. Ev bêje carna jî ji bo ẅeqaretkirina li jineka fê'lxirab tê şixulandin.

Toltajî / **tol**tehjî: Tajiya mê. Tajiya xwedî cewrik an jî cewrik anîne cîhanê. Bêjeya "Toltajî"yê, xuya dibiye ku ji bêjeya "dêltajî"yê veguheriye. Bêjeya "toltajîyê, ji bêjeya "tol"ê (ji "dêl"ê) û ji bêjeya "tajî / tehjî"yê çêbûye.

Dêlegur / Dêlegurg / Dêhlegur / Dêhlegurg / Dihlegur / Dihlegurg: Gura / gurga mê. Gura mê a ku xwedî cewrik in an jî cewrik anîne cîhanê. Bêjeya "dêlegur"ê ji bêjeya "dêl / dêhl / dihl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "gur / gurg" çêbûye.

Dêlegurî: Tevgerîna mîna dêleguran. Bi awayê dêleguran. Bi dêleguran va têkildar. Bêjeya "dêlegurî" ji bêjeya "dêlegur" û ji qertafa nîsbet û pêmayînê "-î"yê hatiye çêkirin.

Dêlemar: Ẅeywanekî ku dêla / boçika wî dişibihe maran û bi erdê ve dixujike û dihere. Marîjok. Bnr.: Daykemar, dêmar. Bêjeya "dêlemar"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "mar" çêbûye.

Dêlerûvî / Dêlerovî: Rûviyê mê. Rûviyê mê yê ku xwedî cewrik in an jî cewrik anîne cîhanê. Bêjeya "dêlerûvî"yê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "rûvî" çêbûye.

Dêlik: Ẅeywanên wekî kûçikan yên mê. Bêjeya "dêlik"ê, ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẅezkirinê "-ik"ê hatiye çêkirin.

Dêliktî: Tewgerîna wekî dêlikan. Bêjeya "dêliktî"yê, ji bêjeya "dêlik"ê û ji xurdepaşa şêwetî û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dêmar: Marîjokeke zer û mezin. Bnr.: Daykemar, dêlemar. Bêjeya "dêmar"ê, ji bêjeya "dê"yê (ji "da"yê) û ji bêjeya "mar"ê hatiye çêkirin.

Dêmarî: Jina ku li dû mirina diya zaroyan, bi bavê wan re dizewice. Ne diya bîyolojîk. Ji aliyê zaroyan ve, bi nav kirina vê jina ku kete dewsa diya wan. Kesa jina bavê kesekî / kesekê; lê ne diya wî / wê. Jinbav. Bnr.: Damarî, zirdê. 1. Bêjeya "dêmarî"yê ji bêjeya "dê" û ji paşgîra "-marî"yê hatiye çêkirin. Bêjeya "marî"yê jî tê wateya dê; lêbelê bêjeya "marî"yê di Kurmancî da zêdetir di wateya diyên ẅeywanan da tê bikaranîn. Îcar di Kirdî da bêjeya "mare"yê rasterast di wateya "dê" da jî tê bikaranîn. 2. Jina ku bi "dêmar"ê dimî-

ne, dişibihe wê ẖeywanê. Di vê wateyê de bêjeya "dêmarî"yê ji bêjeya "dêmar"ê û ji xurdepaşa nîsbetê "-î"yê tê çêkirin.

Dêşîr: Jina ku zarokekê/a jineka di, bi şîrê xwe dimêjîne yan jî mijandiye. Jina ku zaroyên jineka di, xwedî dike an jî xwedî kiriye. Bnr.: Deyşîr, daşîr, dayîkşîr, dayen, dayîn. Bêjeya "dêşîr"ê ji bêjeya "dê"yê û ji bêjeya "şîr" hatiye çêkirin.

Dêtî: Dê bûn. Zaro anîna cîhanê, lê nihêrîn, mezinkirin. Mîna diyan tevgerîn û li zaroyan nihêrîn. Bêjeya "dêtî"yê ji bêjeya "dê"yê û ji xurdepaşa şêwetî û awatiyê "-tî"yê hatiye çêkirin.

Dêxwaz: Zaroyê/a ku her dem diya xwe dixwaze. Bêjeya "dêxwaz"ê ji bêjeya "dê"yê û ji lêkera "xwaz"ê (ji "xwestin"ê) hatiye çêkirin; tîpa "s"eyê veguheriye tîpa "z"eyê.

Dêyik / deyîk / deyk: Jina ku herî kêm zarokekî/a wê heye. Ev hersê form jî heman wateyê didin; ji bo vê yekê hemû li ser wateya "dêyîk"ê hatin şîrovekirin. Bêjeya "dêyîk"ê, ji bêjeya "dê"yê ku tewandina bêjeya "da"yê ye, û ji tîpa "y"eya ku ketiye navbera dengdêrên "ê" û "î"yê, û ji xurdepaşa îzafeyê "-î"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẖezkirinê "-k"ê hatiye çêkirin.

Deyşîr: Jina ku zaroyê/a jineka di, bi şîrê xwe dimêjîne yan jî mijandiye. Jina ku zaroyên jineka di, xwedî dike an jî xwedî kiriye. Bnr.: Dêşîr, daşîr, dayîkşîr, dayen, dayîn. Bêjeya "deyşîr"ê ji bêjeya "dey"ê û ji bêjeya "şîr" hatiye çêkirin.

Diya dayê: Diya dayika mirovan. Dapîr. Wek dixuye, ev terkîbek e. Ji bêjeyên terkîbê bêjeya "diya"yê ji bêjeya "di"yê ku tewandina bêjeya "da"yê ye û ji tîpa "y"eya ku ketiye navbera dengdêrên "i" û "a"yê, û ji veqetandeka mêtiyê "-a"yê çêbûye. Bêjeya "dayê" jî, ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin. Dengdara "y"eyê ketiye navbera dengdêrên "a" û "ê"yê.

Diya dê: Diya dayika mirovan Dapîr. Wek dixuye, ev terkîbek e. Terkib, ji bêjeya "diya"yê û ji bêjeya "dê"yê hatiye çêkirin. Wekî ku tê zanîn, bêjeya "dê"yê formeke tewandina bêjeya "da"yê ye.

Diya mêşan: Mêşhingiva ku hêkan dike. Keybanûya mêşhingivan. Mêşedoz. Wek dixuye, ev terkîbek e. Terkîb, ji bêjeya "diya"yê û ji bêjeya "mêşan", çêbûye, bêjeya "mêşan" jî ji bêjeya "mêş"ê û ji qertafa piraniyê "-an"ê hatiye çêkirin.

Dol: Navê goştpareyê di malzaroka dê da ye. Her çi qas tam ne zelal be jî, hebûna bigumaniya têkildariya vê bêjeyê, bi bêjeya "da"ya me re, balkêş e. Lewra "mê"yên ku dol digirin, ji xamiyê derdikevin, dibin "dê" (ji bo mirovan), an jî "dêl" (ji bo ẖeywanan). Bêjeya "dol"ê bi serê xwe ye; bi gumaneke mezin ji Kurdî derbasî Tirkî bûye.

Xweda / Xwedê: Yê ku bi xwe dimîne, hew dişibihe xwe. Bêjeya "Xweda", ji bêjeya "xwe"yê û ji xurdepaşa wekîtî û têkildariyê "-da"yê hatiye çêkirin. Forma xurdepaşa "-dê"yê, tewandina xurdepaşa "da"yê ye. Em li vir nikanin vê xurdepaşê wekî lêkera "dayîn"ê binirxînin; lewra tê zanîn ku li gor salixandina Qasidê Wî û Peyama / Qurana Wî "Ew nehatiye zayîn û Wî nezaye!" *Bnr.: Sûreya Îxlasê, ayeta 3.* (Têkiliya vî navî, bi "da"ya ku em li ser sekinîne re tune ye; lêbelê ji bo çewt şibihandin û ẍeletfehmî çênebin û rastiya bêjenasiya vê bêjeyê were fêrbûn, me ew jî hinekî şîrove kir.)

Yadê: Ev bêjeya "yadê" hew li derdora Mêrdînê tê bikaranîn. Di wateya dê de ye. Bêjeya "yadê" ji bêjeya xîtabet û bangkirinê "Ya" û ji bêjeya "dê"yê hatiye çêkirin. Di heman wateyê de bnr.: "Dayê". Forma bêjeya "dê"yê, formeka tewandina bêjeya "da"yê ye.

Zirdê: Jina ku li dû mirin an jî berdana diya zaroyan, bi bavê wan re dizewice. Li gor zaro, paye û binavkirina vê jinê. Jinbav, dêmarî. Li ser etîmolojiya vê bêjeyê du texmîn hene: 1. Di ferhengan da wateya bêjeya "zir"ê, "sexte, teqlîd û hwd." tê nîşandayîn. Li gor vê wateyê, mehneya "zirdê"yê, diya teqlîd, ya sexte ye. 2. Bêjeya "zir"ê, formeka bêjeya "zîr"ê ye ku ew jî tê wateya aliyê "jêr". Li gor vê wateyê, mehneya "zirdê"yê, diya li asta jêr, li asta nizm e. 3. Di zaravê Kirdî de bêjeya "zerî / zere", di zimanê Awestayê de "zirid/zered", di Farisiya kevn de bêjeya "dird", di Partî de bêjeya "zird", di Belûcî de "zirde", tên wateya "dil". (Mîna ku tê zanîn di Kurmancî, Soranî û Hewremanî de li dewsa vê bêjeyê, raste rast bêjeya "dil" tê bikaranîn). Gelo guman heye ku bêjeya me ya

"zirdê"yê -di me'na pir hezkiriyê de- were wateya "dayîka ji dil"? Bêjeya "zirdê"yê ji bêjeya "zir" û ji bêjeya "dê"ê çêbûye.

DI KIRDÎ DA PEYAM û FORMÊN BÊJEYA "*DA*"YÊ

Bêjeya "da"yê di vê dîyalektê de jî bi çend forman tê bikaranîn. Formên serekê yên vê bêjeyê "da", "dad", "dê" û "do" nin. Ev formana carna bi serên xwe nin, carna jî di nav bêjeyan da cî digrin. Bêjeyên bi mijara vekolîna me ra têkildar in, bi qasî ku me tespît kirin ev in:

Da: 1. Navê diya mirovan e. Jina ku zaro anîne dinyayê. Jina ku herî kêm, zaroyekî wê heye. Dê, dayik. Bêje, bi vî ẖalî ve, di forma xwe ya ne tewandî de ye. Ev form, eslê bêjeya "dê"ya tewandî ye. 2. Dema borî ya lêkera "dayîş"ê ye.

Dad: Ev bêje formeke bêjeya "da"yê ye. Di wateya "da"yê de ye. Forma wê ya bangkirinê "dadê!" ye.

Dadî: Ev bêje bi serê xwe tê wateya "dê / dayîk"ê. Heke ev form, ji forma "dadîyî"yê veguherîbe, pirjimara bêjeya "dad"ê ye. Dayikan, dêyan. Na heke, bêjeya "dadî"yê, di eslê xwe de wisa be, wê çaxê rasterast tê wateya "da"yê. Ev forma di nav gel de gelek caran bi forma "dadê", di wateya "dayê" da jî tê bikaranîn.

Dadî babî: Dê û bav. Dad û bav, da û bab, dayik û bav, mezinên kesekî.

Dakil: Diya ku mîna kilan xweşik e. Diya çav bi kil. Diya ku çavên wê hatine kil kirin. Bi piranî di forma "dakilê!" de tê bikaranîn. Bêjeya "dakil"ê, ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "kil"ê hatiye çêkirin. Forma mêtiya vê bêjeyê "dakile" û "dakili" ye.

Dakilê: Bangkirina dê a bi ẖez, wekî "diya mina çav bi kil!". Diya mîna çav reş. Bnr.: Dayê, dayîkê. Bêjeya "dakilê", ji bêjeya "dakil"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin,

Damarî: Ne diya bîyolojîk, ne diya rast. Li gor zaroyan jina bavê wan lê ne diya wan. Dêmarî, zirdê, jinbav. Bnr.: Damêrrî, domarî. Bêjeya "damarî"yê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "marî"yê hatiye çêkirin. Bêjeya "marî"yê jî tê wateya dê; him di zaravê Kurmancî da him jî di yê Kirdî da bêjeya "marî"yê zêdetir ji bo diya balindeyan / ferîdeyan tê bikaranîn.

Damêrrî: Ne diya bîyolojîk, ne diya rast. Li gor zaroyan jina bavê wan lê ne diya wan. Damarî, dêmarî, zirdê, jinbav. Bnr.: Damarî, domarî. Bêjeya "damêrrî"yê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "mêrrî"yê hatiye çêkirin. Bêjeya "mêrrî"yê (ji "marî"yê) jî tê wateya dê; him di yê Kurmancî da him jî di zaravê Kirdî da bêjeya "mêrrî"yê zêdetir ji bo diya perîdeyan tê bikaranîn.

Dapîr: 1. Diya dê. 2. Hevşîreya ku zaroyên jinan tînin cîhanê, ebe. 3. Jina pîr, pîrik. Bêjeya "dapîr"ê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "pîr"ê hatiye çêkirin. Forma mêtiyê nîşan dide "dapîre" û "dapîri" ye.

Dapîrek: Yew dapîr. (di Kurmancî de "yek dapîr"). Yek pir, jineka pîr. Bêjeya "dapîrek"ê ji bêjeya "dapîr"ê û ji qertafa yekîtiyê, yekbûnê "-ek"ê (ji "yek"ê) hatiye çêkirin. Forma mêtiyê nîşan dide "dapîreke" û "dapîreki" ye.

Day: Dayê. Ev bêje, formeke, dema ku gazî dê dibe, tê bikaranîn. Bi gumaneke mezin eslê bêjeyê "dayê" ye lê, tîpa "e"yê ji bêjeyê ketiye. Bnr.: Dayê. Forma mêtiyê nîşan dide "daye" û "dayi" ye.

Daya: Ev bêje mîna parçeyekî terkîbekê dixuye. Wekî "daya ma / mi." Bêjeya "daya"yê ji bêjeya "da"yê û ji veqetandeka mêtiyê "-a"yê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "a"yê.

Dayê: Ev formeka "da"yê ye. Ev forma, di dema bangkirina li dê dibe de tê bikaranîn. Bangkirina zaroyan ya diya wan. Bnr.: Day. Bêjeya "dayê" ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-ê"yê hatiye çêkirin. tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "ê"yê.

Dayene / dayeni: Dan, dayîn. 1. Dîyarî kirin, araste kirin, raber kirin, pêşkêş kirin, bexşandin. 2. Zabûn, anîn dinyayê, riẖ dayîn. 3. Jê çêbûn, jê peyda bûn. Bêjeya "dayene"yê ji bêjeya "da"yê û ji dawîneya radera Kirdî "-(y)ene"yê hatiye çêki-

rin.

Dayîş: Ev bêje forma rader, ya lêkera "dan / dayîn"ê ye. 1. Dîyarî kirin, araste kirin, raber kirin, pêşkêş kirin. 2. Zabûn, anîn dinyayê, riḧ dayîn. 3. Jê çêbûn, lê peyda bûn. Bêjeya "dayîş"ê ji lêkera "da"yê û ji dawîneya radera Kirdî "-(y)îş"ê hatiye çêkirin.

Dayk / dayik: Jina ku mirov jê çêbûye. Wateya vê bêjeyê "dayîke tenê, yeke bê mînak" e. Forma "dayk"ê, ya ne tewandî ye. Bêjeya "dayk"ê û ya "dayik"ê yek in û formên bêjeya "dayîk"ê ne. Bêjeya "dayk"ê, ji bêjeya "dayîk"ê veguheriye û "dayîk" jî ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ḧezkirinê "-îk"ê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "î"yê. Tîpa "î"yê di "dayk"ê de ji bêjeyê ketiye, di "dayik"ê de veguheriye tîpa "i"yê. Forma mêtiyê nîşan dide "dayke / dayike" û "dayki /dayiki" ye.

Daykê / dayikê: 1. Gotineke şaşbûn, sitemkirin an jî berketinê ye. Di wateya "wey dayîka / diya min!" û "wel wel!"ê de tê bikaranîn. 2. Bangkirina dê (wekî "*ey dayika min a biçûk! (*an jî *"... bi tenê!"*"). Bi awayekî ḧezkirî gotina navê dayê. Bangkirina diyeke bi tenê, yeke bê menend. 3. Dayîktî. Rewşa dêbûnê. Bêjeya "daykê / dayikê" ji bêjeya "dayk/dayik"ê û ji xurdepaşa (di Kirdî de) wekîtî û mînaktiyê "-ê"yê hatiye çêkirin.

Daykê dayanê: Gotineke matmayîn û sitemkariyê ye. (Di Kurmancî de di wateya "err / erik" an jî "wey dayê"yê de di Turkî de di wateya "vay anasını" de ye.)

Daykî / dayikî: Jinên ku mirov jê çêbûne. Wateya vê bêjeyê "gelek diyên bi tenê, yên bê mînak" e. Forma "daykî"yê, forma pirjimara bêjeya "dayk"ê ye. Bêjeya "dayk"ê, formeke bêjeya "dayîk"ê ye û forma tewandî ye. Bêjeya "daykî"yê, ji bêjeya "dayk"ê û ji qertafa pirjimariyê (a Kirdî) "î"yê hatiye çêkirin.

Daykin baykin: Bi dê û bi bav. Bêjeyên "daykin" û baykin"ê bi hev re hatine gotin. Jiber ku "daykin hat şîrovekirin, li vir em dê bêjeya "baykin"ê şîrove bikin. Bêjeya "Baykin"ê ji bêjeya "bayk/bayik"ê û ji xurdepaşa (di Kirdî de) xwedîbûnê "-in"ê hatiye çêkirin.

Daykin: Bi dê. Xwedî dayîk. Bêjeya "daykin"ê ji bêjeya "dayk/dayik"ê û ji xurdepaşa (di Kirdî de) xwedîbûnê "-in"ê hatiye çêkirin.

Dêk: 1. Dêyek, diyek, dayîkek, yek dê. 2. Dapîr, pîrik. Bêjeya "dêk"ê, forma tewandina bêjeya "dak"ê ye. Bêjeya "dêk"ê, ji bêjeya "dê"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ḧezkirinê "-(y)îk"ê hatiye çêkirin; Tîpên "y" û "î"yê, ji bêjeyê ketine. Forma tewandî ya vê bêjeyê "dêke" û "dêki" ye. 3. Jina ku di zayînê de ji dê re rêberiyê û alîkariyê dike. Hevşîreya ku zaroyên jinan tînin cîhanê, ebe. Bêjeya "dêki"yê ji bêjeya "dêk"ê û ji qertafa "-i"yê hatiye çêkirin. Bi min ev bêje, wekî formeke tewandina bêjeya "dak"ê dixuye.

Dêmarrî: Jina ku li dû mirina diya zaroyan, bi bavê wan re dizewice. Diya ne bîyolojîk. Ji aliyê zaroyan ve, bi nav kirina vê jina ku ketiye dewsa diya wan. Kesa jina bavê kesekî / kesekê; lê ne diya wê / wî. Jinbav. Bnr.: Damarî, domarî, zirdê. 1. Bêjeya "dêmarrî"yê ji bêjeya "dê" û ji paşgîra "-marrî"yê hatiye çêkirin. Bêjeya "marrî"yê (ji "marî"yê) jî tê wateya diyên balindeyan.

Diyayiş: Hatin dayîn. Ji aliyê yekî / hinên din ve dayîn. Bêjeya "diyayiş"ê forma radera lêkera "diya"yê ye ku dawîneya raderê (bi Kirdî) "-ayiş"ê standiye.

Doman / Domen / Domon: Mirovê ku ji aliyê diyêkê ve hatiye cîhanê. Zaro, çêle, gede û geda, law û qîz, kur û keç.

Domaney: Di jiyana mirovan da heyama zarobûnê. Zarotî, zaroktî, zarokatî. Bnr.: Domonenî. Bêjeya "domaney"ê, ji bêjeya "domane"yê (forma tewandina bêjeya "doman"ê ye) û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-yî"yê hatiye çêkirin, tîpa "î"yê, ji bêjeyê ketiye.

Domarî / Domirî: Ne diya bîyolojîk, diya ne rast. Li gor zaroyan jina bavê wan lê diya wan. Damarî, dêmarî, zirdê, jinbav. Bnr.: Damêrrî, damarî.

Domirîyê: Ne diya bîyolojîk bûn, jina bavê lê ne diya zarokan bûn. Damarî bûn; damarîtî. Rewşa damarîbûnê. Bêjeya "domirîyê" ji bêjeya

"domirî"yê û ji xurdepaşa (di Kirdî de) wekîtî û mînaktiyê "-ê"yê hatiye çêkirin.

Domonenî / domonîni: Di jiyana mirovan da heyama zarobûnê. Zarotî, zaroktî, zarokatî. Bnr.: Domaney. Bêjeya "domonenî"yê, ji bêjeya "domone"yê (forma tewandina bêjeya "domon"ê ye) û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-nî"yê hatiye çêkirin.

Tût: Mirovê piçûk yê ku ji aliyê diya xwe ve hatiye cîhanê. Zaro, çêle, gede û geda, law û qîz, kur û keç.

Tûteyî: Di jiyana mirovan da heyama zarobûnê. Zarotî, zaroktî. Bêjeya "tûteyî"yê, ji bêjeya "tûte"yê (forma tewandina bêjeya "tût"ê ye) û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-(y)î"yê hatiye çêkirin.

Tûtî: Mirovên ku hîn di asta zaroktiyê de ne. Zaro, çêle, gede û geda, law û qîz, kur û keç. Bêjeya "tûtî"yê, ji bêjeya "tût"ê û ji xurdepaşa pirjmariyê (ya Kirdî) "-î"yê hatiye çêkirin.

Tûtînî: Di jiyana mirovan da heyama zarobûnê. Zarotî, zaroktî. Bêjeya "tûtînî"yê, ji bêjeya "tûtî"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û awatiyê "-nî"yê hatiye çêkirin.

DI SORANÎ DE PEYAM û FORMÊN "*DA*"YÊ

Di vê dîyalektê de jî bêjeya "da"yê, mîna dîyalektên din yên Kurdî bi çend forman tê bikaranîn. Formên "da"yê li vir carna bi serên xwe nin, carna jî di nav bêjeyên hevgirtî da nin:

Da / dak / dalk: Dapîr, diya bavê yekî an jî diya diya yekî.

Dade / dadê: Ev formeka "da / dad"ê ye. Ev forma, di dema bangkirina li dê an jî xwîşkê dibe de tê bikaranîn. Bangkirina zaroyan ya diya wan an jî xwîşka wan. 1. Dayê, 2. Xwişkê.

Daga: Dapîr, 1. Diya dê. 2. Diya bavê. Bêjeya "daga"yê, bi gumaneke mezin ji "dag"ê (ji "dak / dayik / dayîk"ê) û ji xurdepaşa bangkirinê "-a" (weî "-ê") hatiye çêkirin.

Dan / **da**yîn: Ev bêje lêker e. 1. Dîyarî kirin, araste kirin, bexşandin, raber kirin, pêşkêş kirin (*Bi deh dînaran dan.*). Bêjeya "dan"ê ji bêjeya "dayîn"ê veguhriye; ev lêker jî ji "da"yê û ji dawîneya raderê "-în"ê hatiye çêkirin; tîpa "î"yê ji raderê ketiye.

Dapîr: Diya bavê yekî/ê an jî diya diya yekî/ê. 1. Diya dê. 2. Diya bavê. 3. Jina pîr, pîrik. Bêjeya "dapîr"ê ji bêjeya "da"yê û ji bêjeya "pîr"ê hatiye çêkirin. Forma tewandî ya vê bêjeyê ku bi piranî di çîrokan da derbas dibe, "dapîre" ye.

Dapîre: Di çîrokên zaroyan da navê pîrejinan e. Pîrê. Bêjeya "dapîre"ê ji bêjeya "dapîr"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê hatiye çêkirin.

Daye / dayê: 1. Dê, dayik. 2. Dêtî, dayîktî. Forma "dayê" di dema bangkirina li dê dibe de, ji aliyê zaroyan ve tê bikaranîn. Bnr.: Day. Bêjeya "daye / dayê" ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa bangkirinê ya mêyînê "-e / -ê"yê hatiye çêkirin. tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "e/ê"yê.

Dayecan: Diya wekî canan. Diya pir ẖezkirî. Bêjeya "dayecan"ê ji bêjeya "da"yê, ji tîpa "y"eya ku ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "e"yan û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "can"ê hatiye çêkirin.

Dayegewre: Ev bêje, ji du bêjeyan pêkhatiye. Diya mezin. Dapîr, pîr / pîrik. Diya bavê yekî yan jî daya diya yekî; pîra / pîrika yekî. Bêjeya "dayegewre"yê, ji bêjeya "daye"yê û ji bêjeya "gewre"yê çêbûye.

Dayelê: (Ev form di Hewremanî de tê bikaranîn). Ev bêje, ji du bêjeyan pêkhatiye. Bangkirina dayê. Banga li dayikan. Dayê! Dayikê! Bêjeya "dayelê"yê ji bêjeya "daye"yê û ji bêjeya "lê"yê (ji li wê"yê), hatiye çêkirin.

Dayen: Kesa ku zarokên kesek din wekî zarokên xwe xwedî dike an jî xwedî kiriye. Jina ku zaroyên jineka di, bi şîrê xwe dimijîne yan jî mijandiye. Bnr.: Dêşîr, deyşîr, dayîkşîr, dayîn. Bêjeya "dayen"ê ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa pêmayîn û şibihandinê "-en"ê (ji "–in"ê) hatiye çêkirin.

Dayenge: Dayengeh, dayêgeh, mala zarokan, cihê zarok lê tên xwedîkirin (bi roj dema dê û

bavên wan li kar in). Bêjeya "dayenge"yê ji bêjeya "dayen" û ji xurdepaşa zemîniyê "-ge"yê (ji "-geh"ê) hatiye çêkirin.

Dayk: Dê, dayik, da, mader. Jina ku zaro jê çêbûye. Bêjeya "dayk"ê, bi gumaneke mezin ji bêjeya "dayîk"ê veguheriye û bûye formeka wê. Bêjeya "dayk"ê, ji bêjeya "dayîk"ê veguheriye û ji bêjeya "da"yê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẖezkirinê "-îk"ê hatiye çêkirin; tîpa "y"eyê jî ketiye navbera herdu tîpên dengdêr "a" û "î"yê. Tîpa "î"yê ji bêjeyê ketiye.

Daykane: Dayikane, bi awayê dayikan. Mîna dayîkan. Bêjeya "daykane"yê, ji bêjeya "dayk"ê û ji xurdepaşa wekayî û şibihandinê "-ane"yê hatiye çêkirin.

Dayke: Bangkirina dê (wekî "*ey dayika min a bi tenê!*"). Dayê!. Bi awayekî ẖezkirî gotina navê dayê. Bangkirina diyeke bi tenê, yeke bê menend. Bêjeya "dayke"yê ji bêjeya "dayk"ê û ji qertafa "-e"yê hatiye çêkirin.

Daykûbawk: Dêbav, dêûbav, dê û bav, da û bab, dayik û bav, mezinên kesekî. Bêjeya "daykûbawk"ê, ji bêjeya "dayk"ê û ji gîhaneka "û"yê û ji bêjeya "bawk"ê hatiye çêkirin. Bêjeya "bawk"ê jî ji bêjeya "baw"ê û ji xurdepaşa biçûkkirin û ẖezkirinê "-k"ê çêbûye.

Del: Hin ẖeywanên mê. Dêl, dêhl. 1. ẖeywanên wekî se, gur, beraz, şêr, hirç, meymûn û hwd.an yên mê yên ku xwedî çêlik in. Bêjeya "del / dêl / dêhl"ê, forma "dê"yê ya ji bo ẖeywanan e û hew ji bo wan tê bikaranîn. 2. Ev bêje carna jî ji bo jinên fê'lxirab bi armanca ẖeqaretkirinê tê şixulandin.

Dêleberaz / **dê**leberaz: Beraza mê. Beraza ku xwedî kudik in an jî kudik anîne cîhanê. Bêjeya "dêleberaz"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "beraz" çêbûye.

Dêlegurg / **dê**legur(g): Gura / gurga mê. Gura ku xwedî cewrik in an jî cewrik anîne cîhanê. Bêjeya "dêlegur"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "gur / gurg" çêbûye.

Dêlemeymûn: Meymûna mê. Meymûna mê a ku xwedî qirdik in an jî qirdik anîne cîhanê. Bêjeya "dêlemeymûn"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "meymûn"ê çêbûye.

Dêleseg / **dê**lese; Sega / seya mê. Seya mê a ku xwedî cewrik in an jî cewrik anîne cîhanê. Bêjeya "dêleseg"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "seg / se"yê çêbûye.

Dêleşêr: Şêra mê. Şêra mê. Şêra mê a ku xwedî kudik in an jî kudik anîne cîhanê. Bêjeya "dêleşêr"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "şêr" çêbûye.

Dêlewurç / dêlehirç: Hirça mê. Hirça mê. Hirça mê a ku xwedî kudik in an jî kudik anîne cîhanê. Bêjeya "dêlewurç / dêlehirç"ê ji bêjeya "dêl"ê û ji xurdepaşa mêtiyê "-e"yê û ji bêjeya "wurç / hirç"ê çêbûye.

Zirdayîk: Jina ku li dû mirin an jî berdana diya zaroyan, bi bavê wan re dizewice. Li gor zaro, paye û binavkirina vê jinê. Jinbav, dêmarî. Li ser etîmolojiya vê bêjeyê du texmîn hene: 1. Di ferhengan da wateya bêjeya "zir"ê, "sexte, teqlîd û hwd." tê nîşandayîn. Li gor vê wateyê, mehneya "zirdayîk"ê, diya teqlîd, ya sexte ye. 2. Bêjeya "zir"ê, formeka bêjeya "zîr"ê ye ku ew jî tê wateya aliyê "jêr". Li gor vê wateyê, mehneya "zirdayîk"ê, diya li asta jêr, li asta nizm e. 3. Di zaravê Kirdî de bêjeya "zerî / zere", di zimanê Awestayê de "zered / zirid", di Farisiya kevn de bêjeya "dird", di Partî de bêjeya "zird", di Belûcî de "zirde", tên wateya "dil". (Mîna ku tê zanîn di Kurmancî, Soranî û Hewremanî de li dewsa vê bêjeyê, raste rast bêjeya "dil" tê bikaranîn). Gelo guman heye ku bêjeya me ya "zirdayik"ê -di me'na pir hezkiriyê dewere wateya "dayîka ji dil"? Bêjeya "zirdayîk"ê ji bêjeya "zir" û ji bêjeya "dayîk"ê çêbûye.

Encam:

Mîna ku tê dîtin, bêjeya "da"yê gelek bi bereket û di nav Kurdî de gelek belavbûyî ye.

ẖeya ku ji destê me hat, me li hemû qadên Kurdî nihêrîn. Me zaravên Kurdî giş di ber çavan re derbas kir, me dît ku bêjeya "da"yê, çi di Kurmancî de û çi di Kirdî / Kirmancî / Dimilî / Zazakî de û çi di Soranî / Babanî û Hewremanî / Goranî de, ya bi hewform ya jî nêzforman ve di heman wateyê de cî girtiye.

Bêjeya "da"yê ji bo ku alî zimanẖezan bike, bi şefqateke bê mînak û bi dayîneke bê dawî destên xwe dirêjî wan dike.

Rîsaleya Remezanê

BEDÎUZZEMAN SEÎD NÛRSÎ
Wergêr: Ayhan MERETOWAR

Ji ber ku di dawiya qismê pêşî de hindikek behsa şeairê Îslamê hat kirin, di vî qismê duduyan de ku li ser Remezana Şerîf e û ku di nav şeairan de, yê herî ronak e û herî muhteşem e, em dê behsa hin hîkmetên wê bikin.

Ev qismê duduyan, "Neh Nukte" ne ku ji gelek hîkmetên Remezana Şerîf, neh hîkmetan beyan dikin.

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ [1]

شَهْرُ رَمَضَانَ الَّذِي أُنْزِلَ فِيهِ الْقُرْآنُ هُدًى لِلنَّاسِ وَبَيِّنَاتٍ مِنَ الْهُدَىٰ وَالْفُرْقَانِ [2]

NUKTEYA YEKÊ: Sewma di Remezana Şerîf de, riknekî pêşî yê ji her pênc riknên Îslamê ye. Hem ji wan şeairên herî mezin ên Îslamê ye.

Ha, gelek hîkmetên rojiya di Remezana Şerîf de hene ku hem li Rubûbiyeta Cenabê Heq hem li jiyana civakî ya mirovan, hem li heyata şexsî ya mirovan hem li terbiyeya nefsê hem li şukura nîmetên Îlahî dinihêrin.

Di hêla ku li Rubûbiyeta Cenabê Heq dinihêre de ji gelek hîkmetên rojiyê, hîkmetek ev e ku:

Cenabê Heq, rûyê zemînê di sûretê sofreyeke nîmetan de xuluqandiye û hemû çeşîdên nîmetan bi awayê مِنْ حَيْثُ لَا يَحْتَسِبُ [3] di wê sofreyê de rêz kirine. Bi vî awayî, kemala Rubûbiyeta xwe û Rehmaniyet û

Rehîmiyeta xwe, bi wê weziyetê îfade dike. Mirov, di bin perdeya xefletê de û di nav daîreya sebeban de, heqîqeta ku wê weziyetê îfade dike, nikarin baş bibînin, carcaran jibîran dikin. Îca di Remezana Şerîf de, ehlê îmanê, bi yek carekê, dikeve hukmê artêşeke muntezem. Nêzî êvarê, mîna ku ji bo ziyafeta Sultanê ezelî hatibin vexwendin, bi awayekî ubûdiyetkarî nîşan didin ku li hêviya emr û fermanê wî sekinîne ku ew bibêje: "Kerem bikin", li ber wê rehmaniyeta şefqetawer, heşmetawer û kulliyetawer, bi ubûdiyeteke biwus'at, biezemet û biîntîzam muqebele dikin. Îca mirovên ku beşdarî ubûdiyeteke wiha 'ulwî û şerefa kerametê nebin, ka layiqî navê însan in gelo?

NUKTEYA DUDUYAN: Sewma Remezana mubarek, bi aliyê xwe yê ku ji gelek hîkmetên ku li şukra nîmetên Cenabê Heq dinihêre ve hîkmetek jê ev e:

Çawan ku di Kelîmeya Yekê de hatiye gotin, teamên ku tablevanek, gava ji mitbexa padîşahekî tîne, bihayekî dixwaze. Digel ku bexşîş û şabaş ji tablevan re tê dayin, heke mirov, zenn bike ku ew nîmetên zaf hêja, bê

1 Meha Remezanê, ew meh e ku ew Qurana ku ji bo mirovan, wê rêya rast ku hîdayet e nîşan dide û wan delîlên beyyîne ku heq û batil, ji hev û dî diqetîne, di xwe de dihewîne, hatiye nazilkirin.

2 Meha Remezanê, ew meh e ku ew Qurana ku ji bo mirovan, wê rêya rast ku hîdayet e nîşan dide û wan delîlên beyyîne ku heq û batil, ji hev û dî diqetîne, di xwe de dihewîne, hatiye nazilkirin.

3 Bi awayekî ku qet hêvî nedihat kirin

qîmet in û mirov, ê ku wan nîmetan dide, nas neke, çiqas ehmeqiyeke pir mezin e. Cenabê Heq, nîmetên xwe yên bêhed, ji bo new'ê beşer, li ser rûyê erdê neşir kiriye. Di bergîdana wê de, weke bihayê wan nîmetan jî, şukur dixwaze. Sebeb û sahibên zahirî yên wan nîmetan, di hukmê tablevanan de ne. Em bihayekî didin wan tablevanan; em ji wan re minnetdar dibin. Hetta em teşekkur û hurmeteke zaf zêde ku ew ne musteheq in, ji wan re dikin. Hal ku hal e, Mun'îmê Heqîqî, ji wan sebeban, bi awayekî bêhed û hesab, ji ber sedemê wan nîmetan, layiqî şukrê ye. Eve ji wî re teşekkurkirin, bi vî awayî ye ku mirov li xwe dêne ku ev nîmet, rasterast ji Wî ne û mirov bi qîmeta wan nîmetan baş bizanibe û mirov, wan nîmetan teqdîr bike û baş bizanibe ku ihtiyacên mirovan, bi wan nîmetan zaf heye.

Ha rojiya Remezana Şerîf, mifteha şukreke heqîqî, xalis, biezemet û umûmî ye. Lewre pirê mirovan, gava di wextên din de, ku ji mecbûrî ve, bi awayekî heqîqî bi birçîtiyê nehesin, nikarin bi qîmeta gelek nîmetan bizanibin. Mirovê têr, bi dereceya nîmetî ya parçeyekî nanê hişk, nizane. Nemaze gava ew mirovê têr, zengîn be, jixwe qet pê nizane. Hal ku hal e, wextê fitarê, ew nanê hişk, li ber çavê mêrikê/a mumîn, quweya zaîqe ya mirov şahidî dike ku çi qas nîmetekî biqîmet ê Îlahî ye. Ji padîşahan heta xizanê herî xizan, her kes, di Remezana Şerîf de, gava ku ji qîmetên wan nîmetan fam dike, mezherî şukreke me'newî dibe. Hem ji aliyê ku ji xwarina bi rojê hatiye meni'ikirin ve, difikire ku "Ew nîmet, milkê min nîn e. Ez di tenawul, xwarin û vexwarina van de hurr nînim, nexwe ew nîmet ku hene, mal û înama yekî din in. Ez li benda fermana wî me." Bi vî awayî nîmetê nîmet dizane; şukreke me'newî dike. Eve bi vî awayî rojî, ji gelek aliyan ve, dikeve hukmê mifteha wê şukra ku wezîfeya heqîqî ya mirovan e.

NUKTEYA SISIYAN: *Ji aliyê ku rojî, li heyata civakî ya mirovahiyê dinihêre ve gelek hîkmetên wê hene. Ji van hîkmetan yek jê ev e ku:*

Mirov, ji aliyê meîşetê ve, bi awayên muxtelîf û cihêrengî hatine xuluqandin. Cenabê Heq, li ser wê îxtîlaf û cihêrengiyê, zengînan vedîxwîne alîkariya feqîran. Hal ku hal e zengîn, ancax bi bîrçîtiya rojiyê dikarin bi awayekî baş bi halê nebaş ê feqîran û bi birçîtiya wan bihesin. Heke ne ji rojiyê be, dibe ku gelek zengînên nefisperest hebin ku nikaribin îdrak bikin ka bibê birçîtî û feqîrî çiqas elîm e û ew, çendîn muhtacî şefqetê ne. Ji vî aliyî ve, îca şefqeta li hemcînsan, asasekî şukra heqîqî ye. Kîjan ferd be bila bibe, dikare bi awayekî ji awayan, feqîrekî ji xwe feqîrtir bibîne. Li hember wî, bi şefqetê mukellef e. Heke ne ji mecbûriyeta ku divê bi nefsa xwe birçîtiyê bide kişandinê be, bi wesîteya şefqetê, nikare wê muawenet û îhsan û alîkariya ku pê mukellef e, bike; heke bike jî, nikare baş bike. Çimkî bi awayekî heqîqî, wê rewşê, di nefsa xwe de hîss nake.

NUKTEYA ÇARAN: *Hîkmetek ji gelek hîkmetên ku Rojiya di Remezana Şerîf de, li terbiyeya nefsê dinihêre ev e ku:*

Nefs, dixwaze ku xwe hur û azad bibîne û wisa telaqqî dike. Hetta rubûbiyeteke mewhûm û hereketa keyfemayeşa, bi awayekî fitrî daxwaz dike. Naxwaze bifikire ku bi nîmetên bêhed tê terbiyekirin. Nemaze gava ku li dunyayê serwet û îqtîdara wê jî hebe û xefletê jî pê re alîkarî kiribe, êdî bi carekê, bi awayekî xesbî, mîna dizekan, nîmetên Îlahî, mîna heywanan dadiqurtîne. Ha, di Remezana Şerîf de, ji wanên herî zengîn heta yên herî feqîr, nefsa her kesî tê digihîje ku: "Ew bi xwe malik nîne; mexlûq e, hurr nîne; ebd e. Heta ku neyê emirkirin, nikare tiştê herî adî û tiştê herî hêsa jî bike, nikare destê xwe dirêjî avê jî bike. Bi vî awayî rubûbiyeta wê ya mewhûm tê şikandin, xwe li ebdîtiyê datîne; dikeve wezîfeya xwe ya eslî û heqîqî ku şukr e.

NUKTEYA PÊNCAN: *Hîkmetek ji gelek hîkmetên ku rojiya Remezana Şerîf, li xweşkirina exlaq nefsê dinhêre û li wî aliyê dinihêre ku dixwaze destê nefsê, ji wan muameleyên serkêşî bikşîne ev e:*

Nefsa însanî, bi xefletê xwe jibîran dike. Ecza xwe ya bêhed, feqra xwe ya bênihayet û wê qusûra xwe ya pir zêde ya di mahiyeta xwe

de, nikare bibîne û naxwaze bibîne. Hem nafikire ku çi qas zeîf e û marûzî zewalê ye û ji musîbetan re hedef e û ji wî goşt û hestiyî ye ku zû ji hev belav dibe û xera dibe. Eynî mîna ku, wicûdeke wê ya ji polayê hebe û xwe, mîna ku layemûtî be texeyyul dike û wisan bi ser dunyayê ve bazdide. Bi hirs û temaeke şedîd, bi eleqe û muhebbeteke tund hişk, xwe davêje [ser] dunyayê. Bi her tiştê lezîz û menfîetî ve tê girêdan. Hem Xaliqê xwe yê ku wê, bi kemala şefqetê terbiye dike, jibîran dike. Hem li encama heyata xwe û li heyata xwe ya axretî nafikire; di nav exlaqê nebaş de digindire.

Ha, rojiya di Remezana Şerîf de, bi kesên herî xafil û bi yên ku herî zêde mutemerrîd in, zeîfî, eczî û feqîriya wan, bi wan dide hesandin. Bi wesîteya birçîtiyê, li mehdeyê xwe difikire. Êdî ji îhtiyacê mîdeyê xwe fam dike. Tê bîra wê/wî [mirovî/ê] ku wicûda wê ya qels, çi qas petiyaye -petotî- ye. Derk û fam dike ku çi qas muhtacî merhemet û şefqetê ye. Dest ji fîrewuniya nefsê berdide û bi xwe dihese û daxwaz dike ku bi kemala ecz û feqrê, xwe bipenêhe dergahê Îlahî û xwe amade dike ku bi destê şukreke me'enewî, li deriyê rehmetê bide. Heke ku xefletê dil lê xera nekiribe...

NUKTEYA ŞEŞAN: *Siyama Remezana Şerîf, ji aliyê ku li nuzûla Qur-ana Hekîm dinihêre ve Remezana Şerîf, zemanê herî muhîm ê nuzûliya Qur-ana Hekîm e. Ji gelek hîkmetên wê yên vê hêlê, hîkmetek ev e ku:*

Qur-ana Hekîm, madem di şehra/heyva Remezanê de nuzûl bûye, tevî ku zemanê nuzûla wê Qur-anê tîne ber çavan, ji bo ku mirov, wê xîtaba semawî, bi xweşî pêşwazî bike, di Remezana Şerîf de, ew e ku mirov, ji îhtiyacên suflî yên nefsê û ji halên malayanî û beredayî, xwe tecerrud bike û bi terka ekil û şurbê, dirûvê xwe bide weziyeta melekiyetê û bi awayekî ji awayan, mîna ku ew Qur-an, nû nazil dibe, wê bixwîne û lê guhdarî bike û mirov li wan xîtabên Îlahî ku tê de hene, mîna ku di wextê nuzûla wê de be, guhdarî bike û li wê xîtabê, mîna ku ji Resûlê Ekrem (e.s.m.) bibihîse guhdarî bike, hetta belkî mîna ku ji Hezretî Cebraîl, belkî mîna ku ji Mutekellimê ezelî guhdarî bike, dibe mezherî haletekî qudsî û mirov bi xwe tercumanî bike û li yên din bide guhdarîkirin û dereceyekê jî, hîkmetê nuzûla Qur-anê, nîşan bide.

Belê, di Remezana Şerîf de, mîna ku alema Îslamê dikeve hukmê mizgeftekê; mizgefteke wisan ku bi milyonan hafiz, li quncikên wê mizgefta ekber, wê Qur-anê, wê xîtaba semawî, bi ehlê erdê didin guhdarîkirin û bihîstin. Her Remezan, ayeta [4] شَهْرُ رَمَضَانَ الَّذِي أُنْزِلَ فِيهِ الْقُرْآنُ bi awayekî nûranî yî ronak nîşan dide. Remezan, îsbat dike ku ew, meha Qur-anê ye. Ferdên din ên wê cemaeta uzma, hinek jê, bi awayekî xuşûyî li wan hafizan guhdarî dikin. Yên din bi xwe, ji xwe re dixwînin. Li mizgefteke muqeddes ku di weziyeteke wiha de ye, mirov rabe bide pey hewesên wê nefsa suflî û bi xwarin û vexwarinê, ji wê weziyeta nûranî derkeve, çi qas kirêt û çirkîn be û çawan ku ji nefreta manewî ya cemaeta wê mizgeftê re dibe hedefa nefretê, wisan jî, yên ku di Remezana Şerîf de, li hember siyamê muxalefetê dikin, ew qas ji nefreta manewî ya wê alema Îsalmê re û ji tehqîra wê re hedef in.

NUKTEYA HEFTAN: *Siyama Remezanê, li aliyê qezenca new'ê beşer a ku ji bo zîraet û bazirganiya axretê hatiye vê dunyayê dinihêre. Hîkmetek ji gelek hîkmetên vî aliyê wê, ev e ku:*

Di Remezana Şerîf de xêra 'emelan, yeka bi hezarî ye. Bi ness û qet'îtiya hedîsê, her yek herfeke Qur-ana Hekîm, deh xêr dike, deh hesene tê hesibandin, deh meywe û fêkiyên Cennetê tîne. Di Remezana Şerîf de, her herfek deh na; hezar e û her herfeke ayetên mîna "Ayet-el Kursî", bi hezaran in û di Cim'eyên Remezana Şerîf de, bêhtir zêde ye. Di Leyletul Qedrê de, bi qasî sî hezar xêrî tê hesibandin. Belê, Qur-ana Hekîm a ku her yek herfeke wê, sî hezar meyweyên baqî dide, dikeve hukmê dar û şecereyeke wisan nûranî ya tûba ku di Remezana Şerîf de, bi milyonan, wan meywe û fêkiyên baqî bi mumînan dide qezenckirin. Eve were li vê bazirganiya qudsî, ebedî ku pir bi kar e, binihêre, temaşe bike û bifikire, yên ku qîmeta van herfan teqdîr nakin, çi qas di xesa-

4 Heyva Remezanê ku Quranê tê de hatiye nazilkirin. (Sureyê Beqere: 185)

reteke bêhed de ne, fam bike.

Ha, Remezana Şerîf, tu dibêjî qey ji bo axretê, meşhereke pir bi kar e, ciyê bazarekê ye.. û ji bo xasilat û debra axretî, zemîneke têra xwe bi xêr û bêr e.. û ji bo neşiw û nemaya xêr û qenciyan, ava biharkî ya nîsanê ye. Di hukmê îd û roşaneke herî ronak û qudsî de ye ku tê de ûbûdiyeta beşer, li hember Selteneta Rubûbiyet a Îlahî, meşa fermî dike. Û ji ber ku wisan e, ji bo ku nefs, bi xefletê nekeve îhtiyacên heywanî yên mîna xwarin û vexwarinê; muştehiyat û îştahên beredayî û hewaperestî, bi rojiyê hatiye mukellefkirin. Tu dibêjî qey, ji ber ku bi awayekî muweqqet/demdemî, ji heywaniyetê derdikeve û dikeve weziyeta melekiyetê yan jî, ji bo tîcareta axretê, dest ji îhtiyacên xwe yên dunyayî berdide û bi vî awayî, dikeve rewşa mirovekî axretî û rûhekî ku ji tecessuyê tezahur bûye. Bi sewma xwe, bi awayekî ji awayan, ji Semedaniyetê re 'eyînedariyê dike. Belê, Remezana Şerîf, li vê dunyaya fanî, di nav imrê fanî û jiyaneke kurt de, imrekî baqî û heyateke dirêj a baqî tezemmun dike, di xwe de dihewîne û dide qezenckirin.

Belê, tek yek Remezanek, dikare semerat û meyweyên imrekî heştê salî [ji mirovan re] bide qezenckirin. Îca Şeva Qedrê, bi îşareta qet'î ya Qur-anê ku ji hezar mehî bi xêrtir e, ji vî sirrî re huccetek û delîlekî qet'î ye. Belê, çawa ku padîşahek, di muddetê selteneta xwe de, hema hema her sal, an bi navê "culûsa humayun[5]" an jî, ji bo mezhera cilweyeke şeaşeaya selteneta xwe, hin rojan dike îd û roşan. Raiyeta xwe, di wê rojê de, ne di daîreya qanûnên giştî de; belkî dike mezherê îhsanên xwe yên xusûsî û mezherê huzûra xwe ya bêperde û îltîfata xwe ya xas û ji îcraeta xwe ya fewqelade newaze, milletê xwe yê layiq û sadiq, rasterast dike mezherê teweccuha xwe ya xas, wisan jî, Padîşahê Zulcelal ê hijdeh hezar aleman ku sultanê ezel û ebedê ye û Qur-ana Hekîm ku fermana wî ya alîşan e û li hijdeh hezar aleman dinihêre û teweccuh dike, di Remezana Şerîf de înzal kiriye. Helbet muqteza û pêdiviya hîkmetê ye ku ew Remezan, bikeve hukmê îd û roşaneke mexsûs a Îlahî û meşhereke Rebbanî û mecliseke Ruhanî. Madem Remezan, ew roşan e, helbet bi qasî dereceyekê, ji bo ku mirovan ji meşxuliyetên suflî û heywanî bikşîne, ew dê bi rojiyê werin emirkirin. *Îca rojiya wê ya kamiltirîn jî: Bi awayekî ji awayan, tevî mîdeyê, bi hemû sehekan, bi cîhazên însanî yên mîna çav, guh, dil, xeyal û fikrê girtina rojiyê ye. Ango, ew e ku mirov, wan [azayên xwe] ji muherrematan, ji tiştên beredayî bikşîne û sewqî ubûdiyeteke ku xasî bi wan e bike. Ji bo nimûneyê, zimanê xwe ji derewan, ji xiybetê û ji tabîrên bêedeb biqetîne û pê rojiyê bide girtin. Û wî lîsanî, bi tiştên mîna tîlaweta/xwendina Qur-anê û bi zikir, tesbîh, selawat û îstîxfarê bide meşxulkirin. Mesela çavê xwe ji nezera heram, guhê xwe ji guhdarîkirina tiştên nebaş dûr bigre û çavê xwe bide ser îbretê, guhê xwe bide gotina heq û Qur-anê û bi vî awayî bi cîhazên xwe yên dî, rojiyê bide girtin.* Jixwe bela ku mîde, fabrîqeya herî mezin e, gava ku mirov, bi rojiyê wê bixe tatîla meşxûliyetan, mirov dikare bi rehetî destgehên din ên biçûk, bike tabi'ê wê.

NUKTEYA HEŞTAN: *Remezana Şerîf, li heyata ferdî ya mirovan jî dinihêre. Ji gelek hîkmetên ku li vê hêlê dinihêre, yek jê ev e ku:*

Ji mirovan re ji wan cureyên dermanan, perhîzeke maddî û manewî ya herî muhîm e.. û ji aliyê tibbê ve, himyeyeke/parêzeke wiha ye: Her ku nefsa mirov, ji aliyê xwarin û vexwarinê ve, bi awayê keyfemayeşa, li gor kêfa dilê xwe tevdigere, hem çawa ku ji aliyê tibbî ve zerarê dide jiyana maddî ya kesan, îca wisan jî, nabêje helal-heram, tiştê ku rast lê tê, xwe davêje serê û adeta jiyana xwe ya manewî bi jehrê dixe. Êdî îtaetkirina ji dil û ruhî re, li wê nefsê giran tê. Bi serkêşî, dezgîna xwe digre destê xwe. Êdî mirov nikare li wê siwar bibe; ew li mirovan siwar dibe. *Îca bi xêr û wesîteya rojiya Remezana Şerîf, bi awayekî ji awayan hînî perhîzê dibe; hewl dide xwe ku bikeve riyazetê û hîn dibe ku li fermanan guhdarî bike. Li mîdeyê reben jî, bi wê xwarina berî hezim û gibirînê, xwarin li ser xwarinê danagre û nexweşînan nakşîne serê. Bi wesîteya emir û nehiyan, ji bo ku terka helalan bike û xwe ji heramiyan dûr bigre, qabiliyet pê re çê dibe*

5 Navê wê merasîmê ye ku gava Padîşah derdikevin ser textê milûkiyê, pêk tînin.

ku li emrê ku ji aqil û şerîetê tên, guhdarî bike. Zorê dide xwe; da ku heyata xwe ya manewî xera neke.

Hem piraniya mutleq a mirovan, gelek caran rastî belaya birçîtiyê dibin. Birçîtiya ku ji bo sebir û tehemmulê îdmanekê/bedenparêziyekê dide, muhtacî riyazetê ye. Rojiya di Remezana Şerîf de ku bi qasî muddetê panzdeh saetan –heke bê paşîv be bîst û çar saetan– birçîtî dewam dike û mirov sebir û tehemmul dike, ev riyazetek e, werzeweriyek û îdmanek e. *Nexwe dermanekî wê bêsebirî û bêtehemmuliya ku mûsîbeta mirovahiyê duqatî dike jî, rojî ye.*

Hem gelek xedemeyên wê fabrîqeya mîde hene. Hem gelek cîhazên însanî ku pê re eleqedar in hene. Nefis, heke di wextê rojê yê meheke demdemî de, nekeve tatîla şuxulan, îbadetên xusûsî yên wan xedemeyên wê fabrîqeyê û wan cîhazan, bi wan dide jibîrakirin; bi xwe re dide meşxulkirin û wan di bin zordestî û fermanên xwe de dihêle. Wan cîhazên din ên însanî jî, bi qelebalixa çerxên wê fabrîqeya manewî û bi dûmanên wan, muşewweş û tevlîhev dike. Daîma bala wan dikşîne ser xwe. Wezîfeyên wan ên hêja û ulwî, bi demborî bi wan dide jibîrakirin. Ji ber wê yekê ye ku ji zemanê berê ve, gelek ehlê welayetê, ji bo riyazeta kamilbûn û tekemmuliyê, xwe hînî xwarin û vexwarina hindik kirine. Îca bi rojiya Remezana Şerîf, xedemeyên wê fabrîqeyê, fam dikin ku sirf ne ji bo wê fabrîqeyê hatine xuluqandin. Îca ew cîhazên din, li hember zewqên suflî yên wê fabrîqeyê, di zewqên melekî û ruhanî yên Remezana Şerîf de telezzuz dikin; bala xwe didin ser wan. Ji ber wê yekê ye ku Mumîn, di Remezana Şerîf de, li gor dereceyên xwe, dibin mezherê nûr, feyz, surûr û dilşadiyên manewî yên cihêrengî. Di wê heyva mubarek de, bi wesîteya rojiyê, gelek tereqqî û tefeyyuzên wan letîfeyên mîna dil, ruh, aqil û sir hene. Digel ku mîde digrî jî, îca ew [letîfe], bi awayekî masûmî dikenin.

NUKTEYA NEHAN: *Rojiya Remezana Şerîf, rasterast li hêla şikandina rubûbiyeta mewhûm a nefsê dinihêre û dixwaze ku neçarî û kêmtaqetiya wê nîşan bide; ubûdiyeta wê pê bide ragihandin. Ji gelek hîkmetên vê hêlê hîkmetek ev e ku:*

Nefs, naxwaze Rebê xwe nas bike; bi fîrewnî rubûbiyeta xwe dixwaze. Çi qas ezab pê were kişandin, ew demar pê re dimîne. Lê belê bi birçîtiyê, ew demar dişkê. *Ha, rojiya di Remezana Şerîf de, rasterast derbe li aliyê cebheya fîrewnî ya nefsê dide, dişkêne. Eczî û neçariya wê, feqra wê, nîşanî wê dide. Pê dide hînkirin ku ew ebd e.*

Di rîwayetên hedîsê de heye ku Cenabê Heq ji nefsê re gotiye: *"Ez kî me; tu kî yî?"* Nefsê gotiye: *"Ez ez im; tu tu yî."*

Ezab dayêye, avêtiye Cehennemê, dîsa pirsiye, dîsa gotiye: *"Ene ene; ente ente."* Çi cure ezab dayêye, dest ji enaniyeta xwe bernedaye.

Peyre bi birçîtiyê ew daye ezabdan. Ango ew birçî hiştiye. Dîsa pirsiye: *"Men ene wema ente?"*

Nefsê gotiye: *"Ente Rebbî-r Rehîm . We ene ebduk-el aciz"* Ango *Tu Rebbê min ê Rehîm î; ez ebdekî te yî aciz im.*

[6] اَللّٰهُمَّ صَلِّ عَلٰى سَيِّدِنَا مُحَمَّدٍ صَلٰوةً تَكُوْنُ لَكَ رِضَآءً وَلِحَقِّهٖ اَدَآءً بِعَدَدِ ثَوَابِ حُرُوْفِ الْقُرْاٰنِ فِىْ شَهْرِ رَمَضَانَ وَعَلٰى اٰلِهٖ وَصَحْبِهٖ وَسَلِّمْ

[7] سُبْحَانَ رَبِّكَ رَبِّ الْعِزَّةِ عَمَّا يَصِفُوْنَ ۝ وَسَلَامٌ عَلَى الْمُرْسَلِيْنَ ۝ وَالْحَمْدُ لِلّٰهِ رَبِّ الْعَالَمِيْنَ ۝

ÎTÎZAR: Ev qismê duduyan –di çil deqîqeyan de– ji ber ku bi awayekî bilezûbez hatiye nivîsandin û ji ber ku ez û katibê ku wî ev muswedde dinivîsand, em her du jî nexweş bûn, helbet tê dê muşewweşî, tevlîhevî û qusûr hebin. Em li bendê ne ku birayên me, bi çavê musamehekar lê binihêrin. Ciyên ku munasib bibînin, dikarin teshîh bikin.

6 Ya Rebbî, bi qasî hejmara wan xêrên herfên Quranê ku di meha Remezanê de tên xwendin selat û selam li ser seyyîdê me Muhemmed û al û sehabiyên wî bikî ku pê, em bibin mezherê rizaya te û heqqê wî yê li ser me jî were cî.

7 Rebbê te yê ku xwedî îzzet û mezinahiyê ye, ji wan tiştên ku ew pê diwesifînin, pak û qudsî ye. Selam be li ser pêxemberan. Hemd be ji wî Xwedayê ku Rebbê aleman e. (Sureyê Seffat: 180-182)

MEDRESEYA AXTEPEYÊ *

Zeynelabidîn ZINAR

Medreseya Axtepeyê, di çarîka pêşîn ya Sedsala 19'an de, ji aliyê Şêx Hesenê Nûranî ve (?..... -1866) li gundê Axtepeyê hatiye avakirin.

Şêx Hesen piştî ku li Bazîdê destûrnameya xelîfetiya Nexşebendî ji Şêx Salihê Sîpkî wergirtiye, çûye gundê Axtepeya girêdayî bi Çinara Diyarbekirê ve, li wir medreseyeke bi rêkûpêk ava kiriye. Herwiha Şêx Hesen aboriya Medreseya xwe jî, bi 52 perçe zevîyên xwe daye kirin.

Şêx Hesen ji ber ku zanayekî pir dagirtî bûye, hem ders daye şagirdan, hem jî îrşad kiriye. Ji ber hindê ye ku jê re gotine *Şêx Hesenê Nûranî.*

Dema Şêx Hesenê Nûranî wefat kiriye, kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî (1850-1905) hêj 12 salî bûye. Îcar li Medreseya Axtepeyê, ders ji aliyê Mele Selîm û Mele Mihemed Emîn ve hatine dayîn heta kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî xwendina xwe kuta kiriye û hatiye li Medreseya Axtepeyê dest bi dana dersan kiriye.

Di vê malbatê de ji ber ku fikra xwendin û nîvîsandina bi zimanê kurdî ji bapîrê malbatê dest pê bûye, piştî Şêx Hesenê Nûranî, kurê wî Şêx Evdirehman Axtepî jî, kultura xwendin û nivîsandinê, li Medreseya bavê xwe geştir û şêntir kiriye.

Di Medreseya Axtepeyê de, gelek zimanên cuda hatine bikaranîn. Di lêkolîna min a li ser Medreseya Axtepeyê de, derket holê ku ji zimanê kurdî, yê erebî, farisî û osmanî zêdetir, tê de zimanê rûsî û yê yunanî jî hatine bikaranîn. Yanî xwendin di vê medreseyê de bi 6 zimanan hatiye kirin.

1- ŞÊX EVDIREHMAN AXTEPÎ

Eger em hinekî behsa Şêx Evdirehman Axtepî bikin, tê dîtin ku ew mirovekî pir zana, dûrebîn û rewşen bûye. Wî bi destê xwe gutleke grover a vê dinyayê çêkiriye û li serê parzemîn û welat daye nîşandan. Herwiha wî salnameyek jî çêkiriye û ji me re diyarî hiştiye.

1. Şeyh Muhammed Can Aktepe
2. Şeyh Abdurrahman Aktepe
3. Şeyh Halit Zila
4. Şeyh Muhammed Zila

Şêx Evdirehman Axtepî, li Diyarbekirê wek Reîs-ul Ulema ango serokê zanayan jî hatiye îlankirin.

Şêx Evdirehman Axtepî, pir xwestiye ku zarokên Kurdan bixwînin û zana bibin. Ji ber hindê, eşkere tê dîtin ku ewî jî daye pey rêça Ehmedê Xanî.

Dema Şêx Mihemed Can (1858-1909) li Şamê destûrname û xelîfetîya nexşebendî ji Tekyaya Mewlana Xalid wergirtiye, vegeriyaye hatiye Axtepeyê. Îcar Şêx Evdirehman hem dersdan û hem jî

* Ev nivîs beşek ji gotara Zeynelabidîn Zinar a ku di sempozyoma navnetewî ya di derbarê medreseyan de ku ji aliyê Zanîngeha Bîngolê ve hatibû lidarxistin de (29-30 Hezîran- 2012) pêşkêş kiribû, hatiye wergirtin.

şêxtî sipartiye wî. Îcar Şêx Evdirehman bi temametî xwe daye ser nivîsandinê û bi zimanê kurdî û erebî, berhem afirandine.

Lê mixabin Şêxê gorbihişt di temenekî ciwan de (55 salî) çûye ber dilovaniya Xwedayê mezin. Lê mixabin hêj di salên 1939-40'an de leşkerên Kemalîzmê avêtine ser Medreseya Axtepeyê û ew Arşîva mezin serobin kirine û çi pirtûkên kurdî dîtine, ji navê derxistine û li navrasta gund kom kirine, li ber çavên gundiyan şewitandine.

Herwiha hêzên Kemalîzmê ew arşîv ji bîr nekirine û dema Cuntaya Leşkerî ya 1961, 1971 û 1980ê jî ku çêbûne, dîsa avêtine ser gundê Axtepeyê û piraniya pirtûkan birine.

Niha salixê kitêbeke Şêx Evdirehman li bajarê Muglayê hatiye hildan. Ev kitêb li ser derd û dermanan hatiye nivîsandin, Di wê kitêbê de kîjan giya dermanê kîjan êşê ye dinivîse. Herwiha salix hatiye dayîn ku hin kitêbên Şêx Evdirehman ên din jî, li bajarê Konyayê ne. Berhemên Şêx Evdirehman Axtepî yên ku niha di destên min de ne, ev in:

a) Rewdneîm

Ev pirtûka bi navé Rewdneîm ya herî mezin e û xwerû bi zaravê kurmancî ye. Di 1886'an de hatiye nivîsandin. Tev rîwayetên kevnare ne ku bi helbestkî li ser jiyana Pêxemberê me hz. Mihemed nivîsiye. Xasma tê de rewşa çûn û hatina ji Mî'racê beyan kiriye. Lê belê di nava wan helbestên olî de, Şêxê me hin car qelema xwe kiriye şûr û pê êrîş biriye ser rewşenbîrên Tirk û Ereb û Faris jî.

Di pirtûkê de 35 beş hene. Babeta her beşekê jî cuda ye û 4531 malik in. Yanî 9.062 rêz in. Rewdneîm wek kêşa Mewlûda Kurmancî ya Melayê Bateyî, malikên wê tev bi yazdeh kiteyan dikişin, gelek rewan in, bi kêş û qafiye ne. Her du rêz, bi eynî tîp qafiye ne, bi zarekî şêrîn û bi nikleka pir xweş li pey hev didomînin.

Şêx Evdirehmanê Axtepî, çawa ku wî bi xwe di helbestekê de beyan kiriye, pirtûka xwe ya Rewdneîm di sala 13O2'yê Koçê (1884) de nivîsîye.

Min ev pirtûk di sala 1988'an de ji tîpên Erebî veguheztiye tîpên Latênî û di 1991'ê de jî li Swêdê daye çapkirin. Ev çap 438 rûpel e.

b) Dîwana Rûhî

Ev pirtûka Şêx Evdirehmanê Axtepî, bi navê Dîwana Rûhî hatiye naskirin. Çawa ku li pêş jî hatiye gotin, *Rûhî* nasnavê Şêx Evdirehmanî ye ku wî di helbestan de ji bo xwe bi kar aniye. Dîwan di sala 1293'ê Hicrî (1876) de hatiye nivîsandin. Bi tevayî 28 beş in û 471 malik in, tev bi kêş û qafiye ne û kiteyên wan bi jimar in. Her beşek li ser jimareke kifş bi kiteyan dikişe û hin malikên pêncok jî tê de hene.

Cara pêşî min ev dîwan di sala 1988'an de, ji tîpên Erebî veguheztiye tîpên Latênî û di eyni salê de jî, weşanxaneya "Jîna Nû" di meha Êlûnê de li Swêdê, bajarê Uppsalayê çap kiriye.

c) Kitabu Keşfîz'zelam

Ev pirtûka Şêx Evdirehman xwerû bi zimanê Erebî ye û li ser fikra baweriyên cuda yên di ola îslamê de hatiye nivîsandin. Pirtûk 35 rûpel e. Lê heta niha jî çap nebûye.

d) Kîtab ul-Ebrîz

Şêx Evdirehman Axtepî, ev pirtûk jî bi zimanê Erebî nivîsîye. Li ser eyişandin û îsbata Quranê ye ku pirtûkeke asîmanî ye û ku ji aliyê Xwedê ve, ji hz. Mihemed pêxember re hatiye hinartin. Pirtûk 81 rûpel e û heta niha çap nebûye. *Şêx Evdirehman Sedemê Nivisandina bi zimanê kurdî wiha beyan kiriye:*

Helbestvan û nivîskarê nemir Şêx Evdirehmanê Axtepî, sedemên herî girîng ku ev pirtûk nivîsîne, hin jê ev in ku li layêt welatparêzî bi hin helbestên xwe eşkera gotiye:

Ji van qesdê min nîne 'erzê huner
Welê da li dunya bimînit eser
Ku Turk û Ecem qet nebên carekê
"Nehin Kurdî şa'ir di misra'ekê"

Bizanin ku şa'ir ji Kurdan hene
Ji 'uşşaqê Turk û Ecem zêde ne
...

Gelek caran jî Axtepî li ser vexwarina bade û meyê, herweha daketina meyxaneyê û li ser evîna xwe jî çend malik wiha gotiye:

Were ey qelem ser siyaqa ewil
Tu jî saqiya bîne cama çu gul
Ku seccade û xerqe û sebheyê

Bikim rehnê bade di meyxaneyê
…
Ev çend malikên li jêrê, jêderkên ji Dîwana Şêx Evdrihmê Axtepî ne:
…
Da çêbitin der dil tereb
Turk û Ecem, Rom û Ereb
Guh din bi qanûnê edeb
Ser ah û kovan û keser.
…
Axtepî li ser evîna xwe di Dîwanê de jî wiha gotiye:
…
Ji dil daxwazê yarê me
Qewî mexmûrê badê me
Murîdê saz û badê me
Bi îxlasê temennayê.
…
Bi qurban bim ji bona çeşmê şehla qameta yekta
Di her wext û di her gavan di nîva sar û sermayê
...
Îd e, keyf û şahî ye, nêv xas û amê xulxul e
Yek yekan aşiq li ser sorgul mîsalê bulbul e…
...
Turk û Tacik û Qeçer ber milkê dil anîn hucûm
Pey bi pey, saet bi saet xaretê Kurdan dikin

2- ŞÊX MIHEMED CAN (1858-1909)

Şêx Mihemed Can roja 13'yê Şe´bana 1274'ê Koçê, li Axtepeya girêdayî bi qeza Çinarê ve hatiye dinyayê. Ev tarîx li pêşberî ya Zayînê dike 29'ê adara 1858. Şêxê nemir di 21'ê Adara 1325'ê Romî de jî çûye ber dilovaniya Xwedê. Ev tarix jî li pêşberî ya Zayînê dike 03. 04.1909

Mihemed Can kurê Şêx Hesenê Nûranî ye, navê diya wî Şerîfe xanima keça mele Hesen e û birayê bindest ê Şêx Evdirehmanê Axtepî ye. Ji xeynî Şêx Evdirehmanê Axtepî û Şêx M. Can, du kurên Şêx Hesenê Nûranî yên din jî hebûne. Yek Şêx Mihemed Sîrac e û yê din Şêx Mihemed Nûr e. M. Can xwendina wê destûrnameya xwendinê ji dersdarê menşûr Mele Mihemedê Kurmuşluyê wergirtiye.

Piştî wergirtina destûrnameya xwendinê, M. Can xelîfetiya rêçika Nexşebendî ji kekê xwe Şêx Evdirehman Axtepî wergirtiye. Lê ji bo teberuk, kekê wî ew hinartiye Şamê wargeha Mewlana Xalidê Kurdî, piştî demekê xelîfetiya rêçika Nexşebendî ji wir jî wergirtiye. Piştî wergitina xelîfetiyê ji Tekyaya Mewlana Xalid, Şêx M. Can bi şûnde vegeriyaye

gundê xwe Axtepeyê û li şûna kekê xwe Şêx Evdirehman, di Medreseyê de desdarî kiriye ta ku çavên xwe ji dinyaya ruhnik girtine. Pirtûka Şêx Mihemed Can Leyl û Mecnûn e. Ev pirtûk, hetanî 1992'an jî ruyê rojê nedîtiye ta ku gihaşte destên min û min ew ji alfabeya Erebî veguhezt a Latênî. Ev teksta pirtûkê ya destnivîsa bi tîpên erebî, 148 rûpel e, digel beşa destpêk û ya dawî, tê de 19 sernav û 1882 malik hene. Helbestên wê hemû xweşxwîn û rewan in; bi deh kiteyan dikişin û qafiyeya her du rêzên malikan jî yek e, di 1302'an (1884) de jî kuta bûye. Şêx Mihemed Can pirtûkek bi nave Medhiye jî, li ser Rewdneîma kekê xwe Şêx Evdirehmanê Axtepî nivîsîye. Şêx Mihemed Can di destpêka pirtûka xwe de sedemê nivîsandina bi zimanê kurdî wiha beyan kiriye:

....
Kurmancî qesaidê di mewzûn
Behsê bikin em ji halê Mecnûn.

Turkî hene, nîne kurdewarî
Kurdî wekî kenzeke veşarî

Qet nîne kesek ji xelqê Ekrad
Leylasîfet ew bi ah û feryad?

Işqê qe nekirine ew belakêş?
Hicrê qe nekirine ew cîgerrêş?

Min dî hene, lêkî bê mecal in!
Puraqil û sahibê kemal in!

Sahibhuner û xwedanhewes bûn
Lê şubhetê teyrekî qefes bûn!
Wan nîne muşîr û ne debîrek
Ne padîşehek, ne wan wezîrek!
Peyda bikira ger me emîrek

Sahibhuner û xwedanê şîrek

Ev Turk û Ereb, Tetar û Faris
Carek bibûna li ber me naqis

Her şairekî zebanê Kurdan
Qet nayê ji halê wan xeberdan

Her şi´r û qesîde dê bigota
Dunya ser û bin hemî bisota
...

Şêx Mihemed Can behsa camêrî û merdiya Kurdan jî wiha gotiye:

…
Ew çend sexaweta li erdan
Bîl cumle Xwedê didaye Kurdan

Ekradîsîfet sexî tunin qet
Wan qehwe diçin bi şubhetê şet

Ne Ce´ferê Bermekî, ne Hatem
Qet nîne kesek ji neslê Adem.
...

3- ŞÊX HESÎB AXTEPÎ (1885 – 1947)

Şêx Hesîb Axtepî di 1301'ê Romî (1885) de, li Axtepeya girêdayê bi qeza Çinara Diyarbekirê ve, hatiye dinyayê, di 1947'an de jî, li Çinarê çûye ber dilovaniya Xwedê. Niha gora wî li goristana Şêx Hesenê Nûranî ya li gundê Axtepeyê ye.

Hesîb kurê Şêx Mihemed Can e, birazîyê Şêx Evdirehmanê Axtepî û neviyê Şêx Hesenê Nûranî ye. Şêx Mihemed Behçed û Şêx Mihemed Munîr jî birayên wî bûne.

Hesîb pêşî li ba bavê xwe Şêx Mihemed Can xwendiye, piştre li Medreseya navdar a Axtepeyê li ba mamê xwe Şêx Evdirehmanê Axtepî xwendiye, heta ku Xwendina Rêzê kuta kiriye û destûrnameya (îcaze) xwendin û ya Xelîfetiya Rêçika Nexşenbî wergirtiye.

Ji xwendin û zanînê zêdetir, Şêx Hesîb rûmeteke mezin daye pirtûkan û pirtûkxaneya xwe pir dewlemend kiriye. Li gor tê gotin, di pirtûkxaneya wî de bi hezaran pirtûkên cihê hebûne. Lê mixabin leşkerên Komarê piraniya berhemên pirtûkxaneya Şêx şewitandine.

Şêx Hesîb sê pirtûk bi zimanê kurdî û nusxeyek jî bi destên xwe ji ber Dîwana Melayê Cizîrî nivîsîne. Pirtûkeka wî bi navê Simbil û Dîwaneka wî di 1971'ê ji aliyê leşkeran ve hatine şewitandin.

Dîwaneka Şêx ji şewitandinê rizgar bûye û min ew veguheztiye alfabeya Latênî, ji aliyê weşanxaneya DOZê ve çap bûye. Di vê Dîwanê de 94 beş, 1.235 malik(ên durêzî), 318 malikên çarîne, 30.130 peyv, 113.635 tîp û 6.000 rêz hene ku her yekê ji van, bi naveroka xwe pir dewlemend, babetek cihê û bi tewrekî xweş hatiye honandin.

4- ŞÊX MIHEMED KERBELA 1885-1939)

Şêx Mihemed Kerbelayî helbestvan û nivîskar, herwiha mêrxasê bi navûdeng, di sala 1885'an de, li gundê Axtepe ji diya xwe re çêbûye û di sala 1939'an de jî, li gundê Çolê çûye ber dilovaniya Xwedê, li gundê Axtepe di wargeya xwe ya timî de dimîne.

Şêx Kerbela kurê Şêx Evdirehmanê Axtepi ye. Lê ew bi Şêxîtiyê qewî nehatiye naskirin. Di nava xelkê de, jê re Mihemed Kerbela, yan jî Kerbelayî dihate gotin. Herwiha ew alim û zanayekî gihaştî bûye. Xasma di warê zanîn û dersdana feqiyan de, şûna bavê xwe dagirtiye.

Muhemed Kerbela li paş xwe du pirtûkên giranbiha ji me re diyarî hiştine. Yek dîwanek e û ya din jî ferhengokeka Kurdî-Farisî ya bi navê MÎRSADUL ETFAL e. Wî ew Ferheng di sala 1912'an de nivîsîye. Her çiqas pirtûk bi xwe ferheng e, lê wek NÛBARa Ehmedê Xanî, bi kêş û qafiye û kite, bi helbestkî nivîsîye. Tê de li dor 135O bêjeyî hene. Navê wê, bi mana riya (papûr) piçûkan e.

Min ev pirtûk veguheztiye tîpên latênî 1989'an de li Swêdê weşanxaneya Jîna Nû çap kiriye. Diwana wî jî hêj nehatiye weşandin.

5- ŞÊX MIHEMED ESKERÎ (1898 – 1952)

Şêx Eskerî di 1316'an (1898-1899) de, li gundê Axtepê hatiye dinyayê û di 1952'an de jî çûye ber dilovaniya Xwedê û gora wî ya pîroz niha li gundê Çolê ye.

Şêx Mihemed Eskerî kurê Şêx Evdirehmanê Axtepî ye. Wî xwedina xwe ya destpêkê, li ba bavê xwe xwendiye û piştre di Medreseya Axtepeyê de li xwendinê domandiye. Piştî ku bavê wî çûye ber dolovaniya Xwedê, îcar li ba kekê xwe Şêx Kerbela

xwendiye.

Şêx Mihemed Eskerî pênc berhem bi kurdî nivîsîne.

a) Iqdê Durfam.

Ev pirtûk ji aliyê min ve hatiye veguheztin bi alfabeya Latênî û ji aliyê Weşanxaneya Apec- tryckê ve jî li Swêd/Stockholmê (1989, 203 rûpel, ISBN 91-877301-6-2) hatiye çapkirin. B/12.

b) Keşkol.

Ev pirtûk ji aliyê min ve hatiye veguheztin bi alfabeya Latênî û ji aliyê Weşanxaneya DOZê ve jî li Stenbolê hatiye weşandin.

c) Memozîna Ehmedê Xanî.

Şêx Eskerî nusxeyek ji ber Memozîna Ehmedê Xanî nivîsiye.

d) Ilmê Ehwalê Berq û Burûsk û Baran, Qews û Qezehê.

Şêx Eskerî bi xwe gotiye: ”*Min kitabek Ilmê Ehwalê Berq û Burûsk û Baran, Qews û Qezeh ku filan weqtê wiha derkeve weya yê wisan dibe…”* nivîsiye.

e) Dîwana Helbestan

Ji van berhemên ku behsa wan li jorê hatiye kirin, ji xeynî *Iqdê Durfam* û *Keşkol*ê, min yên din nedîtine.

Şêx Eskerî di beşa 41’ê de, ji bo debara xelkê, kar û kiryarên wan, ev şîret û qewîtî kirine:

Çendan şecera sebrê gelek tal e, sebir ke
Ta meywe ku da, xwoş tu bixwo, şeker û noş e

Dunya bi yeqîn mezre´e ye tişkî biçîne
Nabînî kesên ku nebit qûti, mirî ne!

Herwiha ji bo vîna evîndar û meyê jî Şêxê Nemir wiha gotiye:

Saqi yû mey û yarê bihebîn, Abi Heyat e
Qûtê dil e, ev e se´yê ke, nê av e, ne nîne!

Şêx Eskerî derbarê xemxuriya zimanê kurdî de jî, wiha gilî û gazin kirine:

Bîl xasse, bi nezmê kurdewarî
Qet kes nekirî mereq û yarî

Bîl cumle kitab û şi´rê Kurdan
Bê qedri dibûn li cumle erdan

Ew ketne ziyade ber piyan tev
Reşbexti weh mane şubhetê şev

Gorbihişt Şêx Eskerî di beşa 43’an de, Silsileya Xelîfetiya Rêçika Nexşebendî, ji Nebî Sidîq heta bigîje mamê wî Şêx Mihemed Can Axtepî, bi helbestkî wiha daye xuyakirin: ”Nebî Sidîq, Selman, Qasim, Ce´fer, Teyfûr, Ebul Hesen, Elî, Yûsuf Gencûr, Ebdilxaliq Amedi, Arif, Mehmûd, Elî, Babakulal, Elauddîn, Şêx Yaqûb Çerxî, Xwaceh Ehrar, Şêx Muhemmed Zahid, Şêx Derwêş, Şêx Muhemmed Xwace, Baqî, Şêx Seyfuddîn, Şêx Seyid Nûr, Şêx Ebdullah Dehlewî, Mewlana Xalid Şehrîzûrî, Şêx Xalid Cizîrî, Şêx Behauddînê Sanî, Şêx Hesenê Nûranî, Şêx Evdirehmanê Axtepî- Rûhî, Şêx Muhemmed Can Axtepî.”

6- Şêx Mihemed Sîrac

Min zêde agahdarî li ser vî zatê hanê, bi dest nexistiye. Min bihîstiye ku wî jî berhem nivîsine, lê agahdariya min bi jimara wan û zimanê wan çênebûye.

Çavkanî:

- Şêx Evdirehmanê Axtepî, Rewdneîm, Kurdî, Sverige/ Stockholm, 1991, 440 rûpel, ISBN 91-830062-0-0. Tîpguheztina ji alfabeya erebî: Zeynelabidin Zinar.
- Şêx Evdirehmanê Axtepî, Dîwan, Kurdî, Jîna Nû, Sverige/Uppsala, 1988, 140 rûpel, ISBN 91-970927-6-2. Tîpguhaztina ji alfabeya erebî: Zeynelabidin Zinar.
- http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Mihemed_Can&variant=ku
- http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Hes%C3%AEb_Axtep%C3%AE&variant=ku
- http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Mihemed_Kerbela&variant=ku
- http://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=%C5%9E%C3%AAx_Eskeri&variant=ku
- www.pencinar.se
- http://ku.wikipedia.org/wiki/%C5%9E%C3%AAx_Evdirehman%C3%AA_Axtep%C3%AE

Komeleyên ku Bedî'uzzeman Seîdê Nûrsî Pê re Têkildar bû:

KOMELEYA WEŞAN Û GIŞTÎKIRINA PERWERDEYÊ A KURDAN

Aqîl Mihacir

Bedî'uzzeman Seîdê Nûrsî, çi li welêt çi li Stenbolê, di hemû jîyana xwe de, xizmetên ku kirine, îlahim digel hevalên xwe û xwendekarên xwe kirine. Piştî tespîtkirinên kêmasîyên bingehîn yên Kurdistanê, ji welêt vediqete û ji bo ji holê rakirina wan, sê caran diçe paytextê Osmanîyan û vedigere. Di van her sê çûyînên wî de em wî di nava gelek komeleyan da dibînin. Em dê li vir komeleyeke ku cara sêyemîn li Stenbolê bû, bûbû avakerê wê, bi we bidin naskirin.

Wekî ku tê zanîn zanyarê navdar Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, cara ewil di dawiya sala 1907an da, ji bo armanceke girîng hatibû Stenbolê; ew armanc jî, pêş de birina asta perwerdeya Kurdistanê û îspatkirina pêkannebûna pûçkirina Quranê bû. Wekî tê zanîn, bi wesîleya alayên Ḧemîdîyeyan, li herêma Kurdan gelek mekteb vebûbûn; lêbelê ji vana hew zaroyên ku Turkî dizanibûn îstifade dikirin. Wî dixwest ku tew nebe sê Daru't-talîm li Kurdîstanê veke...

Bila bê zanîn ku Ustêd, Dewleta Osmaniyan fena mirovekî, nîştegeha Kurdan jî wekî ezayekî wî mirovî didît û dinirxand. Bi qasî ku ji kirin û gotinên wî em fehm dikin, Bedîuzzemên Seîdê Nûrsî ewilî zen dikir ku ji ezayên govdeya Osmanîyan, hew Kurdistan nexweş e; lêbelê dema ku tê Stenbolê û rewşa siyaseta paytextê dewletê dibîne, wê çaxê fehm dike ku, nexweşiya serê (paytext) dewletê ye ku sîrayeta Kurdîstanê bûye. Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, digel riḧetkirina Kurdîstanê, dixwaze serê govdeya dewleta Osmanîyan (rêveberîyê) jî, ji nexweşîyan bifilitîne. Seba pêkanîna vê armanca pîroz li paytext, dikeve nav gelek kar û xebatan.

Jiber ku dizane tevgerîna bi tenê, tu armancan bi dest naxe, dest bi tevgerînên hevgirtî û hevpar dike. Wê demê li Stenbolê him hin telebeyên wî yên berê hebûn, him jî hin hevalên wî yên pêbawer hebûn. Yek ji telebeyên wî yên li vî bajarî bûn –ku raste rast bi mijara vê nivîsê re têkildar e û em ê li jêr wî bi we hinekî bidin naskirin - Ḧemzeyê Muksî bû.

Mîna ku tê zanîn, Cenabê Bedîuzzeman di sala 1909'an de li Stenbolê, li dû bûyera 31'ê Adarê, di darizandina li dadgeha Dîwana Ḧerba Urfî de wexta ku li ser mensûbiya xwe ya *Komeleya Yekgirtiya Muḧemmedî*, îfadeya xwe dide, di parastnameya xwe ya dadgehê de di cînayeta heftan, derḧeqê komeleyên ku endamê wan in de, dibêje ku:

"...*Ben nasil kî yedî cemîyete mensûbûm*..." [1] *(Çawa ku ez mensûbê heft komeleyan im).*

Ev gotina wî ya di wê parastnameya bi nav û deng de bi xwendevan û şopgerên wî famkirin dide ku Ustad, Ḧeya wê tarîxê (1909), bûye endamê heft komeleyan ku ji van yek jî Komeleya Yekîtîya Muḧemmedî bû.

Lêbelê di vê nivîsê de, em ê ne li ser kîjan bûna wan komeleyên berî Şerrê Cîhanê bisekinin, ne jî li ser "Komeleya Yekgirtîya Muḧemmedî" ku di dadgeha Dîwana Ḧerbê ya Urfî de bûbû sedema darizandina wî.

Wekî tê zanîn, li dû beratkirina li dadgehê vedigere welêt û ji bo karê perwerdeyê cardin tê paytext. Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, li dû gelek mucadeleyan şûnde, ji rêvebirîyê destûra avakirina Medreseya Zehrayê distîne û seba dest bi înşatê bike, diçe Wanê. Di demeke kin de dest bi lêkirina vê unîwersîteyê dike; lê mixabin Şerrê Cîhanê yê Yekem dest pê dike û înşata

medreseyê nîvçe dimîne. Ustad, digel xwendevanên xwe, tevlî şer dibe; lêbelê dîl dikeve. Li dû gelek zemanî, ji destên leşkerên Rûsan difilite û ber bi azadîyê ve direve; di taliyê de xwe digihîne Stenbolê, ji aliyê siltên ve bi ezatiya *Daru'l Ḧîkmetu'l Îslamîye*yê, tê tayînkirin.

Di vê nivîsê de em dê li ser komeleyeka ku di 1919'an de ava bûye û Bedîuzzemên di nav avakarên wê de cî girtîye, bisekinin. Navê vê komeleyê "*Kurd Tamîm-î Mearîf we Neşrîyat Cemîyetî*" (Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan) ye.

Ev komele, li Stenbolê, di serê sala 1919'an de hatibû avakirin. Hedef û armanca wê hew di warê weşan û perwerdeyê de xebitîn bû. Ji çavkaniyan tê fehmkirin ku vê komeleyê hemû xebatên xwe, bi "*Komeleya Bilindikirina Kurdistanê"* re têkildarane (ḧeta bibêje bi hevkarane) meşandiye.

Avakarên vê komeleyê, di heman demê de kesayetên bijarte yên Komeleya Bilindikirina Kurdistanê bûn jî.[2] Yên ku "*Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*" jî damezrandine heman kes bûn. Damezranerên vê komeleya çandî û perwerdehiyê, ji van kesan pêk dihat:

Emîn Elî yê Bedirxanzade, Dr. Evdillah Cewdet, Mitḧet Begê Bedirxanzade, parlementerê Erziromê Seyfillah Beg, parlementerê Hekkarîyê Taha Efendî, parlementerê Wanê Tewfîq Beg, Kamil Begê Bedirxanzade, Evdirreḧman Begê Bedirxanzade, parlementerê Gêncê Miḧemed Efendî, Huseyn Begê Mîr Zeytînzade, Mîralay Meḧmûd Samî Beg, Dadger Miḧemed Faîq Begê Diyarbekrî, Bedîuzzeman Seîd Efendî, Xelîl Xeyalî Efendîyê Mûtkîyî, Eḧmed Ramîzê Kurdîzade.[3]

Rêvebirê yekemîn yê vê komeleyê, telebeyê Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, Ḧemzeyê Muksî bû. Berî esareta Ustêd ew jî li Stenbolê bû û bi wî re bû. Wextê ku Ustad ji esaretê vedigere, dibîne ku ew telebeyê wî, di hin mijaran da ray û ramanên wî ji pîvanên ḧeqqîyê dûrketine; Ustad li dû çend şîretdayînan, wî ji wan ẍeletîyan difilitîne. Ḧemzeyê Muksî li dû vê bûyerê tim bi Ustad re tevdigere û li Stenbolê gelek xizmetên girîng dibîne. Xwendevanê Rîsaleyên Nûr dizanin ku ev telebeyê Ustêd, telebeyekî zîrek yê Xorxorê ye, xwedî qelemeke bi hêz e û weşangerekî gîhaştî ye. Tê zanîn ku ji Kullîyata Rîsaleyên Nûr *Îşaratu'l Îcaz* û *Onûcû Soz* û ji qlasîkên Kurdî berhema herî girîng *Mem û Zîn*, cara ewil ji alîyê wî ve hatiye weşandin.[4]

Bi qasî ku em dizanin, kovara "Jîn"ê, di demên dawî de ji aliyê vê komeleyê ve hatiye weşandin. Li gor agahiyên di destên me de ne, kovara "Jîn"ê, li dû avabûna vê komeleyê, derbasî destê rêveberiya vê komeleyê bûye û ji wê demê û pê ve karê weşandinê, wê rêveberîyê meşandiye. Ev rûdan, di vê kovarê de wiha hatiye nivîsîn:

"*Komele, kovara Jînê, ku zûde ye têye weşandin û ḧeya ku Xwedê bixwaze jî wê were weşandin, dixe bin rêveberîya xwe û bi navgîniya kovarê ve hemû hevneteweyên xwe vedixwîne qada bexşandin û comerdiyê"* [5]

Avabûna komeleya "*Kurd Tamîm-î Mearîf we Neşrîyat Cemîyetî*" (*Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*), di meha Sibata 1919'an da, di kovara "Jîn"ê de bi îlaneke berfireh,[6] hatiye ragihandin.

Kovara "Jîn"ê ḧeya meha Sibata 1919'an, bi destê "Komeleya Bilindikirina Kurdistanê" dihat weşandin. Lêbelê tiştekî balkêş e ku, "*Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*", bi destên endamên heman komeleyê (yanê bi destên endamên Komeleya Bilindikirina Kurdistanê) hatiye damezrandin.

Jiber ku di nav hedef û armancên "Komeleya Bilindikirina Kurdîstanê" de mijarên sîyasî jî hebûn, li piştî avabûna *"Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*"ê, ku bi tevahî xwedî armancên çandî û perwerdehî bû, weşana kovarê bi tevahî ḧewaleyî vê komeleya nuh ya bira bû.

Divê li vir were qeydkirin ku li dû destguherandina kovarê jî, koma nivîskarên kovarê û sernivîskar, ji Komeleya Bilindikirina Kurdîstanê bûn û naveroka weşana kovarê jî, ji aliyê rêveberîya heman komeleyê û nivîskarên ku ji aliyê vê rêveberiyê hatine pejirandin ve, dihat tes-

pîtkirin.

Li alîyekî din, divê neyê jibîrkirin ku, jiber ku lîjneya rêveberîya "Komeleya Bilindikirina Kurdistanê" û ya "*Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*", ji heman kesan pêk dihat, bi aliyê destguherandina kovarê ve di nihêrîna weşana wê de tu guherîn çênebû.[7]

Li gor weşandina belavoka danezanînê ya *Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan*, bernameya vê komeleyê wiha bû:

"*Di avakirina komeleya me de armanc, milletê me yî ku bi xebatên siyasî ve domandina hebûna wî pêkan nedihat dîtin, ber bi pêşerojê ve li ser hîmekî zanyarî, bi her hêlê ve bi jêhatiniyê û hunerên nûjen ve xemilandin e. Mixabin ji vî alî ve, Gelê Kurd di sedsala XX'an de, ku sedsala geşbûnê ye, xwedî rewşeke girînane ye. Di qada têkoşîn û pêşbazîyê ya pêşerojê de, li hember êrîşên ber bi jiyana wî yên kujer, ev gela bi tevahî ji çekên parastinê meḧrûm e.*"[8]

Li gor şert û mercên wê rojê komele, ji aliyê çand û hevotinê ve xwedî bernameyeke têr û tijî bû. Bernameya vê komeleyê ji 20 madeyan pêk dihat. Bi qasî ku ji bernameya komeleyê tê famkirin, armancên komeleyê yên sereke ev bûn:

"*1. Amadekirina ferhengeka Kurdî,*

2. Vekirin û zêdekirina xwendegehên ku perwerdeyê kanibin bi zimanê Kurdî bikin,

3. Çapkirina kitêbên Kurdî yên dersan,

4. Vekirina xwendegehên Huner yên Kurdan û li Kurdîstanê zêdekirina hêjmarên wan,

5. Çapkirin û belavkirina qlasîkên Kurdî,

6. Vekirina Xwendegeheka Mamosteyên Kurdan,

7. Avakirina muzeyeka Kurdan,

8. Ji bo xebatkarên / karkerên Kurdan, damezrandina qoperatîfekê."[9]

Wekî ku tê dîtin komele xwedî armancên girîng e û di nav helwesta amadekirina zemînekî bi bereket de ye. Ji teref komeleyê ve tê xwestin ku gelê Kurd di nav milletên Osmanîyan de, li ciyê nizm rakin, bi her alî ve li ciyekî bilind daynîn.

Ber bi dawîyê ve, digel girtina kovara Jînê, av li ser *Komeleya Weşan û Giştîkirina Perwerdeyê a Kurdan* jî zelal bûye. Di vê pêvajoyê de, derḧeqê komeleyê de çi erênî çi neyînî, tu agahî tune ne. Wisa tê fikirîn ku li ser zêdebûna zext û zordariyên Îngilîzan, vê komeleyê an dawî daye xebatên xwe, an jî li ser sedema weşana kovarê hilgirtina ser xwe, -pêkan e ku dagirkeran zor dabe ḧukûmetê- komele ji aliyê ḧukûmetê ve hatibe girtin; lê tu tiştekî pêbawer yê rasteqîn, a niha di destên me de tune ye.[10]

Belê, ez bawer im ku hûn jî ferq dikin, di derḧeqê Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî de kêmbûna vekolînan li ber çavan e; bi taybetî jî li ser têkiliya wî ya bi pirsgirêka Kurdî re û bi komeleyên Kurdan re… Bêyî ku zêde têkevim nav hûrgulîyan, Xwedê qismet bike ez dê wekî vê komeleyê komeleyên heyama Osmaniyan, ên ku têkiliya Ustêd pê re hebûn, peyderpey bi we bidim naskirin. Ḧeya danasîna komeleyeka din, emanetî Fettaḧê Mîhrîban bin.

(Endnotes)

1 Binihêre: Bedîuzzeman Seîdê Kurdî, "Yedîncî Cînayet" *Îkî Mektebê Musîbetîn Şehadetnamesî Yaxud Dîwan-i Ḧerb-î Urfî we Seîdê Kurdî,* (Weşanger: Kurdîzade Eḧmed Ramîz), Artîn Asadoryan we Maxdumlari Matbaasi'nda tab olûnmûştûr, (Îkîncî baski), Stenbol, 1328.

Ev hevok, di weşanên hin weşanxaneyan de bi awayê "*Ben nasıl ki dindar müteaddit cemiyete bir cihetle mensubum*" derbas dibe; lêbelê kitêba ku di destê me de ye di sala 1328'an de hatiye çapkirin ve bi nîvîsa kevnnabe ye, bi awayê ku me di metnê de nivîsî de ye.

2 Hıdır Göktas, *Kürtler İsyan-Tenkil,* Stenbol, 1991, 25.

3 Uğur Mumcu, *Kürt – İslam Ayaklanması (1919–1925),* Stenbol, 1991, 185.

4 Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî, *Îşaratu'l Îcaz*, (Wergêr: Evdilmecîd Nûrsî), Weşanxaneya Zehrayê, Stenbol, 1999, 320. Bi awayekî berfireh derḧeqê jiyan û kesayeta Ḧemzeyî Muksî de bnr.: Veysel Aydeniz, *Eski Said'in Ehemmiyetli Talebesi Hamza*, Stenbol.

5 İsmail Göldaş, *Kürdistan Teâli Cemiyeti,* Stenbol, 1991, 71.

6 Göldaş, *berhema nav bihurî (b.nb.),* heman rûpel.

7 Zeynep Çamsoy, *Milli Mücadele Dönemi'nde Kürdistan Teâli Cemiyeti (1918–1927),* (Zanîngeha Enqereyê, Enstîtuya Mêjûya Şoreşa Turkan) Teza Mastirê ya Neweşandî, 62–63.

8 Göldaş, *b.nb.,* h. r.

9 Göldaş, *b.nb.,* 72-73.

10 Göldaş, *b.nb.,* 77.

gava tî dibim

Kutbettin YAY

gava ku ro li ber heyvê diçû ava
û stêrkan xwe dida alî
te navbera me dipîvand bi tîrêjên tava xwe
em di ber siya hev de dibûn goristanek ji gorên bênav û bêxwedî
û li ber serê me gulberojek şîn dihat dibû bergor
dibû sî stare
lê her dem berê wê li hîvê bû…

gava ro li ber rûyê te diçû ava
tu li ser pişta hespê xwe yê rewan
çargavî di derbasokên çiyayên asê de dibuhurî,
bi lez û beza derengmayîna serdem û sedsalan
her kanî li ber çavên te dibû xwîneçemekî
û her av di nava destên te de dibû janek

gava sî li ber sîtava te diçûn ava
çiya bi te bilind dibûn û serî li ber te ditewandin
û tu dibûyî kelegerma agirê dilên agirîn
û tu tî dibûyî li ber kaniyek avzelal
tu dibûyî sîdara rahmê li bin asîmanên xezeban

gava ku hemû rê li ber te kin dibûn
tu rê û rê diçûyî, heya bi heya
tu kesî nekarî bide pey te
tu kes bi te nehesiya
û tu kesî te ji bîr nekir
tu bûyî gulavekê di çavên keç û jinên welatê xwe de
û herikî bi sorên xemilî di nav gel û geliyan de

gava ku hemû deng li ber zar û zimanê te lal dibûn
tu dengê çûk û çivîkên girtiyên qefesê bûyî
tu dengê qêrîna qeqlîbazên nav peravê
bi gilî û gazin,
tu dengê bilbilê newaşikestî bûyî
tu dibûyî dengê gulebaranan di nava gulîstanan de
û dîsa dibûyî lorîkekê
di nîvê şeva bêdeng û bêxewîyê de
di ber xwe de distirî
bi zemanekî şerînnewa
bi rûyekî nepenî
bi destekî tilîşikestî…

gava tu li min dinêrî ez tî dibim…
gava ez tî dibim tu li min dinêrî…

GORA BEDÎUZZEMAN LI KU YE?

Aqîl Mihacir

Di nav xwendekarên Rîsale-î Nûr da, pirsgirêka "Ciyê gora Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî", zûdav da ye bi nîqaş e. Hin kes dibêjin "Li Spartayê ye", hin kes dibêjin "Na, birin avêtin Deryaya Spî" û hwd. Lêbelê di vî warî de dilên gelek merivan ne rihet e. Ev mesele her çiqas, bi weşana rojnameyekê hat rojevê jî, ji aliyê me ve tê zanîn ku ev mijareke kevn e û di nav têkildarên Rîsaleyan de belavbûyî ye.

Ev mijara ku heya niha pir caran hatiye nîqaşkirin, îcar bu mijara vê nivîsara me. Em wisa bawer dikin ku, li vir dê ji aliyê me ve mijara ciyê gora Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî bi awayekî eşkere û zelal û bi belge, were şîrovekirin. Di vê nivîsê de em dixwazin agahiyên xwe yên li ser vê meseleyê, bi we xwendevanan ra par ve bikin.

Mîna ku tê zanîn, gor, ji bo mirovan vêsgeha sermedî ye. Kesê mirî, heya roja vejînê wê di vê gorê de be. Seba vê yekê gorîstan, derek watedar, devereke bi rêz e. Ne ti kes destê dide ji bo evan sedeman, ne jî ti kes di wateya neyînî de têkilê dibe. Li ser bîrewerî û xatirê miriyan ji aliyê saxan ve li goran rêz tê girtin, li ser miriyên tê da razayî, Fatîhe tên xwendin.

Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî jî mîna her mirovê demgirêdayî, çaxa ku seeta wefata wî hat, çû cem dilovaniya Xwedê. Berî wefata xwe Ustêd pir caran qala mirina xwe û gora xwe jî kiriye. Di berhemên wî de meriv dikane li gelek cihan rasta qalakirina mirina wî û gora wî werî. Wekmînak di Munazaratê de wexta ku bi telebeyên xwe yên pêşerojê re diaxife, ji wan ra dibêje "*Çaxa we xwest ku hûn werin parzemîna paşerojê,*



seriyekî li gora min xin jî! Çend ji wan diyariyên biharê bi ser şahîdeyê gora min xin ku ev kevir, Kela Wanê ye û dergevanê axa Xorxorê ye ku ji hestiyên me re mazûbaniyê dike!"

Wexta ku Ustad di sirgûnê de bû, em dizanin ku carna qala li Spartayê veşartina xwe kiriye, carna mijara veşartinê / defnbûnê, hewaleyî telebeyên xwe kiriye, lêbelê bi awayekî zelal û eşkere tê zanîn ku li dû 1950yî ji van hemû daxwazên xwe geriya û bi daxwazeke her dem zêde dibû xwest û amadehî kir ku here Rihayê. Tevlî tiştên xwe yên taybet, cî, nivîn, somyeya portatîf û cubbeyê ku ji Mewlana Xalid gîhaştibû destê wî, dişîne wir. Lêbelê ev xwestina wî, hima pêknehat, li dû deh salan şûnda bi çêbû û ne ji bo çend salan, Bedîuzzeman, hew ji bo çend rojên xwe yên dawiyê hat Rihayê. Zatan qasî deh-panzdeh sal bû ku ev bajar, bi awayekî ne fermî, bûbû navenada belavbûna Rîsale-î Nûr. Wiya, wekî şêxên terîqetan li dû xwe xelîfe ne, gencîneya Rîsale-î Nûr hişt û çû

cem dilovaniya Xwedayê xwe.

Ḧezretî Ustad, li hember derbekaran di nav parastina xelkê Rihayê da, li dû çend rojan, di roja 23ê Adara 1960î de êvara şevnimêja Qedrê li otêla "İpek Palas"ê di odeya 27an de, çû dilovaniya Xwedê. Bedena wî li ḧewşa Mizgefta Dergaha Ẍelîlureḧmanê bi destên sed hezaran ve hat veşartin.

Çi li Rihayê, çi li derên din xelkê herêmê ku gelek zeman e ji serok û murşîdên xwe meḧrûm hatibûn hiştin, û xwendekarên Rîsale-î Nûr, her roj, her roj, qefle bi qefle dihatin serdana gora wî.

Piştî derbeya 27ê Gulana 1960î, derbekaran ji vê tewecuh û ḧezkirinê tirsiyan ku biryara neqilkirina gora Bêdîuzzeman standin. Bi navgîniya Cemal Tural vê biryarê ji birayê Ustêd Evdilmecîd Ünlükul re dibêjin ku:

"*Şêniyê başûr û rojhilat ve bi awayekî qaçaẍî têne serdana gora kekê te. Em ê digel we gora wî ji Rihayê bigrin bibin navenda Anatoliyê. Ji kerema xwe vê kaẍidê îmze bikin*."

Li dû van gotinan, her çiqas Evdilmecîd got: "*Tew nebe di gorê de Seyda riḧet bihêlin!*"

Ev gotinên wî tu pere nekirin û daxwaznameya ku li ser navê wî, berê ji teref leşkeran ve hatibû nivîsandin, bi wî dane îmzekirin.

Tîmekî leşkerên derbekaran digel Evdilmecîd 12 Tîrmeha 1960î tên Rihayê. Nîvê wê şevê, gora Ustêd dişkînin (min li mala Kekê Evdilqadir Badilli, perçeyên gora Ustêd dîtin.). Bedena wî ya ter û teze ji vêsgeha wî derdixînin û bi awayekî dizî dibin Spartayê. Cardin, di nîvê şevekê de, li cîyekî ne diyar defn kirin.

Gora Ḧezretî Ustad, nuha, li Spartayê, di nav gorên "*Gorîstana Bajarê Spartayê*" de cî digre. Bi texmîna me, ciyê vê gorê ji aliyê çend "Abê"yan (Kekan) ve tê zanîn.

Li ser neqlkirina bedena Ustêd çend belgeyê nuh derketine holê. Em dixwazin wan belgeyan bi we re parve bikin. Em wisa bawer dikin ku, li weşandina ev belgeyan, niva wê dawiya pirsên wekî "*bedena Ustêd çi bû?*" û *"Bedena wî birin ku?"* were.

Ev belgeyên ku di vê nivîsê de nîşanî we bidim sê heb in. Yek, kupura rojnameya "Vatandaş"ê ya wê demê ye, yek "girte"ya ku li Rihayê hatiye tenzîm kirin e, yek jî "girte"ya ku li Spartayê hatiye tenzîm kirin e.

1. Di kupura nusxeya 18 Tebaxa 1960î a Rojnameya "Vatandaş"ê de ku li Dinarê derdiket û xwe "*Tarafsız Politika-Olay-Fikir Gazetesi*" nîşan dida, derbarê neqilbûna gora Ustêd da wiha dihat nivîsandin:

"*Said-î Nursî'nin Gömülü Olduğu Yer Sivil Polislerin Kontrolu Altında, Nurcu başı Saidi Nursî'nin cesedî, Nursî'nin Konya İmam Hatip Okulundakî kardeşi tarafından verilen dilekçeyle geçen ay Urfada gömülü bulunduğu mahalden alınarak uçakla Afyona getirilmişti. İnanılır kaynaklardan öğrendiğimize göre Saidi Nursî'nin cesedini havî uçak Afyon'a geldiğinde etrafta alınan sıkı emn ... sî'nin kurşunlu t... etmişlerdir. Halen İspart... defnedilmiş olan ... ...nin cesedinin gö... yeminli bir kaç ...kası bilememeker... ...şının gömülü b... ...kul yer gece g... polis tarafından ... tutulmaktadır.*"

2. Metna "Girte"ya ku li Rihayê Hatiye Amadekirin Wiha ye:

"*Zabıt Varakası,*

Konya İmam Hatip Okulu Fahri Arabi hocası Abdülmecit Ünlükul'un Urfa'da medfun kardeşi Saidinursi'nin cesedini naklikubur suretiyle Emirdağ veya İsparta'ya nakline müsaade olunmasına dair 4/Temmuz/1960 tarihli dilekçesi ve Belediye Tabibliğinin naklin bir mahzur teşkil etmiyeceği yolundaki 11/Temmuz/1960 tarihli raporu üzerine 12/Temmuz/1960 Salı günü sabahleyin adı geçen mevtanın medfun bulunduğu MEVLÜT HALİL dergahına gelinerek kardeşi Abdülmecid ÜNLÜKUL'un huzurunda kabir açılarak mevta çıkarılmış ve Hıfzısıhha Kanununun 230 uncu maddesine göre Sağlık Bakanlığınca hazırlanmış bulunan Talimatnamenin

tarifatı dairesinde ve fennî bir şekilde tabutlanmış ve tabut mühürlenerek kardeşi ABDÜLMECİT ÜNLÜKUL'a teslim edilmiş olmakla işbu zabıt varakası birlikte tanzim ve imza edilmiştir.

Belediye Tab. Hikmet Öner (îmze), *Sağlık Müd. Celal Ada* (îmze), *Emniyet Müd. Şükrü Palaz* (îmze), *Merkez Kumandanı 8v.Kd.Yb. Ferudun Türk* (îmze), *Vilayet J. Komandanı Yb. Mustafa Günenç* (îmze), *Hazirun Meytanın kardeşi Abdülmecit Ünlükul* (îmze)."

3. Metna "Girte" ya ku li Spartayê Hatiye Amadekirin Wiha ye:

"(*Zabıt Varakası)*

Konya İmam Hatip Okulu Fahri Arabi hocası Abdülmecit Ünlükul'un Urfa'da medfun kardeşi Saidi Nursi 'nin cesedini nakli kubur suretiyle İsparta'ya nakline müsaade olunmasına dair 4/ Temmuz/1960 tarihli dilekçesi üzerine işbu talebi is'af edilerek 12/Temmuz/1960 günü Afyon'a getirilmiş bulunan mevtaya ait tabut Afyon'dan teslim alınarak İsparta'ya getirilmiş ve aynı gün akşamı kardeşi Abdülmecit Ünlükul'da hazır bulunduğu halde aşağıda imzaları bulunan şahıslar huzurunda İsparta Şehir mezarlığında ihzar edilmiş bulunan kabre defn edildiğine dair işbu zabıt mahallinde tanzim ve hep birlikte imza altına alındı.

12/7/1960

İsparta Vali Muavini Besim Ulcay (îmze), *Emniyet Müdürü Zeki Vural* (îmze), *Vilayet Jandarma K. Zekerya Kantekin* (îmze), *Merkez Kumandanı Yarbay Atamer Hamdi* (îmze), *Merkez Hükümet ve Belediye Tabibi M. Rifat Öner* (îmze), *Mevtanın kardeşi Abdülmecit Ünlükul* (îmze)."

Di vî warî de îddîayeke Mustafa Armağan, bala me dikişîne. Çiqas rast e çi qas xelet e, nayê zanîn, lê wisa dixuye ku, mihtacî teyîdê ye; ew jî ev e:

"*Gora yekem, li Ruhayê bû; derbekeran li wir*

Vatandaş

(DİNAR'da ÇIKAR. HAFTALIK)

TARAFSIZ POLİTİKA-OLAY-FİKİR GAZETESİ

SAİD-Î NURSÎ'NİN

Gömülü Olduğu Yer Sivil Polislerin Kontrolu Altında

18 Ağustos 1960

Sayı 5

Yıl : 1

FİATI

Pêvek 1: Kupura nusxeya rojnameya "Vatandaş"ê:

rakirin li Spartayê veşartin. Vê derê jî ku dest bi naskirinê kir, di 1967an de ji vir hat derxistin û li "Gundê Saw"ê hate veşartin. Kînga ku hêjmara yên ku ji bo serdanê hatin û çûn, zêde bû, neqlî gora îroj, ya çarem bû. ..."

Di dawiya nivîsê de divê vê gotinê jî qeyd bikim. Nivîskarê rojnameya "Takvim"ê Bülent Erdanç, dibêje ku:

"*Mirovekî felsefekar yekî giranbuha dinirxîne ku 'cîyê gorê ez dizanim; wekî razekê, ez vêya eşkere nakim; lê dewlet dizane û helbet wê rojekê eşkere bike.*"

Heman nivîskar, di nivîsa xwe de tiştekî wuha jî dinivîse:

"Bedena wî ya ku di 11 Tîrmeha 1960î de hat derxistin, pêşiyê neqlî Efyonê, dû ra jî neqlî Spartayê bû û li Gorîstana Bajêr ya Spartayê hat veşartin.

Lêbelê ne li vir e. Li cîyekî ku bi dizî tê girtin, ez wisa difikirim ku li pişta wan çiyên hember e."

Belê, li Spartayêbûna Gora Ustêd niva bê şek û bê guman e. Arşîvên Leşkerîyê û yên ewlekariyê jî hatin vekirîn. Ji alîyê gel ve, li rayedar û desthilatdaran tê payîn û hêvîkirin ku, bila gora wî raste rast were eşkerekirin û bedena wî, niva li dû ev qas ẍurbetîyê şûnda bila bê anina vêsgeha wî ya sermedî...

Pêvek 2:



Belge No:13311/22/32

Zabıt varakası

Konya İmam Hatip Okulu Fahri Arabi hocası Abdulmecit Ünlükul'un Urfa'da medfun kardeşi Saidinursi'nin cesedini naklikubur suretile Emirdağ veya Isparta'ya nakline müsaade olunmasına dair 4/Temmuz/1960 tarihli dilekçesi ve Belediye Tabipliğinin naklin bir mahzur teşkil etmiyedeği yolundaki 11/Temmuz/1960 tarihli raporu üzerine 12/Temmuz/1960 salı günü sabahleyin adı geçen mevtanın medfun bulunduğu MEVLÜT HALİL dergahına gelinerek kardeşi Abdülmecit ÜNLÜKUL'un huzurunda kabir açılarak mevtanın çıkarılmış ve Hıfsızsıhha Kanununun 230 uncu maddesine göre Sağlık Bakanlığınca hazırlanmış bulunan Talimatnamenin tarifatı dairesinde ve fennî şekilde tabutlanmış ve tabut mühürlenerek kardeşi ABDULMECİT ÜNLÜKUL'a teslim edilmiş olmakla işbu zabıt varakası birlikte tanzim ve imza edildi.

Belediye Tbb. Hikmet Öner — Sağlık Müd. Celal Ada — Emniyet Müd. Şükrü Palan

Merkez Kumandanı Sv.Kd.Yb. Ferudun Eştürk — Vilayet J.Kumandanı Yb. Mustafa Gönenç — Hazırun Mevtanın kardeşi Abdülmecit Ünlükul

Pêvek 3:



(Zabıt varakası)

Konya İmam Hatip Okulu Fahri Arabi hocası Abdulmecit Ünlükul'un Urfa'da metfun kardeşi Saidi Nursi 'nin cesedini nakli kubur suretiyle Isparta'ya defnine müsaade olunmasına dair 4/Temmuz/1960 tarihli dilekçesi uzerine işbu talebi is'af edilerek 12/Temmuz/1960 günü Afyon'a getirilmiş bulunan mevtaya ait tabut Afyon'dan teslim alınarak Isparta'ya getirilmiş ve aynı gun akşamı kardeşi Abdulmecit Ünlükul'da hazır bulunduğu halde aşağıda imzaları bulunan şahıslar huzurunda Isparta Şehir mezarlığında ihzar edilmiş bulunan kabre defn edildiğine dair işbu zabıt mahallinde tanzim ve hep birlikte imza altına alındı.

12/7/1960

Isparta Vâli Muavini Bedim Ulcay — Emniyet Müdürü Zeki Vural — Vilâyet Jandarma K. Zekeriya Kantekin

Merkez Kumandanı Yarbay Atamer Hamdi — Merkez Hukûmet ve Belediye tabibi BB.Rifat Öner — Mevtanın kardeşi Abdulmecit Ünlükul

Çavkanî:

1. Nusxeya 22. 06. 2006î a Rojnameya Hürriyetê.

2. Nusxeya 18. 08. 1960î a Rojnameya Vatandaşê.

3. http://www.risale-inur.org/yenisite/moduller/haber/index.php?sid=834, Lê nihêrîn: 18. 05. 2012.

4. http://www.facebook.com/#!/mufid.yuksel, Lê nihêrîn: 18. 05. 2012

5. M. Armağan, "Bediüzzaman'ın naşı denize mi atıldı?" *Zaman*, 08. 05. 2011.

6. Derḧeqê îddîaya avêtina Deryayê de bnr.: Soner Yalçın, *Efendi-2*", r.395.

7. Bülent Erandaç, "Saidi Nursi'nin Mezarı ve Barla", *Takvim*, 16.06.2012.

GUNDIYÊN KEDKAR

Mihemed Sidîq CANDAN

Demsal bihar bû. Berf û cemeda ku xweza weke marê zivistanê tevizandibû, hêdî hêdî xwe ji serê lat û zinaran berdida û diheliya. Kirasê zivistanê yê spî peritîbû, weke candarekî li ber mirinê, di nav dest û piyê sirûştê de diperpitî. Li aliyekî tîrêjên rojê û perengê agir (cemre) li hember wê bibûne yek û li aliyê din jî arzebayên biharê ên ku dor ji bager û bapêçên zivistanê girtibûn raselitîbûn serê wê. Xule xula avên belekiyan, mîna notayên mûzîkeke lihevhatî demsala nû silav dikirin. Gulberfîn, beybûn, binevş, nêrgiz û yên dinê hawirdor mîna buka salê xemilandibûn. Çûk û reşêleyên ku çûbûne beriyê ango deverên germ careke din vegeryabûn warê xwe. Bayên ‘ewrhilgir û avisker, bi comerdî bi ser sirûştê de dihatin. ‘Ewrên ji hev perçebûyî bi awakî aştiyane dianîn bal hev, vê lihevkirinê jî berên xwe weke baranê bi ser ‘erdê de dibarand. Baranê ew ‘erda ku mirovan bi kiryarên xwe yên xerab qirêjkiribûn bi hêsrên çavên xwe dişûşt. ‘Erdê piyar û rehmdar. ‘Erdê sitargeh. ‘Erdê ku yên zindî li ser xwe radigirt û yên mirî di nav xwe de vedişart. ‘Erdê comerd, çawa mezinekî di derbarê wê de gotiye, ya ku mirovan hemû gemarî û xerabiyên xwe didanê û wê jî di hember wan de hemû tiştên qenc, xweşî û rindayî dida wan.

Gundî bi hesret li benda hatina biharê mabûn. Lewra wan fikar dikirin, gelo ew êm û alifên ku ji bo pez û dewarên xwe re amade kiribûn wê têrê bikira, an na? Wê zivistanê berf jî zêde hatibû, anîna ka û gihê ji deverne din jî ne tiştekî hêsan bû. Ev fikarên wan jî vala nebûn. Ji ber ku jiyan û debara wan girêdayî bi ya ajalên wan ve bû. Herêma Serhedê di dîrokê de gelek salên dijwar derbas kiribûn. Heta çawa ku mezinan digotin, salekê dîsa zivistan çetin derbas bûye û dirêj kiriye, gelek pez dewarên şêniyên heremê qir bûne. Ev bûyer di navbera Wan û Agirî’ yê de di qadeke

fireh de bibandor bûye. Hê niha jî gelê heremê gava qala salên borî dikin, dibêjin sala qirê... Ango peyva ‘qir’ ê bûye mîna navekî taybet ji bona wê salê. Tê gotin ku ew, sala 1956’an e.

Zarokên ku zivistan weke astengekî derdikete pêşiya wan, gelek rojan nedihîşt ew biçine dibistanan, neçar diman ku wê xemgîniya xwe bi çend lîstikên berfê derman bikin. Lewra zivistanê pê wan xistibûne zikên wan, ew kiribûn mîna kewên di nav rikewan de û gelek lîstikên wan ji destên wan girtibûn. Êdî gava ew ji xaniyan derdiketin, mîna ku bi demê re ketibine nava pêşbirkekê êdî dixwestin lîstikên xwe bi carekê de biqedînin. Carna dibûne di koma gog, kêl an bir dilîstin, carna jî çavgirtonek dilîstin. Li alîkî lîstikên xwe dilîstin li aliyê din jî di karên wan de alîkariya dê û bavên xwe dikirin. Lewra ew bişkûrî bûn, diviyabû ku hêdî hêdî fêrî rê û rêbazên jiyanê bûna. Lewra ew, zarokên şaristaniyeke ku digot : ‘’destê nexebite li ser zikê birçî ye’’ bûn. Herwiha ji ol û baweriyeke ku xebata wan a fihêl/helal weke perestîş dinirxîne dihatin.

Qîz û bûkên herêmê bi cil û bergên xwe yên rengîn çiya û banî dineqişandin. Ew jî bi hatina biharê re, ji bo berhevkirina pincara teze berê xwe didan çol û

newalan. Tirşo, mendik, hêliz, catir, pûng û sîrim... Hinek ji wan pincaran tevî toraq û penêrê ku zexîra zivistanê ya sereke ye dikirin, hinek ji wan jî di şoravê de dihîştin zivistanê tirşîna wan dixwarin û hinek jî tevî xwarinên xwe ên rojane dikirin. Jixwe xweşikî û bedewiya jiyana gundan jî bi van tiştan bû. Ango ji şîr û mast û hêkan bigire heta rûn û penêrên wan, xwarinên wan tev ji hêmanên kîmyewî hatibûn parastin û di encama keda destên wan de dihatine amadekirin. Mêrg û zeviyên xwe jî bi zibil/gubreyên kîmyewî zibilnedikirin. Zeviyên xwe baş cot dikirin, tov didane bayê paqij dikirin, berecotekî çiqas bixwesta ewqas tov lê direşandin. Gava dema avdêriyê nêzîk dibû, cew û delavên mêrg û zeviyên xwe û alavên pêwîst amade dikirin. Bi gotineke din; wan mafê ‘erdê didanê û ‘erdê jî bi comerdî berdêlka keda wan dida.

Şivan, gavan, golikvan û berxvanan, di nav rêzkariyeke mezin de li heywanên di ber xwe de xwedî derdiketin. Miyên doşanî nîvro dihatin dana, kebaniyên malan ew didotin, lê têra berxên wan şîr dihiştin. Paşê berx berdidan ber miyan ango dikirin berodan, kalekala berx û miyan li hawirdor olan dida. Berx demekê ber makên xwe diman, dûre pez kîs dikirin.(Berx û mî ji hev vediqetandin.) Pezên nêr û yên stewr şevê li çolê diman, şivan bi dor radizan, şevê carekê pez radikirin şevînê. Şivanên pezê nêr û yên stewr, dudu sisê, carna li gorî hejmara pêz zêde jî dibûn. Wê demê yek ji wan dibû serşivan. Berpirsiyariya serşivan ji hevalên wî zêdetir bû û wî ew bi rê dibirin. Heftê carekê şivanek dihat gund pêdivî bi çi hebûya dibir. Li çolê gelek tiştên ku di şikeva malekê de hebûn, li cem wan jî hebûn. Kî ji karê aşpêjiyê baş fam dikir wî xwarin amade dikir. Goşt, birinc, savar, nîsk, şîr û qatix... Dilê wan çi bixwesta ji xwe re çêdikirin. Carna li ser agir karî dipatin, ên ku ew dixwarin tama goştê berxan ji bîr dikirin.

Belê şivantî karekî pîroz e, dilovaniyê fêrî mirov dike. Ê ku nekaribe heywanan li rê bibe ew nikare insanan li rê bibe, loma jî mirovên xwediyê cî û cîgehên herî bilind ku pêxember in tevan şivantî kirine. Ê ma şivan bê bilûr dibû? Çawa ku derwêş bê ‘elbane nedibû. Serê wan çilû çiyan wê derd û kulên dinê ji keviran re bigotana. Ma dibe, ji ber ku şivan bûn mafê wan tunebû ku ji yekî hez bikin an jî di serê wan de bûyerek derbas nebe. Êdî bilûr hevpara wan a kul û derdan bû. Wan nêzîkî ‘ewran, li asoyên bilind, bi sirûştê re rû bi rû, bi dilekî azad li bilûrê dixistin, deşt û newalan jî li wan vedigerandin. Bilûr tenê bi qasî dirêjaya xwe ji wan dûr bû. Gava dilên wan tijî dibûn mîna sîtilekî dikeliyan û kul û derdan di sertilîkên wan de didan der.

Malbatên xwedî bişkûrî derdiketin zozanan. Avên sar, çêrên xweş, hewa paqij... Bi hemû aliyên xwe zozan hêjayê çûyinê bûn. Konê xwe li ciyekî lêhatî û nêzîkî avê datanîn. Demsala havîna germ li zozanên hênik derbas dikirin. Heywanên xwe baş diçêrandin, zexîra xwe hildidan. Lê gava dema gihadirûn û nandirûnê nêzîk dibû neçar diman ku ji zozanan dagerin. Hinekan hê di payîzê de û yên mayîn jî di biharê de tov radestî axê kiribûn û bi sebir li hêviya para xwe mabûn. Çandinî karekî ne pir hêsan e. Lewra him dema tov reşandinê him jî dema dirûnê pêwîstbû paşde neketa. Livdarîke mezin dest pê kiribû. Gundî ji bo peydakirina alavên pêwîst weke das, kêlendî, tirmix û şeneyan dixebitîn. Ewên ku palên wan yên xumal tunebûn siwar-peya li pala digeriyan. Wek îro alavên çandiniyê yên nûjen tunebûn, hebûna jî bikaranîna wan li gelek deran ne pêkan bû, ne rê û ne jî dirb hebûn. Te ji dermanan re bigeriya di nav gundan de mêrek nedidît. Ji xwe gund cihê tiraliyê nebûn. Ew di bihara Xwedê de weke morîstangan li rûyê ‘erdê belav dibûn, ji bo zimhêr û zexîreya xwe ya zivistanê amade bikin. Ber gihîştibûn bênderan, berê ewil malê Xwedê ji nav derdixistin. Ango zekat û para xizanan didan, dûre zimhêrê xwe, tovê sala were hildidan, çi zêde dima an difirotin anjî dixistin çalan, ser dinixumandin heta biharê.

Şivan û gavanên ku li serê wan çol û çiyan di nav kulavên şivanî de serê xwe didanîn ser keviran radizan, êdî hatibûn malên xwe. Wan piştî ewqas zor û zehmetî çend heb kar û berx bi dest xistibûn, ew tevî zar û zêçên xwe pêre şadibûn. Lê jiyan berdewam bû. Wan dizanibûn ku tenê bi xebata çend mehên biharê ne pêkan e ku debara xwe bikin. Ji ber vê yekê wan li alîkî haziriyên zivistanê didîtin li aliyê din jî xwe ji bo rêncberiya zivistanê amade dikirin, lewra wan nikaribûn tiraliyê jî daynin ser barê xizaniyê.

Helqeyeke Zêrîn Jı Edebıyata Tesewifî “Dîwana Mewlana Xalid” (II)

Abdulcebbar KAVAK

BEŞA YEKEMÎN
(Malikên Farisî)

(6)

غلام قد خود سازد همه ازآد سروانرا
دهد شمشادرا از لاف رعنای پشیمانی

Xulâm-i qedd-i xod sâzed heme âzad-i serviyan râ
Dihed şimşâd ra ez lâf-ı re’nâyi peşîmânî

Wateya malikê:
Hemu (darên) serwiyan bejn û bala xwe re kole dike.
Jiber ku (dara) şimşadê îdîaya bedewtiya xwe kiriye (wê jî) poşman dike.

(7)

کند آکنده از رشك رخش گلرا بخون دل
کند شرمنده طاوس چمن را از خرامانی

Koned âkende ez reşk-i rûxeş gulrâ be xûn-i dil
Koned şermende Tâvus-i çemenrâ ez xirâmânî

Wateya malikê:
Ji(ber ku) hesûdiya rûyê wî (yê cindî dike) nava gulê tijî xwîn dike.
Tawisa çimenê re (jî) bi sedeama rêveçûna wê ya nazik dide şermê.

(8)

شود روشن بدیدار شریفش دیدهٔ نرکس
دهد از پای بوسش سنبل تر پریشانی

Şeved rûşen bedîdâr-i şerîfeş dîde-i nergiz
Rahed ez pây-i bûseş sunbul-i ter ez perîşânî

Wateya malikê:
Çavê nergîz bi rûyê wî yê rûmetdar ronî dibe.
Simbila teze bi ramûsandina piyê wî ji pejmurdetiyê xilas dibe.

(9)

بوجه داوری در عزم کشت گلستان امروز
کند گلزار را غیرت فزای باغ رضوانی

Be vech-i dâverî der ‘ezm-i keşt-i gulistan imrûz
Koned gulzâri râ xeyretfezâyi bâx-ı rıdvânî

Wateya malikê:
Îro bi terzekê hakimane biryardana wî ji bo geryanê di (nav) bexçê de,
(wê) bexçê datîne li hemberî hesûdiya bexçê cennetê.

(10)

که هست اندر نزاکت سخت بنیاد جدل محکم
ز نو زادان بستانی چو خوبان شبستانی

Ki hest ender nezâket sext-i bunyâd-i cedel muhkem
Zi nevzâdânî bostânî çû xûbân-i şebistânî

Wateya malikê:

Lewra bingeha hemberî kirinê li ser nezaketê zehf qehîm e.
Ev hemberî kirin ji fîdanên bexçeyê digre heta bedewên xaniya haremê re diçe.

(11)

ز یکسو دلبران هر هفت کرده برقع افکنده
همه هستند رشك خامهٔ صورتگر مانی

Zi yeksû dilberân herheft kerde burqu' efkende
Heme hestend reşk-i xâme-i sûretger "Mânî"

Wateya malikê:
Ji aliyek dilberan(bi heft tiştan) xwe xemilandine û poşiyên ser rûyên xwe rakirine.(Bi sedema vê xemilandinê) pênusa resam(ê navdar) Manî[1] hesûdiya wan (bedewan) dikir.

(12)

ز دیگر سو بد انسان شد گلستان خرم و خندان
نباشد حاصل تحریر وصفش غیر حیرانی

Zi dîgersû bedânsân şod gulistan xurrem û xendân
Nebâşed hâsıl tehrîr-i vesfeş xeyr-u heyrânî

Wateya malikê:
Li aliyek din bexçe wisa bi keyf û bi ken(vebûye û şîn) bûye,
xeynê heyraniyê vegotina wesfê wê ne mimkûn e.

(13)

بکلك صنعت آرا منشیِ قدرت بدیعیها
نویشته بر حواشیَ چمن از خط ریحانی

Be kilki sen'etârâ munşî-i Qudret bedî'îhâ
Nuvişte ber hevâşiy-yi çemen ez xett-i reyhânî

Wateya malikê:
Xaliqê qudret, bi qelema ku sen'et dixemilîne, bi nivîsa (ku jê re tê gotin) reyhanî derdora çimenê xariqayan nivîsiye.

(14)

بنفشه میزند با خال جانان لاف همرنگی
گلی شبنم زده چون در با رویش خوی افشانی

Benefşe mîzened bâ xâl-i cânân lâf-i hemerengî
Gul-i şebnemzede çûn durr bâ rûyeş xûy-i efşânî

Wateya malikê:
Binefş, digel xalê canan iddiaya hemrengî dike. Gula ku **çiq**a wek durr ketiye ser (jî) wek xwêdana rûyê canan iddiaya xwêdanê dike.

(15)

کند راز دهن را غنچه فاش آهسته آهسته
بدیده میکند نرکس اشارتهای پنهانی

Koned râzi dehen râ xunçe fâş âheste âheste
Be dîde mîkoned nergiz işârethâyi pinhânî

Wateya malikê:
Gulpik sıra di devê xwe de hedî hedî eşkere dike. Nergîz (jî) bi çavên xwe bi dizî işaretan dike.)

Ferhengok:
Xulâm: Kole
Qedd-i xod: Bejna xwe
Serv : Dara serwê
Şimşâd: Dara şimşadê
Lâf-ı re'nâyi: Îdîakirina bedewtiyê
Koned âkende: Tijî dike
Reşk: Hesûdî
Koned şermende: Dide şermê
Xirâmân: Bi naz
Rûşen: Bide
Dîde: ji min
Bûse: Şahê bedewan
Dâverî: Hakimî, hukm kirin
Keşt: Geryan
İmrûz: Îro
Xeyret: Hesûdî
Bâx-ı rıdvân: Cenet
Bunyâd: Bingeh
Muhkem: Qehîm
Nevzâdân: Fîdanan
Xûbân: Bedewan
Şebistân: Xaniya haremê
Yeksû: Aliyek
Herheft kerde: Xemilîne
Burqu': Poşî
Xâme: Pênus
Sûretger: Resam
Diğer sû: Li aliyek din
Xurrem: Bi keyf
Xendân: Bi ken
Tehrîr-i vesfeş: Vegotina wesfê wê
Be kilki: Bi qelema
Sen'etârâ: Sen'et dixemilîne
Hevâşiy-yi çemen: Derdora çimenê
Benefşe: Binefş
Lâf-i hemerengî: İddiaya hemrengî
Xûy-i efşânî: İddiaya xwêdanê
Râz: Sır
Xunçe: Gulpik
Âheste âheste: Hedî hedî
pinhânî : Bi dizî

1 Mani, ressamekî bi nav û deng e. Di Sedsala seyemîn a pişti zayinê de jiya ye. Digel ressamiya xwe, wek sazkerê Maniheizmê jî tê zanîn.

Pênc gav

Abdulkerim YILDIZ

Çend hezar rêwî û gotin e
Di riya hanê de hatine û çûne
Ez ê jî bêjim û herim
Ev rê ji min re jî namîne

Bi navê Ellah me îroj vekir deriyê zêhnê
Tê qewî kirin bi zanîn
Lê hewce nîne ji bo bawerkirinê
‘ilim û ‘îrfan û xwendin
Em bawer in, nîne îlah bi tenê Xwedê ye Ellah
Em bawer in Qasid yê delal e û xweş delal

Bi navê rehman me îroj vekir deriyê xewê
Melek ji şeytên re dipeyve û dibêje
Dûde îblîs ez ê deyn lê bikim
‘ehda wî heye bi Rehman re
Dûde îblîs disincire sobe dûde îblîs
Ya Ellaaah rabe bangê te dike Ellah

Roj duqulibe em nagihêjinê
Bêçek bêwar bêtine em ketine pey
Derî li ser me tê girtin
tarîtî xwe li me vedike
Di şevereşê de hîv pêwistiya xwe kifşe dike
Bêçek bêwar bêtine hema hemî şev em radizên

Şev diteyîse em nabînin
Di tarîtiya wê de xêr tê belavkirin
Em nabînin
Yên ku em nabînin
Çivîk û kûçik û kulîlk û zerreyê misqal dibînin
şev me di şevereşê de hiştiye
em nabînin

Bi navê Xeffar me îroj girt deriyê peyvên pûç
Me xwe, melekan jî şeytan girêdan
Xeffar deriyê xwe vekir yê Reyyan
Bangê me dikir
Digot werin yek bi hefsed hezaran
Yên devê xwe girtine û dile xwe vekirine
Ji bo we bê hed û bê hisab e ne bi hejmar e.

Xeberdan didin ser xeberdan
Yek ji vir dibêjin yek ji wir
Ne ev pêwist e ne ew lazim e
Dev lê hatiye girtin ne av û ne xwarin
Lê bêhna xwînê tê li devan
Xeberdan didin ser xeberdan

Bi navê Rezzaq me îroj vekir deryê rizqê
Me mal da maldarê maldaran bi deynî
Heta salewextê roja civatê
Me temenê xwe dirêj, mal û malbata xwe carî kir
Me kêm kir Wî bê hed bê hisab zêde kir

Bi navê Wî dest pê dikin mal û mertal berhev dikin
Heqê Rezzaq bi ro de diçe û êdî kes pey nakeve
Mal û maldarî dibin mertal, mertal dibe agir
Şer û herb tê kirin
Ji yên navber dixin navbeyna Rehman û Rezzaq
Wê dax daxî bikin bi mal û mertal.

Tu gazî bike, metirse got Xwedê
Ezê bigîhînim cumle zerratan, zarê nava zikan
Kundê şevan, kerr û lalan, kulilkên bê kumikan
Bi navê Wî gazî kir Îbrahîm
Bi her alî ve deng bilind bûn
Lebeyke Ellahûmme lebeyk

Bi navê Rehîm me îroj dada deriyê dinê
Me kefenên saxan li xwe kir û xwe aland
Em çûne ser kaniya zimzimê
me zehmet da bi rehmet
Em ketin baxê bihûştê

Çend hezar rêwî û gotin e
Di riya hanê de hatine û çûne
Ez ê jî bêjim û herim
Ev rê ji min re jî namîne

PÎVANÊN JIYANÊ

Umer Umîd

Axaftin

Her agahiyên ku tu zanî, her demê mebêje! Kînga ku li te hat pirsîn bibêje.

Bîne bîra xwe ku, divê tu her dem rastiyê bibêjî, lê mafê te tune ku her rastiyê tu bibêjî.

Bikaranîna Çavkaniyan

Bê çavkanî tevgerîn bi pirsgirêk e, îlahîm çavkanî, îlahim çavkanî… Li aliyekî di girîngiya pirbûna çavkaniyên te tune ye; ji aliyê te ve bi qasî bikaranîna wan çavkaniyan girîngiya wan heye.

Combûna/Noqbûna Keştiyan

Tê gotin ku li ser deryayê noqbûna/combûna keştiyan, bi piranî ne di ruyê deryayan de, di rûyê mirovan de ne.

Ji xeletiyên rê û rêbazan, komên mirovan hilnaweşin; lêbelê ji rûyên xeletiyên kesan de gelek kom hildiweşin.

Çêyî kirin

Xerabiyên ku te li te hatine kirin, bila tu carî ji çêyîkirinên te re nebin asteng.

Dema Zêrîn

Dema rast hew ev dema ye. Hemû afirandin, hemû mirin, hemû veguhêrîn, hemû vejîn di dema niha de nin. Hemû hebûn di hundir vê demê de ne. Hebûn hemû li vê demê hiltên. Xeleka zêrîn ya demê ev e. Bike ku tu heya dikanî ji vê demê sûdê werbigrî!

Dereceya Êşê

Li hember bûyerekê dereceya êşa ku em ḧis dikin, li gor dereceya qîmetdayîna me ya wê ye.

Derew

Derew wesfê şeytên e. Heke li ciyekî derew tên bihîstîn, pirr hindik lêbelê bê guman ew der, di bin qontrola şeytên de ye.

Tiştekî din, heke tu her dem rastiyê bibêjî, bawer bike, tu mecbûrî derewan nabî. Lewra derew, ji hin derewên din re zemîn çêdikin û rê vedikin.

Tê gotin ya "*Çira derewkaran ḧeya eşayê ye!*" Lê tu yê kê bixapînî? Ujdanê xwe, an nefsa xwe an ferîşteyên li ser gurmikên xwe? Kîjanî?

Temenê derewan ḧeya xuyabûna rastan e.

Destpêkirin

Ji bo destpêkirina ẍizmeteka xêrê, gihaştîbûn yan jî bimirêsbûna te ne şert e; lê ji bo ku tu bigihêjî û him li jêr him jî li jor bi navû deng bî, divê tu ewilî dest pê bikî!

Dilên Mezin

Li gor dilên mezin, yên li dûr jî her dem nêzik in. Ji bo vê yekê hatiye gotin ku: "*Yekî me li rojhilat, yekî me li rojava, yekî me li paşerojê, yekî me li pêşerojê, yekî me li cîhanê yekî me li axretê be jî em her dem bi hevdu re ne!*"

Diyarî

Diyarî, dilan li hev xweş dike, yartiyê çêdike, neyartiyê ji holê radike. Divê meriv bi diyariyan dilên hev xweş bike, tew nebe bi silaveke germ an jî bi sifetekî rûken bi hev re têkildar be.

Edeb

Di aboriyê de zêdebûna malan buhayê wan dadixîne; lê ji bo edebê a rast li dijî vê zagonê ye: Edeb heya ku li hev tê parkirin buhayê xwe zêde dibe.

Efûkirin/Borandin

Bawer bikin, efûkirina dijminekî ji ya hevalekî hêsantir e. Ji ber ku te ji neyêr her dem neyartî dipa, lê ji hevêl tu carî! Lê ez dibêjim car dn jî nehlê li şeytên bîne û hevalên jidil biborîne; li vê cîhanê kirina çewtiyan pêkan e!

Fehmkar

Salnî hene ku meriv rastî yekî ku merivan fehm bike nayê! Gelek sal in ku em jî rastî yekî ku raya me, ramana me, dilîna me, axîna me, hêviya me û temenniya me fehm bike, nayên!

Divê di van mercan de mîna Mewlana wiha bibêje: "*Yê ku bi min dizane yek ez im yek jî Aferîndêr; pêdiviya min yek bi min heye yek jî bi yêkî ji min fehmdike.*"

Fêrbûn û Hizirîn

Fêrbûna bê hizirîn heke topal be, hizirîna bê agahî jî qol e.

Gav û Rê

Divê meriv, di gavavêtinên xwe de baldar be. Meriv, li gor dirêjiya çîpên xwe gavan diavêje; û divê di demên rêzê de jî wisa bimeşe.

Bi tevlî vê jî kînga ku rastî kendalekê yan jî qelîşeka fireh hat, divê gavên mezin biavêje; lewra bi gavên biçûk, kendal nayên derbaskirin.

***

Heke meriv di riyekê de dimeşe, bila bizanibe ku li ser wê riyê îlahîm zor û asteng henin û divê amadeyî têkoşîna bi wan zor û astengan ra be.

Îcar, heke riya ku meriv tê de ye, pirr xweş û tevhev bê asteng be, bi gumaneke mezin, merivan nagihijîne armancan wan.

Girêka Benê Qetyayî

Tespîteke çiqas li cî ye: "*Heke meriv girêkeka zexm bavêje benekî qetyayî, niva ciyê tewrî saxlem ew der e. Lê her ku destê mirov bi wî werisî bibe, hew ew ciya wê destê wî biêşîne!*"

Girîngiya Navê Merivan

Ji boksorê navdar Mihemmed Elî xwestine ku navê wî jî li ser kolana navdaran bineqşînin. Wî ev pêşniyar nepejirandiye û bersiveke wiha daye wan:

"*Min navê pêxemberê xwe li xwe kiriye; ez tu destûrî nadim ku xelk were pêla wî navî ke!*"

Hebûna Aql û Dil

Îlla aqil îlla aqil. Heke aqlê te nîn be tu şewitîyî; lê tew ku dilê te tune be, mîna ku Mewlana gotiye "*Wê çaxê tu tew tune yî.*"

Hewcedar

Em hewcedarê te ne! Di vê tengasiyê de wisa bi awayekî xwe bigihîne me ku, em tu caran ji te negerin!

Hêrs Derxistin

Hêrsa xwe di serê hevalên xwe de dermexe, bi serê nefsê û şeytên û hevalên şeytên de derxe!

"Kal" û "Kelîn"

Nizanim çi têkiliya bêjeya "kal"ê bi kelandinê ve heye; lêbelê ez wisa difikirim ku merivên bi agahî û ceribandinên xwe ve xwe dikelînin û dikemilînin, liyaqî bi bêjeya "Bavê kal" wesfandinê ne; ne yên ku salên temenê wan zêde ne!

Li gor vê nêrîne "Bavê kal" ji xortan re jî tê gotin, ji navsalan re jî û ji salzêdeyan re jî.

Bawermendên ku pardemên xwe hemûyan di riya xelastkirina xwe û mala xwe û di ya gelê xwe de dibihurînin, her ku dihere dikelin, û derdora xwe jî, di vê wateyê de dikelînin.

Belê gelek temen henin ku dirêj in; lêbelê bê buha ne. Û gelek temen jî henin kin in; lêbelê tevhev yaqût in, almas in.

Kana Curhetê

Curhet û wêrekî, ji amadebûyînê çêdibe; tirs û newêrekî jî, ji amadenebûyînê.

Ku meriv bibêje kana wêrektiyê ji aliyê êqil û dil û jîrtiyê ve amadebûn e, ne xelet e.

Siûda wêrek û bicurhetan, ji ya tirsok û newêrekan zêdetir e.

Mîna ku Cenabê Elî gotiye: Curhet deh beş in, yek netirsîn e, neh jî baldarbûn û tevdîrstandin in.

Ji paye û mansiban mehrûm mayîn, ne wendakirineke mezin e; ji hevalekî rastîn mehrum mayîn, di rastiyê de, ji wê mestir e; lêbelê ji

curẅetê bêpar mayîn, bi tevahî wendakirin e.

Kêmaniya Merivan

Dîyojen fîlozofekî Makedonî ye. Rojekê wextê nîvro, di destan de çirayek, bi çavnêrî li ser kolanan dihere û tê. Jê dipirsin: "*Tu li kê digerî?*" Dîyojen bersivê dide: "*Ez li merivan digerim, li merivan!*"

Mane

Yê ku bi rastîn dixwaze tiştekî bike, îlahim riyekê dibîne û yê ku naxwaze bike jî îlahim maneyekê/mazeretekê!

Mebe Çikos û Tirsok, Xwe Tevlî Jiyanê Bike!

Heke tu ditirsî, bizanibe ku tuyê jiyanê hew temaşe bikî, nikarî bijî!

***

Heke dilê te bi yên ku difirrin dimîne, ji ketinê metirse û xwe tevlî refên wan ke û baskan lêxe/lêde!

***

Heke tu dixwazî qedr û qîmeta te were zanîn divê tu jî qedr û qîmeta mirovan bizanibî.

Hem tu dibêjî bila mirov li min ẅez bikin; him jî tu ẅezâ xwe nadî kesî, dilgermî û dilsoziyê bi kesî nakî! De bibêje wê çawa pêk were ew daxwaza te?

Merivên Biçûk

Meriv, li gor girêdayiya xwe ya bi Xwedê ve, bilind e, mezin e; ne li gor bejn û bal an jî li gor ẍizanî û dewlemendiya xwe!

Mezinahiya bi bangeşeyê ve girêdayî ye, ne mezinahiya rastîn e. Yên wisa dişibihin mirovên sî dirêj/mezin. Bila neyê jibîr kirin ku, li ciyekî heke sî dirêj e li wê derê rojavabûn gelek nêz/nêzîk e.

Mirovê jê Qaîl Bûyî

Gotinên te bila nerm û erênî bin, dilê te bila germ be, kirinên te jidil bin; da ku deriyên dilan ji te re vebin, ujdan rê bidin ray û ramanên te û bandora te li ser derdora te her dem be!

Ji van pêşdetir jî Xwedê û qasidê wî ji te qaîl bin!

Pê Fehmkirindayîn

Dixwazî, zanyartirê cîhanê be! Zanyariya te bi dereceya fehmbûyîna te ve girêdayî ye. Tu çiqas dizanî bizanibe, hemû gotin û nirxandinê te, bi qasî fehmkirinên muxatabê te ne.

Pê Ẅesîn

"*Kînga min hebûna Xwedê fehm kir, hînga ku ez têgihîştim ku ez dijîm*" (Tolstoy).

Şukir ji Xelaskar re! Ji tunebûnê derxistina qada heyînê… Rohnîkirina tarîtiyê… Mîna mirovê ji tîna çikyayî, têran têr av vexwarin û hişê xwe koma serê xwe kirine re hezar carî şukir…

Şitil Çandin

Çîniyan çi xweş gotiye: Ji bo şitil çandinê zemanê herî baş bîst salan berî niha bû. Li dû wê demê şûnda dema herî xweş îroj e.

Şopandin Şopandin Şopandin; Saxtîkirin, Saxtîkirin, Saxtîkirin

"Mêbêje "min riyê da", guman heye ku hîn jî nedîtibe… Mebêje "min pê re got", gumana nebihîstinê jî heye… Mebêje "min bihîst", gumana çewt fehmkirinê jî heye… Mebêje "fehm kir", ev nayê wê wateyê ku bawer kir… Mebêje "bawer kir", ev nayê wê wateyê ku pêkanî… Mebêje "pêkanî", ev nayê wê wateyê ku wê bidomîne…"

Têkoşerê Herî Serkeftî

Têkoşerê herî serkeftî, ne yê ku li qada bi dijmin re şerkirinê de serkevt bûye ye, mîna ku Rohnayina Çavan (s) gotiye, yê ku di têkoşîna bi nefsa xwe re serkevt bûye ye!

Ûjdanê Tefessuxkirî

Yê/a ku him bi kujer re, him bi kuştî re; him bi şêlanker re him bi şêlandî re; him stemkar re him bi stembar re; him bi şiltaxan re him bi buxtanlêbûyiyan re heval e, bê guman xwedî ûjdanekî tefessuxkirî ye.

Veguhêrîn

Hew bi gotin û teşwîqê debar mekin, ya bibin parçeyekî/a veguhêrîna ku hûn dixwazin, ya jî bibin kirdarekî/a wê!

Xawênî

Xawênî, ji payeyên bilind buhayan qezenc nakin; payeyên bilind xêra xawêniyan bi nirx

dibin.

Ẍeletî

Tu li ku dibî û di çi astê de dibî bibe, bila her dem tirsa Xwedê di dilê te de be! Ku nerindiyek an jî ẍeletiyek ji te sadir bû, hima bi duayan lêborînê bixwaze û rindî û çêyiyeke miqabil an jî hîn giran li dû wan ẍeletiyan bike ku maşalê bandora neyînî ji navê rake.

***

Bila neyê ji bîr kirin ku hew pêxemberan xete nekirine. Mirov xeta û ẍeletiyan dike. Ḧîkmeta wê jî mecbûrmayîna dûakirinê ye. Ma banga pîroz ji boşê dibêje: *Ku duaya we tune be çi qîmeta we heye?* Tê fehmkirin ku qîmet û girîngî bi duakirinê ve girêdayî ye.

***

Bizanibe ku bê wendakirin serkevtbûn çênabe.

Bîr meke! Wexta ku te wenda kir ne, wexta ku te terikand tu binkevt dibî…

***

Ḧeya tu kanî ber bi paş ve bireve çi fayde! Xebata te hemû bê ne'f, westandina te giş li tunê dihere, heke tu li wasîteya ẍelet suwar bûyiye. Tavilê jê dakeve û li navgîna xwe suwar be.

Pirr jî bi ber şaşiyên xwe mekeve! Lewra jiyan bi ẍeletiyan xweş e û watedar e. Ekla westîna di lêgerîna rastiyan de, gelek caran ji ekla rastiyan bi xwe, bi tamtir e.

Xwe Bûn

Xebitîna li ser xwe veguherîna yekî din, xwe li tu û tinê xerckirin e.

Ḧewcî ku tuyê di kesayeteka ne ya te de werî ecibandin, bi kesayeta xwe ve be, qet jî meyê ecibandin tew jî ber mekeve!

Her dem, xwe be, hew xwe be. Carna ku te xweziya xwe bi hinekan anî jî, birmeke, Xwedê bi *xwebûna te* tu xuliqandiye û bi wî awayî li te Ḧez dike. Li aliyekî di heke tu, tu bi xwe bî, tu her dem dikanî bigihêjî asta ku tu daxwaz dikî.

Xwe Spartina Xwedê

Ku tu ketî rewşeke giran, li dewsa bergerîna bi awayê "*Xwedayê min, pirsgirêkeke min heye!*" yê, tam li dijî vêya meriv bergerîneke wiha bike "*Pirsgirêkê! Xwedêyekî min î Mezin heye!*" çawa ye?



BÎR

Zafer BERDESTÎ

Ji bîrê…

Di bîrê de ez dixebitîm. Di qata nizam çendemîn ya li jêr de min karê paqijkirinê dikir. Min hem dikola û hem jî ew gemar û qîra binê bîrê paqij dikir. Min çiqas dikola ewqas şêlû dibû bîr. Ji binî ve tiştên ku min zûde ji bîr kiribûn derdiketin. Hem bi fikar û tirsa bêreng, di wê tariya bêxem de carna sa'etekî carek min pişta destê xwe li xweha netika xwe dida.

Heta hin tiştên derdiketin hebûn, min nedixwest bizanibim çi ne. Li ser wan qalikekî stûr û rengekî gewrî û tîr hebû. Min derdixist û zûtirî ew ji xwe bi dûr dixistin. Ez ji halekî davêtim halekî din, dilerizand, ditirsand.

Bîr gelekî kûr bû. Lê tevê tirsa xwe û newêrektiya xwe min biryar dabû ku bikolim û xwe ji vê kirêtiyê xilas bikim. Min dest bi kolanê kir û nizanim çend dem bûn lê dizanim demeke dirêj bû min dikola…

Min dizanibû ez ê bi dîtina hin tiştan kêfxweş nebim, hin tişt wê min di şermê de bihêlin û gelek tişt wê rûreşiya min û neqenciya min diyar bikin, belgeya kesayetiya min, yê ji nav wê gemarê derkeve lê min ê bikola…

Carekê, di serê çaryeka dawî ya saeta pêşîn a kolanê de min tenekeyek derxistibû, tenekeyê vala piçekî zeng jî girtibû û çawa çavê min pê ketibû ez ji şerma sor bûbûm û giriyabûm. Ne tenê ew, çaydaneke destî şikestî, kêrek, kita solekî û…

Beriya ez ê bikevime bîrê min çend riyên din ên paqijkirinê ceribandibû, min alîkarî ji çend pispor û zaneyên pîşeyê xwe xwestibû, lê nebûbû çare. Paşê dîsa min bi ya xwe kiribû. Heta carekî çend rojan, na, çend roj û danekî min dora bîrê kolabû. Ez ji devê bîrê dûrketibûm û tirsiyabûm û min nexwestibû bîra min a heyî jî ji destê min here û ji derve ve tep be. Heta bîr wekî tîjikekî di nav çala min kolabû de mabû. Paşê dîsa min li ser wê çalê girtibû û ew rê ji bîr kiribû.

Carekê jî min hin tiştên derxistibûn cardin xistibûn bîrê lê ew paqij nebûbûn. Sa'eta dêst a ku min wextekî gelek jê hez dikir, pênûska hibrî ya zîvreng a ku min ji destê xwe bernedida, tizbiyên rengorengo…

Demekê, lingên min pir qerimî bûbûn, ez êdî gelekî westiyabûm. Çermê zikê min qurçimî bûbû, pişta min dicemidî û êdî ez birçî bûbûm. Lê her car min gava dest bi xwestina xwarin û vexwarinê dikir wê tarî û sirê ez poşman dikirim û nedihîşt ez li xwe binihêrim.

Paşê rojekê kesekî aliyê min kir, hem riya paqijkirinê hem ya jêderxistinê û hem jî ya derketinê nîşanî min kir. Wî, nezanî û dudiliya min dîtibû, berî ku ez ji taqet bikevim, bê derman ji xwe ve herim gihiştibû, ji gulava xwe niqutkek berdabû ser rûyê min ê qelibî, destê xwe yê nerm li ser netika min e hişk û sar gerandibû û ez ji wê bîrê derxistibûm…

Paşê piştî çend demên dirêj yên di berjêr û hevrazên jiyanê de min ew ji bîr kiribû. Lê dîsa çend caran ez li gelek deran lê rast hatim. Wî hê jî bîr dikolan. Ez kelogirî nêzîk bûm, ji şerman min stûyê xwe xwar kiribû û rondikek ji çavê min ê rastê tilol bû û hat li ser piyê min danî. Minê tu car nedîta ew bi bişirînên bi şewqet li min dinihêrî. Û piştî ez wisa bûm û jê veqetiyam çavên min wekî sûra bendava pêşiya wan hilşiya be û ava wê herikîbe sivik bûn û min ji dil go;

Ya rebbî ez poşman im.

ÇERXA HEBÛNÊ

İbrahim XULUSÎ

Çerxa hebûnê bifikir!
Hertişt çawa dike zikir

Navê wî Xaliqê Rehman e
Bi her awayî dike ‘îlan e

Eger tu ne keer be, kor be û lal
Teqez tûyê bigrî derz û şîretek delal

Ger te xwest temaşekî wan heqîqetan
Aqil bide destê guh û çavan

Bipirs ji behrên pêlhar
Hilbet wê bibêjin ya ‘Ezîz û ya Cebar

Dûra bipirse ji mexlûqên muhtacrehm
Ewê bêjin tuyê jî sehkî ya Cemîl û ya Rehîm

Guh bide ‘erd û asîman ne keer in û ne jî lal
Bi dengekî xof ew dibêjin ya Cemîl’ê Zulcelal

Lê te qet bala xwe da heywanatan
Qasidîtiya xwe dikin û deng didin ya Rezaq û ya Rehman

Û temaşeke bihara xemilî û rengîn
Bi dengekî pir xweşik dibêjin ya Rehîm û ya Kerîm

**** Îlham ji peyva bist û çaran.***

Baranek Dibare Li Derva Hûrik Hûrik…

Silheddîn BIHIŞTÎ

çavên min xwîn digrîn li aliyekî,
li alîyekî keleboẍeke fetisok…
kelek heye îro li her derê, kelek; kef bi kef dikeliye her tişt
agir, barîna baranê, kelîn û jîyîn; cîhan veguheriye qada meẖşerê…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
dilîn û bîr nasekinin, mîna ji qefesê bifilitin baskan lêdidin û diçin,
bê, benê xwe qetandiye îro, qey tu dibêjî hîmê erdê diheje…
daran xwe bi erdê ve zeliqandiye, mîna ku min xwe bi perwazê ve giriye çûmik…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
ne pertewek bimêhr porê min miz dide, ne cûdî min ẖembêz dike.
ez ketime yaxa tarîtiyê kîngav da ye, tarîtî ketiye yaxa min;
geh ez serkevt im li hember pelîtiyan li qadê, geh ew zorê didin min!
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
bayek têye ji aliyê başûr ve bayek, pê re toz û dixan tevlihev
tayekê di min werda nişkav da yeka sar, ez dicirrifime,
mîna serçeya li hember a seranser şil, dicemidime îro digel barîna baranê…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
H̱êsrên ẖesretê di çavên min de ne…
Lê di mêjiyê min de lerza erdẖezê heye îro, her tişt serûbin,
mîna yên beẖrê har û dîn, pêlên bêrîyê di dilê min de radibin,
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
di guhekî min de dengê şîrîn ê birayê min selaẖedîn wekî dermên,
di yên din de dengê çêkerê jîrtiyê ẍerîbê vê serdemê heye…
li paş perdê mizgîn, rûkenî û ẖembêz bi ẖembêz dua ligel dîmenên behîştê,
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
li derva gemar, li derva gune, zemîn seranser dîl e, di bin nigên ziftê da,
devê riya rehan xetimiye li baxçeyan çima nizanim!
şitil stûxwar in, co hişk in hemû, zûdav da ye bê av in daristan,
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
di binê pirê re mîna ava ferêt dem diherikiye ji temenê demê,
ji kaniyê demzayînek heye îro gelek zêde ji dema neqandî…
dilop bi dilop, çilk bi çilk diniqutiye ji çavên ezmanê serdemê,
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
ax şil dibe ẖeb bi ẖeb bi çilkên jîndar, kevir şil dibin qor bi qor,
H̱erî û pûr, teva yên di nav de vedijin gor bi gor.
vejîn heye di zemîn de li dij ziftê vejîn, li her alî zîl-zîl, pel-pel û gupik-gupik…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
çi û çi ẖesab, çi û çi hêvî, lêbelê çi û çi encam?
kanî ji kaniyan mestir in ẖesab ji ẖesaban, zevî ji zevîyan bi bertir.
şukr û spas ji bo hemû dayîn, hemû diyariyan ey vîna vînan!
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
bi baranê re dengek: "heke ferman hat ji yezdanê bilind,
tu kî yî li vê qadê û jîrî çi ye li hember desthilatiya mezin?
hemû hiş rûmetdar, vîn û aqil giş bi wê dibin serbilind…"
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
aqîl, vîn tev şaş û dîn in, hew bi wî biaqil, hew bi wî payîdar
bi wî hişmend in mêjî, bi wî dadmend in dil
li jor hilmek jîndar, li jêr vehejînek guherbar, dem vediguhere biharê…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
her çilkek pîroz û bimbarek, bi destên nazik yên ferişteyan ve,
ji gencîneya riẖmê li ser lepan her babet îkram çilk bi çilk nazikane
bi perwazan li ser keser û hêvîyan, li ser dua û daxwazan tên çilkandin…
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

baranek dibare li derva hûrik hûrik…
zemîn bi telbîz, lêv westyayî ji lavan, bêje dest vekirî perestkarane,
radimûsin ruyê erdê lêvên diyariyên perîşteyan, nermane;
slavê dişîne bûka baranê bi rûkenî li ser bijangên aso nizanim ji kî û kê ra!
baranek dibare li derva hûrik hûrik…

Serpêhatıyên Nêzê Mırınê –II-

- Li Qusqûnqiran/Mila Dêrê -

M. Zahir ERTEKİN

Rêwîtî… Rêwîtiyeke dinyayî, çiyayî… Ber bi yeke me'newî… Dema ku min ev serborî jiya çokên min ji tirsê dilerizîn. Niha ez dikim qala wê demê bikim, ji ber vê jî lerzandina wê demê dîsa xwe li dora min rakişandiye. Meriv di bîranînan de dibe bîranîn û demên borî weke çîçekan vedibin. Lewra bi rastî jî mirinê xwe pir nêzîkî me kiribû. An me xwe pir nêzîkî wê kiribû. Belkî ev gotin ne durust be. Lewra nêzîkahî û dûrahî tenê di binê 'ilmê Xwedê de ye.

Belkî jî bê tedbîriya min ji wê re bibû rê û vexwendinek. Lê helbet sedemek, hêncetek, bê-tedbîriyek jê re divê. Loma jî bê sedem tu car nayê. An nexweşiyek, an qezayek, an fetisînokek û hwd. dibe sedem ji bo hatina mirinê. Mezinan gotine, ji teqdîrê re tedbîr nîne çare. Teqdîr jî ya Xweda yê. Wê her tim weke Wî be.

Belê di vê beşa *serboriyên mirinê* de ez ê behsa rêwîtiyekê – ji Mêrdîn ber bi Wanê ve- bikim. Ku di vê rêwîtiyê de lingên min li ku hulkumî û bêhna mirinê çawa hate pozê min, ez ê bi kurtasî qise bikim.

Adareke bi baran bû. Mij û dûmana pıştî baranê çiyayê Mêrdîna bilind di nava xwe de wenda kiribû. Mêrdîna kevn nedihate xuyakirin ji mij û dûmanê. Ajotina 'erebeyan pir zor bibû. Ajotvanan bi zorê ber xwe didîtin. Min digot em ji Mêrdîn derkevin wê ev mij jî biqede. Lê wisa nebû. Heta Bismilê û heta Batmanê jî ev mij û cîna jî baranê her dewam kir. Ji ber baranê min 'erebe hêdî diajot. Lewra ez ne tenê bûm di 'erebeyê de û mesûliyet girantir bû loma jî... 'Trimbêla me tije bû.

Dema ku em gihiştin Geliyê Bilîsê av rabibû. Ji çiyayan ax û kevir berjêrî şahrêyê dibûn. Çemê Bilîsê har bibû. Te digo qey av û herî ketine destên hev û dîn bibûn. Êvar bû lê dîsa jî li wê nêrîn cesaret/wêrîn dixwest. Bi gotina îngilizan em fiftî fiftî ji bobelata wê û ji girtina rê xilas bûn. Li ser rê gelek însan û gelek cenderme hebûn. Paşê hate zanîn ku zarokekî heft-heşt salî ketiye çem û ber bi avê ve çûye, fetisîye, li cesedê wî digeriyan. Rojek piştî wê rojê riya Bilîsê hatibû girtîn û gelek însan mexdûr û mexsûr mabûn.

Dema ku em gihiştin Tetwanê tarîtiya şevê xwe rind raxistibû. Diviyabû ku em wê şevê li Tetwanê bimana. Ya rastî min dixwest ku zûtirî xwe bigihînim Wanê. Lewra însanekî delal çûbû rehma Xwedê. Min dixwest berî ku rojên serxweşiya wî biqedin ez xwe bigihînim taziyê. Ez bi maliya xwe re şêwirîm, wê jî nexwest ku em di vê rewşa hewaya nexweş de herin. Min telefonî hevalekî xwe yî ku li Tetwanê rûdinişt kir ku em îşev bi malbatî bibin mêvanê wî, mixabin ew jî derketibû derveyî bajêr. Paşê min telefonek ji hevlingê xwe re vekir û min rewşa şevê, hewayê, mij û baranê jê re vekir. Bi awayekî vebirî çûyîna me nepejirand. Ev hevlingê min zilamekî dinya dîtî, zana, xwedan tecrube û şofêrekî kevn bû. Tevî van şîretan jî min bi ya xwe kir, min da rê û ajot. Berî ku ez xwe bigihînîm ciyê bûyerê –Mila Dêrê-, li ser rê tesîsek hebû. Li wê derê min hinek xaz ji 'erebê re stand. Gelek qamyon li wê derê sekinîbûn. Xuya bû ku wan jî newêrîbû di vê barana coş de riya xwe bidomînîn. Lewra kaş û fitlanekên qusqûnqiranê gelekî bitirs bûn. Hevsera min ji min xwest ku em jî neçin û vegerin Tetwanê. Lê min dîsa weke xwe kir û min da rê.

Li hevrazê qusqûnqiranê qamyonek li rê mabû. Xuyaye ku min guh nedabû wê jî. Berî ku em bi kaşê Mila Dêrê kevin baranê dor da berfê. Berfek wisa bi coş û tavî dibariya ku jêbirkên cama 'erebeyê nedibû xwe bigihînîn sur'eta berfê. Tirsê hêdî hêdî xwe nîşanî min dida. Li paş 'erebê herdû zarok bi xew re çûbûn. Xwesiya min jî li ba wan bû. Lê tenê dia dikir. Li kêleka min hevsera min, wê jî….

Mila Dêrê konaxeke dijwar e. Kesên ku tê re neçûbin qet nikarin nedîtî tiştekî jê fêmbikin. Berfeke ku 'erd bi carekê ve girt, hevrazekî zexm, erebeyeke sivik û bi tekên havînî, derveke reş û tarî…

Piştî van şert û mercan bi ser kaşê Mila Dêrê ketin û ya herî girîng jî berjêr daketina wê meriv bide ber çavê xwe rewş piçekî zelaltir dibe.

Îja ne li pêş û ne jî li paş me erebe tunenin. Rê qet xuya nake. Merivê çawa û bi ku de bajo nediyar e. Em pacê vedikin – ji bo piçekê rêdîtinê- berf wisa hucûmî hundir dike ku ji mecbûrî em camên erebê digrin. Dema ku em caman digrin jî pêşî qet xuya nake. Jêbirkên camê dixebitin di heddê herî dawî de lê tu fêde tune. Tirseke min jî ev bû ku jêbirk bişkên an xera bibin. Ji wê çaxê rewş xerabtir dibû. Hema nîv mêtro jî em ber xwe nabînin.

Welhasil em bi ser kaşê Mila Dêrê ketin. Erê ez dibêjim welhasil lê bûyera me ya awarte 'esas ji vir dest pê dike. Kin didome lê pir dirêj e. Deqqe dibin se'et. Saniye nameşin li dû hev. Ji tirsa, rehên çokê min sist bûn. Ava sar bi ser bi min de rijiyabû. Dev û lêvên min nedileqîyan. Min nikaribû pê li xaz an firêna erebeyê jî bikira ji tirsa. Rê bi carekê girtî. Nîşanên rê tevde berfgirtî. Ez nizanim ka ez li kêdera rê me. Ne dizanim li navê me, ne dizanim li rastê rê an çepê rê me. Lewra ger ku ez zêdetir li çepê rê bim, xetereke pir mezin li hêviya me ye. Lewra kortal e, kendal e. Ciyekî wisa ye ku însan bi roj bi rehetî nikarê li vê dîmenê temaşe bike. Ger ez zêdetir li çepê rê bim dibe ku ez li bin guhê çiyê xim. Di nav van hizr û ramanan û di nava hezar hizr û ramanên din de min 'erebe sekinand – li ser çiyayê Mila Dêrê – û min ji hevala xwe re got ku ez êdî nikarim gavekê bajom. Lewra ez nizanim ku ez ê bi ku de bajom. Derek nexuyaye. Ya rebbî ev çi îmtîhane. Di vê şeva tarî de qedera Hz. Yûnis bi serê min/me de hatibû. Dema min fikra xwe ya neçûnê eşkere kir hevala min dengê xwe bilind kir û got bajo. Ger ku tu nejoyî em ê yan li vir bibin xwarina guran an jî em ê ji serman biqefilin. Li paş 'erebê xwesiya min sar bibû, rih têde nemabû û loma jî deng jê dernediket. Min got ez ê fikra wê jî bipirsim. Bi dengekî keserkûr gote min 'sen bilirsin'. Min heta wê çaxê hê nedîtibû ku hevala min bi awayekî musirrane tiştekî ji min dixwaze. Digot bajo. Îja feqirê Xwedê ez jî mafdar bûm. Ka ez ê bi ku ve bajom. Ez ê çilo bajom? Ez ê çi xweliyê li serê xwe kim û bajom. Ez ê ber bi kendêl bajom? Lewra daketina ji Mila Dêrê tiştekî pir xeternak bû. Bi dehan fitlanek hebûn û yek ji yekî xerabtir bû. Ji sê km. zêdetir rê li ber me hebû. Lê ka rê. Navê wê rê bû. Lê ji berfê û bahozê pê ve tiştek xuya nedikir. Berfê, taritiya şevê û bahozê li hev kiribûn û bibûn yek û bi carekê tirsa mirinê xistibûn hundirê me. Min di'ayên xwe xwend û min erebe ajot. Belê ez dajom lê ez dikarim sond bixwim ku min nediajot. Erebe diçû lê min nedibir. Erebe diçû lê min nizanibû ku bi ku ve diçe. Fetlînok yek bi yek derbas dibe lê ez nizanim bi kîjan rêberî û îşaretê ve derbas dibin. Tiştek bi min xuya nake. Tenê destê min bi dîreksiyonê ve ye û lingên min li jêr çi dikin nizanim.

Di hundirê 'erebeyê de sê dilên jihevketî û du dilên di xew de. Sê devên di'axwan û du lêvê lihevgirtî. Sê dilên kelogirî û du dilên zarok. Sê dilên xwedî qewl û herdû zarokên min. Min riya Mila Dêrê xelas kir. Em ji wê xilas bûn. Lê hê jî em bawer nakin ku em jê xelas bûne. Te digo qey wê Mila Dêrê li me vegere, li pey me were, em ditirsiyan. Deng ji kesî dernediket. Kesî bawer nedikir ku em xelas bibûn. Berfê hêdî hêdî ciyê xwe dida baranê. Berê şilope û paşê barana coşane. Min pê li xazê dikir, da ku Mila Dêrê û berf li me venegere. Venegeriya. 'Ezraîl xwe amade kiribû. Mirinê dengê lingê xwe bi ser guhê me xistibû. Serboriyeke mirinê hatibû jiyandin. Jiyan careke din bibû bêqîmet li ber çavê me. Xwesiya min ji xwe re qewl kiribû ku wê rojekê rojî bigirta, min jî, min ê şîvek bida feqîran, hevala min negihabû ku tiştekî qewl bike. Lewra bi rih û can jiyabû ev deqîqeyên kujer. Nehatibû bîra wê, feqîrê.

Di sibeha wê rojê de gelek hikmet û keremetên bûyerê derdiketin holê. Hevlingên min ji 'ecza gotibû mademkî bi ya min nedikirin, çima fikra min pirsî bûn. Diya min a reben di wê rojê de çûyîna me ya zehmet di dilê wê de 'erqilî bû, ji xwe ez tiştên ku wê, wê rojê jiyaye binivîsînim wê nivîseke nû derkeve holê. Ez ê nekevim wê behsê jî. Û ji xeynê di rê de telefonên ku ji aliyê bavê min dihate kirin…

Dişa min roja berî bûyerê me di xew de dibîne, û pir ditirse. Bi kurtasî dibîne ku em di maşîna xwe de ber bi ciyekî ve diçin. Erebeya me di kendalekî de wer dibe. Lê li layê yekî cilsipî û xaîbane ve em têne xelaskirin û dîsa em tevlî erebeya xwe rastrê dibin û hîn gelek meseleyên din…

Welhasil, mirin li ku xwe li ber me vegirtiye nayê zanîn. Lewra ev zanîn tenê di binê zanîna Wî ya sermedî de ye. Ya baş em her dem ji bo wê amade bin û ji bo mirineke rehet, qenc û bi xêr di'a bikin. Ji xwe wê bê. Madem wisa ye bila di ciyekî pîroz, di demeke pîroz, di rewşeke pîroz û bi awayekî pîroz were. Amîn.

J’LORÎNAMEyê

sidîq gorîcan

qulingek î tu

Şûlenasa’m bavmelal e
dilopeke pir zelal e
bi rûyê xwe yê berken
j’loriyan re xweşhal e

(qulingek î tu j’esman
difirî diyar bi diyar
hez ke Xwedayê rehman
kulîlkek î tu j’dembihar)

Şûlenasa’m girînzîz e
ji bavê re zehf ezîz e
b’hinarkên xwe ên narîn
balokeke lezaîz e
(.....
.....)

Şûlenasa’m çavzeytûn e
dilê min jê re meftûn e
b’gewdeya xwe ye yeb lepik
j’mala min re hûrxatûn e
(.....
.....)

tebax2007wan

gulê îro gul avda

gulê îro gul avda
devrê û dirîk ketin şahiyê
dilê min bi jor ve bazda
ewr û ezman vegeran sahiyê
gul bi gulê rengegeş bû
strî bi dara xwe sitirî
wext berêvareke demxweş bû
pênûs bi nazdara xwe şêwirî
helbestokekê wiha bû fêkî
rewnak bû şibaka kesekî
ew kes ez im bavê gulê
dibim axa l’bin dargulê
dargul kulîlka baxan e
gulê biçûka qelbdaxan e
niha em xalekê bidanin liha
bikin j’herkesê hêvî û lava
bila tim gulan gul av bidin
xanan bi hênikahiyê werbidin

tîrmeh2010wan

Ji Serî Heta Dawî

Seyfeddin AYKAÇ

Du heb xortên bîst û çar an bîst û pênc salî di germahiya nîvro de nepenî ji taldê xaniyê bi kerpîç û bi keviran hatine çêkirinê re dimeşin û ber bi mala Erqam ve diçin. Haja wan ji hev tune ye. Nêzîkê mala Erqam riya herduyan digihêje hev. Ji wan xortan yek ‘Emmarê kurê Yasîr e, yê dinê hogîrê wî Suheyb e. ‘Emmar mêze dike ku ev hevalê wî Suheyb e. Li ber deriyê Erqam selam û kêfxweşî didin hev. ‘Emmar ji Suheybê Rûmî pirs dike:

- Xêr e îşê te li vir çi ye. Tu yê çi bikî?

  • Suheyb ‘eynî pirsê ji ‘Emmar dike:

- Ez dixwazim herim cem Mihemmed û guhê xwe bidim xeberdanên wî.

Niyet û xwestina Suheyb jî ev bû. Her du bi hev re ketin hundir. Resûlullah ‘eleyhîselam piştî suhbeta xwe xelas kir, ew dawetî dînê Îslamê kirin û wan jî qebûlkirin û bûne misilman.[1]

Ew roj ‘Emmar çû mala xwe û ji diya xwe Sumeyye û ji bavê xwe Yasîr re behsa qasidê Xwedê û dînê Îslamê kir, herdu bi hev re bûne misilman. Di Mekkeyê de malbatek hemî bi hev re cara yekem bû ku bibû misilman. Wê demê hêj misilman deh an yanzdeh heb bûn.[2]

Yasîr ‘eslê xwe de xelkê Yemenê bû. Hem ji bo ji xwe re karekî bibine û aboriya xwe bike hem jî ji bo ku hevalbendê zaroyên Mahzum bû -bi fikra ku wê alîkarya wî bikin- ji Yemenê derket û çû Mekke yê.[3] Herdu kurê xwe (Harîs û Malik) jî bi xwe re bir. Dema çû Mekkeyê qerwaşê Ebû Xuzeyfe Sumeyyeyê re zewicî. ‘Emmar ji wê zewacê hate dinê. ‘Emmar kurêkî bedew û şêrîn bû. Ebû Xûzeyfe pir jê hez dikir. Meriv digot qey bapîr û neviyê hev bûn.[4]

‘Emmar di Mekkeyê de mirovekî biyanî dihate hesibandin. Lewra diya wî qerwaş, bavê wî jî ji ehlê Mekkeyê nebû. Ji bo wî di Mekkeyê de ne mal û milkê wî ne jî îqtidara wî hebû. Dema diya wî bû misilman pir tehde û îşkence dît, lê belê Rebbê ‘alemê îmaneke wisa xistibû nesîbê wan ev tehde û îşkence ji bo wan mîna xilasbûnekê bû. Baweriyê, dilê wan, devê wan, mejiyê wan û hemî laşe wan dagirtibû, heta derbasê mixê wan bibû. Ji bo wî ji tu tiştî nedirtisiyan.

1 Îbnûl Esîr, Usdul Xabe c.4,r.140
2 Îbnûl Esîr, Usdul Xabe c.4, r.144
3 Îbnul Esîr Usdul Xabe c.4,r.140nh
4 Îbnî Se’d, Tabaqatul Kubra c.3, r.247



Muşrîkên dewlemend ola nû nedihebandin û nedixwastin kes jî bihebîne. Her roj Misilmanên lawaz digirtin û tehde û îşkence bi wan dikirin. Yên herî ji tehde û îşkenceya wan ta'm dikir malbata Yasîr bû. Muşrîkan; Yasîr, jina wî û kurê wî 'Emmar di germayîya nîvro de dibirine ser tehtê Mekkeyê û îşkence bi wan dikirin.[5] Dema îşkence li wan dikirin rojekê Resûlullah 'eleyhîselam rastî wan hat û ji wan re wiha got: " Sebir kin ey malbata Yasîr, sebir kin û kêfxweş bin, mukafata we bê şik Cennet e.[6]

Dîsa rojekê diya 'Emmar Sumeyye û bavê wî Yasir girtin û girêdan, dane ber îşkencan heta rih di laşê wan de nema, pêşiyê Sumeyye pişt re jî Yasîr jiyana xwe dane der. Herdu jî di wê rojê de ji bo baweriya xwe şehit ketibûn. Herdu şehîdên Îslamê yê yekemîn bûn. Çawa ku Resûlullah 'eleyhîselam gotibû, mukafata wan bibû Cennet…

Piştî ku bav û diya 'Emmar hatine şehîtkirin jî muşrîkan dev ji 'Emmar bernedan, bîlxusûs Zaroyên Mahzum. Hz. 'Emmar dibirin ser tehtên bilind û kirasê hesin lê dikirin di binê tava germ de didan sekinandin û rûnê laşê wî diheliya, wisa dibû ku nizanibû ka çi xeber dide.

Carnan bi agir îşkence pê dikirin. Piştî salan, jê pirsa cihê ku hatibûn daxkirin kirin, bersiva wan wiha dabû: " Ev dema Qureyşîyan li Remdayê bi agir min daxkiribûn ev dewsa rêça wan e."[7]

Rojekê hz. 'Emmarê kurê Yasîr hate cem Resûlullah 'eleyhîselam; " Ya Resûlullah! êdî van kafiran ji tamê derxistin, tişta ku neanîne serê me nema" dema wî wisa got, Resûlullah 'eleyhîselam " sebir ke ya Bavê Yekzan sebir ke!" piştre ev di'aya hanê kir " Ya Rebbî! Tu ji malbata 'Emmar tu kesî ji 'ezaba cehennemê nede tamkirinê"[8]

Muşrîkan Hz. 'Emmar her dem îşkence dikirin, carna di binê germahiya tavê de tehtê giran didan ser zikê wî, carna jî serê wî dixistin binê avê, bêhn lê diçikandin.[9] Rojekê zaroyên Muxîre ew girtin, birine cem Bîra Meymûn û serê wî noqê avê kirin û jê re gotin " Heta tu xeberên nebaş ji Mihemmed re nebêjî, lat û 'uzza ji dînê mihemmed çêtire nebêjî em te bernadin" û wisa jî kirin heta 'Emmar gotina wan pêk neanî, ew bernedan.[10]

Hin sahabe hatin cem Resûlullah 'eleyhîselam bi xemgînî " Ya Resulullah! 'Emmar bûye kafir" gotin.

Resûlullah 'eleyhîselam:

- Nexêr! Bawerî ketiye nava xwîn û goştê wî, ew serî heta binî bi îmanê tijî ye.

Wê demê hz. 'Emmar çav lê sorbûyî bi girî hate cem Resûlullah 'eleyhîselam. Resûlullah 'eleyhîselam bi destê xwe çavên wî yên bi hêstir paqij kir û jê pirs kir:

- Çi qewimî? Çi bû te?
- Ya Resûlellah! Heta min xeberên ne baş derheqê te de negot û tiştên dinê bi min nedane gotin min bernedan.

Resûlullah 'eleyhîselam:

- Dema te ew tişt gotin, qelbê te di çi halî de bû? Bi wan gotinên te qelbê te aram bû an na?[11]
- Nexêr ya Resûlullah! aram nebû. Qelbê min bi Xwedê û bi Resûlê Wî aram e û ez mîna hesinê hişk girêdayî bi dînê xwe me.
- Madem wisa ji te re tu webal nîne. Heke cardin bi zorê te bidine dubarekirinê tu

5 Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c.1, r.32; Ebul Fîda, el-Bîdaye we Nîhaye, c.3,r.58

6 Îbnî Sa'd, Tabaqat, c.3, r.249; Ehmed b. Hembel, c.1,r.62; Zehebî, Siyer, c.1, r.294-393, Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c.1, r. 342

7 Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c.1, r.342; Ebul Fîda, el-Bîdaye we Nîhaye, c.3,r.58; Îbnî Sa'd, Tabaqat, c.3, r.233, ; Ehmed b. Hembel, c.1, r.404, Îbnî Mace.c. 1,r.53; Zehebî, Tarîxu'l-Îslam r.53

8 Îbnî 'Ebdîlber, Îstî'ab, c.4, r.1864,

9 Îbnî Esîr, Kamîl, c.2, r.67

10 Îbnî Sa'd, Tabaqat, c.3, r.249; Teberî, Tefsira Teberî, c. 14, r.181-182; Xazin, Tefsira Xazin, c. 3, r. 136; Îbnûl Esîr, Usdul Xabe c.4, r.130-131

11 Îbnî Sa'd, Tabaqat, c.3, r. 249; Ebu Nuaym, c. 1, r.140; Îbnî Esîr, Kamîl, c.2, r.67; Zehebî, Siyerul 'e'lemîn nubela, c.1, s.294. Tirmizî, Sunen, c.1, r.52, Hakîm, Mustedrek, c. 3, r.392 ;Zehebî, Siyer, c. 1, r. 296; Beydawî, Tefsira Beydawî

cardin dubare bike.[12]

Wî jî mîna hemî sahabeyên Resûlullah ‘eleyhîselam hicretê Medîna Minawer kir. Ew

û hz. Huzeyfe bûne destebirak. Hz. Huzeyfe kurê Yeman perçekî ‘erdê xwe da ‘Emmar, wî jî di wî ‘erdê de zire’et kir.[13]

Dema mizgefta Resûlullah ‘eleyhîselam hate avakirinê herkesî yek kerpîç ‘Emmarê kurê Yasîr du heb dikişand, yek ji bo xwe yek jî ji bo Resûlullah ‘eleyhîselam dikişand.[14] Dema Resûlullah ‘eleyhîselam dît çû, toza ser wî paqij kir û jê pirs kir:

- Çima herkes yek, tu du heban dikşînî?
- Ez xêra wî ji Xwedê dixwazim.[15] Ser wê gotinê Resûlullah ‘eleyhîselam pişta wî mizda û jê re wiha got:
- Ya kurê Sumeyye! Xêra xelkê yek e, ya te dudu ye.”[16]

Avakirina mizgeftê dom dikir. Hemî sahabe dixebitîn, herkes li gorî hêz û quweta xwe dîxebitî. Ji bo ku hz. ‘Emmar xortekî xurt û bihêz bû kerpîç û kevirên herî giran du heb sê heb pişta wî siwar dikirin. Dema Resûlullah ‘eleyhîselam hate cem, giliyê wan ji Resûlullah ‘eleyhîselam kir:

- Ya Resûlellah, ew yên ku nikarin pişt bikin min didine kişandinê, niyeta wan hey

e ku min bikujin.

Dema wî wisa got, Resûlullah ‘eleyhîselam:

- Heyfa te ya ‘Emmar! Yên ku te bikûjin ev nîn in. Ew ên ku te bikujin gelekî har,

avlorîk û îsyankar in.[17] Tê wan gazî bal heqê ve bikî ew jî wê te gazî cem cehennemê bikin.

Resûlullah ‘eleyhîselam ji ‘Emmar pir hez dikir. Rojekê Hz. ‘Emmar û Hz. Xalidê kurê Welîd bi hevre mineqeşe kiribûn û ketibûne gengeşiyê. Resûlullah ‘eleyhîselam jî ew minaqeşe bihîstibû. Hz. Xalid hatibû cem Resûlullah ‘eleyhîselam û giliyê ‘Emmar ji Resûlullah ‘eleyhîselam kiribû û derheqê ‘Emmar de xeberdanê nexweş gotibû dema wî wan gotinên nexweş gotin hz. ‘Emmar dest bi girînê kir. Resûlullah ‘eleyhîselam “Her kê dijminî ji ‘Emmar re bike, dijminiyê ji Xwedê re dike. Dijminê ‘Emmar dijminê Xwedê ye.”[18]

Hz ‘Emmar di dewra Resûlullah ‘eleyhîselam de digel herba Bedrê hemî herban de şer kir. Di dewra Hz. Ebubekir de jî herb kir. Hz. Ebdullahê kurê ‘Ummer : “Di herba Yemameyê de min ‘egîdekî wisa dît ku serê kafiran şeq dikir diçû û gazî dikir digot: ‘Cennet li pêş me ye’ min lêkola û ez hîn bûm ku ew qehreman ‘Emmarê kurê Yasîr e.” Di wê herbê de Hz. ‘Emmar guhekî xwe jî dabû der.

Di herba Siffinê de, temenê Hz. ‘Emmar gihiştibû nodî. Ew ‘Emmarê pehlewan êdî kal bibû, di binê siyekî de rûnişt, jê re şîr anîn:

- Îro ezê bigihêjime heval û hogirên xwe, ezê bigihêjime Mihemmedê xwe

‘eleyhîselam” digot û şîrê ku jê re anîbûn vexwar.

Dema şîrê xwe vexwar gotina Resûlullah ‘eleyhîselam hate ber çavê wî:

- Ya ‘Emmar di dinyayê de rizqê te yê herî dawî wê şîr be.”

Şîrê xwe vexwar û ew roj li gorî hêz û quweta xwe ceng kir. Mirovek navê wî Îbnî Cadiye bi şûrê xwe li ‘Emmar xist û xiste‘erdê. Hz. ‘Emmar piştî demekê şehît ket. [19] Çû gihişte meqseda xwe, dost û hogirê xwe…

12 Suyutî, Durrul-mensur, c.4, r.13; Îbnî Sa’d, Tabaqat, c.3, r.249; Îbnî Esîr, Kamîl, c.2, r.67
13 Îbnî Sa’d, Tabaqat, c.3, r.249
14 Ebul Fîda, el-Bîdaye we Nîhaye, c.3,r.217
15 Ehmed b. Hembel, c.1,r.91
16 Ebul Fîda, el-Bîdaye we Nîhaye, c.3,r.217
17 Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c.2, r.142; Îbnî Sa’d, Tabaqat, c.2, r.241
18 Ehmed b. Henbel c.4, r.89-90
19 Îbnul Esîr,Usdul Xabe, c.3, r.134

CEMED

Fahrî AYHAN

Serê sibehan li bin dara me ye tûyê siyek tîr çêdibû. Tîna tavê ya li vî diyarî bi bandor bû. Lê belê tîrojên royê di nav pel û şaxên dara me ye tû yê de lawaz dibû. Bavê min li bin darê cûziya xwe dixwend. Ez jî li ser dareke dinê bi dawşandina tûyên sor û şêrîn re mijûl bûm.

Dema ku bavê min Qur'an dixwend piştî heyamekê çavên wî diwestiyan. Awirên xwe dige-rand, serê xwe radikir…

Bavê min dît kû ez li ser darê me. Berçavka xwe ji çavê xwe derxist. Dev û lêvên wî ji niha ve ziwa bûbû:

"Bi xêr rojiya sala bê dê lawê min Zahîd jî rojiya xwe bigre…"got.

Temenê min î wê salê ne yê girtina rojiyê bû. Lê êdî min bîra her tiştî dibir. Tûyên sor di devê min de diperçîqîn. Tûyên dara me ye sor wekî eceban bûn. Dema ku te dixist devê xwe şêrînahiya wê digihîşt heta gewriya mirov.

Bi vê gotina bavê min çavê min biriqîn. Bi dengekî kelecan:

"Yabo îsal rojên berî cejnê ezê rojî bigrim. Wekî tu bahs dikî, wan rojên bi xêr…"

"Tu zanî berxê min."

Karên dayikên vê heremê xilas nabin. Li ser rûyên dayika min xêzên xemgîniyê her dem diyar bûn. Li ber deriyê malê bangî min kir:

"Zahîd lawikê min tu dikarî herî gundê mala apê xwe? Ji bo fitarê, te yê cemed bianiya" got.

Mala apê min li gundekî beriyê bû. Qasî heşt kîlometran dûrî me bû. Bi rastî ez elimî bûm ser vê riyê

Ez û Bozê…

Navê kera me Bozê bû. Ligel bi rengê xwe qe-mer bû jî dîsa me jê re digot Bozê…

Ji ber kû elektrîka gundê me hîna tune bû. Lê belê elektrîkên gundê apê min hebûn. Ez û bozê gel-lek caran ji bo anîna cemedê em di vê riyê re çûbûn

û hatibûn. Dijwariyên tunebûna elektrîkê bibandor bûna jî, li gûndekî çiyê de di nav heşînahiyê de jiyaneke me ye rengîn hebû. Her şev bavê min li ber ronahiya lempe û fanosê ji me re jiyana pêxemberan, ya sehabiyan vedigot. Bîhna lempe û fanosên otantîk tevlî suhbeta têr û tijî dibû. Di şevên tarî de ruh û xiyalên me rohnî dibûn.

Ez û bozê em ji gund derketin. Êdî min dizanibû ku ez ê li ku derê rawestim, ji ku derê re derbas bibim. Em qasî du kîlometran meşiyan êdî bozê westiya bû. Em li ber siya kevirekî ku qasî bejnekê bû sekinîn. Pişta kevir ji ber tîna royê sincirîbû. Hinekî min bêhna xwe derxist. Min şiqamek hêdî li pişta bozê da:

"Bozê gelek însan ji te re dibêjin ker. Hema welleh tu ji gelekan biaqiltir î ha" min got.

Hîna gotina min di devê min de sar nebûbû ku ez bi dengekî zirav û cîzcîzokî ve veciniqîm.

"Zahîd ma tu dibê çi kuro?"

Min li paş xwe nerî kû hevalê min Şêxo ye. Em cîranê hev bûn û di heman polê de bûn.

"Xêr e Şêxo! Çi karê te li van deran heye?"

"Ji xwe… Ez hatibûm nav rezê xwe. Tu diçî kû Zahîd?

"Ezê herim gundê apê xwe yî mele."

"Zahîd hûn giş mele ne kuro! Bavê te mele. Apê te mele. Xwedê dizane tê jî bibî mele ha."

"Şêxo heydê em bi hev re herin. Tu nayê?"

"Na lo! Kî yê bê hata wê derê?"

Digel bozê bi gavên sistik em bi rê ketin.

Elektrîkên gundê mala apê min hebû, ew der, ji me re pir luks dihat. Digel apê min, amojna min bi mirûzekî bibişîrîn ez pêşwazî kirim. Nîvro nuh qlubî bû. Tîrojên royê wekî rimên germ di pişta min û di paş stûyê min de cit dibû. Li salona mala apê xwe li ber bayê perwanê rûniştim. Apê min ji aliyekî dixwend, carînan pirs ji min dikir:

"Bavê te, birên te çi dikin, tev baş in?"

"Başin apo. Silavên gişan li we hene."

Heta esir li mala apê xwe rûniştim. Encax ez ê bigihîştama malê. Amojna min qasî heqîba bozê tijî bibe li nav cîranan cemed dabû hev. Herdu çavên heqîbê tijî bû. Dîsa bi heman awayî em bi rê ketin. Cemedên ku heqîb tijî kiribû paqên min û herdû aliyên Bozê hênik dikir. Heta ku em gihîştin gund Bozê ji hal ketibû. Mala me li dawiya gund bû. Min berê Bozê dabû nav gund. Li nava gundê me kaniyek avê hebû. Tebabek pîrek li ser kaniyê bû. Dema ku ez ber bi wan hatim çend heb ji wan hatibûn ba min. Hinek ji wan xizmên me bûn jî.

"Zahîd hela bisekine. Çi di heqîba te de ye?"

"Cemed e… Min ji gundê apê xwe aniye."

Peyva cemed ji devê min derket û pê ve hemû pîrek li ser serê min civiyan:

"Hela ka qalibekî bide xaltîka xwe."

"Hela qalibek ji bide meta xwe…"

"Ji amojna xwe re…. Ji xalojna xwe re…"

Piştî ku hemû pîrek belav bûn û pê ve carekê min nêrî ku di heqîba min de tiştek nemaye. Ligel mala me cîranên me jî li benda cemedê bûn. Êdî ro li ber êvarê bû. Cacik, xoşav û ava di surahiyê de li benda cemedê bûn. Lê…

Ez ber bi hewşa mala me ketim. Ez wekî lehengekî di herbê de têk çûbe, mirûzê min daketî, rondikên min her dibariyan…

Bavê min li ber derî bû. Dê biçûya camiyê:

"Çi bûye lawê min?"

"Yabo pîrekên li ber kaniyê hemû cemeda min ji min sitandin…"

"Tişt nabe berxê min tişt nabe! Hewcedariya wan jî wekî me bi cemedê heye. Qet xemgîn nebe!" got.

PÊNÛSA MIN

Emîn AGAHDAR

Pênûsa min badê hewa bi salan e dilêrîne
Ditirsîne û dişkîne ji kul û xeman dilorîne

Bi şev û roj û bi kelecan reşa li spiyê datîne
Wuhareng her roj min bi valî û walî dibû tîne

Êş im ez keder im ez te'z kuştim bes bisotîne
Heta kudê di destê xwo tuyê min her bigevzîne

Beske qêrîn li te nayê reş û tarîyan vegerîne
Bugherîne nalînan de ka carek ji bo min tu bibişrîne

Ma ne bes e li dinyayê ji hesretê lew hey nalîne
Serê xwo rake ji xewên tarî û carek êşan bikewîne

Di beroşa xwo tenê carek 'id û 'erfatan bikelîne
Bibe Xizir bibe İlyas bibe 'Îsa û bes binalîne

Belê pênûsê baş dizanim ku em paş de mayîne
Welê zanim di vê rê de derdê me hew nezanîne

XÛLÛSÎ ABÊ: YEKEMÎN TELEBEYÊ NÛRÊ

Ebdurrehîm DOST

Zilm, zordestî, mi'ameleya keyfî, jahr kirin, miştextîbûn ji bo di bêdengiyê de bimire û bênav biçe. Anîna van a ziman jî ji me re çiqas zor tê. Lê ev giş hatine serê xwediyê 'esrê. Tabî ev hesabê hin mirovan bû lê belê teqdîr cuda bû. Emê jî behsa jiyana Xulûsî Abê bikin ku jiyana xwe çawa di riya Xwedê (c.c) de, di riya ustadê xwe de derbas kiriye, bi îxlas bi fedakarî. Û heta dawiyê jî di wê îxlasê de dewam kiriye. Xulûsî Abê leşker e. Dema tê Egrîdirê serpel/yuzbaşî ye. Ustad jî wê demê li Barlayê dimîne.

Dema ku ustad peyvên biçûk "peyva yekemîn" dinivîse temsîlatê ji leşkeran dide. Ustad bi xwe dibêje ez jî heyret dimam gelo çima wisa dinivîsim. Min sedama wê nedizanî. Dûre hate bîra min belkî di pêşerojê de ê van peyvan bi heqqî hîn bike, û qebûl bike û li ser bisekine wê ji nav leşkeran derkeve. Ji bo wê ez mecbûr dibûm bi vî awayî binivîsim. Ez li benda wan leşkerên qehreman bûm.

Ew bi xwe hatina tayina xwe ye li Egrîdirê 'tayinbûna ji rîsaleyî nûrê re û ji Ustad re' binav dike. Piştî hatina Egrîdirê salekê şûnde çûye ziyareta Ustad. Dema diçe ziyaretê di rê de gelek fikare tên dilê wî, dibêje ez herim û ew neqenciyên dilê min bibîne, bizanibe û min qebûl neke! Lewra ew di dilê xwe de Ustad mîna şêxê terîqekê dihesibîne. Lê dema dikeve xênî Ustad ji cihê xwe radibe, bi milê wî digre û dibêje "birê min ez ne şêx im, ez îmam im, Mîna îmamê Rebanî, Îmamê Xezalî ez jî îmam im[1].

Ustad bi zaravê xwe dipeyîvî. Dest bi peyvê kir û pirsgirêkên ku di dilê me de, me yê bipirsiya bersivand. A ji wir û pêve bi agirê rasteqîniyê dilê min lê ket[2].



Rojekê min got: Tew ku rewşa 'alemê xirab e jî lê belê dibêjim ew reşahiyana dê belav bibe. Wî jî got "belê kardeşîm belê"

Careke din min got: Heta îro min ehemmiyeta nimêjê wisa tam fam nekiribû, lê belê ehemmiyeta nimêjê çiqas pir e? Dîsa got: "belê kardeşîm belê ziyadedîr."

Ezê biçûma ziyaretê. Min leşkerekî xwe yî ji Elezîzê bi xwe re bir. Ustad pê re bi kurdî axivî û kêfxweş bû. Ji min re got mîna te tabûra xwe giş anîbe ez pê kefxweş bûm.

Min ji Ustad re ew çarîn şandibû:

Ya Resulellah çi başed çûn seg Ashab-i kehf

Dahil Cennet şevem der zumre-i eshab-i tû

O rewed der Cennet, men der Cehennem key rewast

O segê eshab-i Kehf, men seg-ê ashab-i tû

Min digot qey ew çarîn a Şêx Riza Talebanî ye.

1 Bediüzzaman Said Nursi mufassal tarihçe-i hayat, Abdulkadir Badıllıweş: Timaş. Cilda 1. r: 627

2 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r: 627

Lewra dema ku ez li Cepha Qefqasê bûm, zavayê şêx jî sûbay bû. Min ji wî standibû. Min digot ew çarîn çawa ya şêx Riza ye ez lê difikirîm. Demek şûnde ez çûm dîtina Ustad, îcar Ustad ji min re got: Birayê min ev çarîna ku te şandibû ne ya Şêx Riza ye ev çarîn ya Mewlana Camî ye[3]. Û dûre got: Mewlana Celaledînê Romî, Molla Ehmedê Cizîrî û Mewlana Camî meqamê her sêyan yeke[4].

Di ziyereta ewil de ji Xulusî abê re dibêje: 'Elemeta dûrbûniyê, name şandin, adeta min nîne lê belê tu binivîse[5]. Ew jî vê gotinê emir qebûl dike û dinivîse. Di nav van nameyên ku ji Ustad re dişîne de pirsên pir bi rûmet hene, carna pirsên ku jê tê pirsîn ew wan jî ji Ustad dipirse. Ev pirs û bersiv her yek dibe kevirên dîwarê mektûbatê.

Qesîda Hezertî Muhemed Kufrewî

Di ziyereta min a 'ewil de min qesîde da ustad, ustad berçavka xwe ye bi benik girêdayî xist çavê xwe lê nêrî û got: Birê min te ev li ku dît? Ev qesîdeya Muhamed Kufrewî ye û xwend. Hat cîhekî got: Di vir de behsa mirina xwe dike. Min got: Xêra xwe bi ma'ne bike. Wî jî got: Birê min bala min a niha li tiştê din e. Îcar min got: Ez diyarî te dikim. Got: Ser seran û çavan û dûre peyva xwe domand: Li Bedlîsê sê çar şêx hebûn dixwestin ez intisabî wan bikim. Lê belê ew qîmî min nedihatin. Rojekê min seh kir Kufrewî nifir li min kiriye. Min got ezê herim ba Kufrewî. Ez çûm li mizgeftê bi serê xwe berê wî li qiblê, rûniştibû. Ez bê deng çûm li paş wî rûniştim. Şêx nezivirî, peyîvî û go: Tu Seîd î? Min go, erê ez im. Wî got ez xemgîniyê di te de his dikim. Min jê re got min famkir ku tu li min nifiran nakî. Wê demê bang li min kir û ji min re got: Ezê dersekê bidim te. Û dersa ku xwendevanên medresan dema icazetê distîne digrin ew ders da min[6]. Ustad jî ji Xulûsî Abê re dibêje ez jî icazetê didim te.

Nivîsandina Nameya Duyem

Mektûba duyem ji ***salîsen*** dest pê dike. Ew nuxtên heta ***saniyen*** di mektûbatê de nîne: naveroka wan nuxtên di mektûbatê de tune ev e: Xulusî Abê ji ustad re şelwarekî dide dirûtin û dişîne. Û dibejê ez vî şelwarê te û vî ya bi hev re diguherim. Li ser navê min tu didî kê bide. Ustad dibeje, ji însanan îstîxna, baweriya bi tewekulê û îqtîsadê ez bi vî awayî 'emel dikim. Birê min li hember diyariya te ye maddî, ez jî kişfkirina sirra xwe ye ma'newî diyarî te dikim.

Ey birayê min, min qebûl kir. Şelwarê te yî li ba min ê pêncî pîneyî ez dîsa didim xwe. Lewra kesekî vî şelwarê pêncî pîneyî qebûl bike min nedît jî xwe pêve[7].

Nivîsandina Nameya Sêyem

Ustad di salâ 1930'an de bi vexwandina hinek dostên xwe diçe Çamdagî. Xulûsî Abê jî dibêje: Ez jî dixwazim ji hisên te re bi par bim. Ustad di serê nameya sêyem de wisa dibeje dîsa 'Ji wî telebê tê zanîn re'. Muxatap Xulûsî Abê ye. Ev name ji nuxta pêncem dest pê dike. Her çar nuqtê berê di mektûbatê de derbas nabin. Di serê nuqta pêncem de wisa dibêje: Te xwest ji hisên min re bi par be. A ji te re ji hezarî yekê his bike. Ustad li Çamdagî, dinê mîna merkûbekê dibîne û his dike. Wek mîna li wasîtekê siwar bûbe û ew wasite bi hêlve diçe. Ew jî dinê mîna wasitakê bi hêlve diçe dibîne û xwe jî siwarê wê wasitê dibîne û Ustad jî wê duayê dixwîne.

Ustad di nuxta pêncem de dibêje: Min xwe di fezaya kaînatê de di keştiyek zû û pir mezin de di qada bilind de dît. Mijarên wan nuxtên nehatiye nivîsandin rîsalê ye.

Di nuxta duyem de -ya di mektûbatê de nenivîsandiye- ev tiştê balkêş derbas dibe. 'Ecêb e ku piraniya ilmê Seîdê berê ku heqîqet bi aqil fam kiriye, birayê te ev bi şahidiya qelb û bi nûra ûjdan ditiye, ev herdû famkirin dibin wek hev. Lêbelê 'ecêb e ku aqil û qelbê herdu Seîdan vê derecê dibin yek[8]. Ev tîştên mahrem bi Xûlûsî Abê re parve dike.

Mektûbâ pencem jî mûxatab Xulusî Abê ye.

3 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r :630
4 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r :630
5 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r: 628
6 Hulusu YAHYAGİL – Nur'un Birinci Talebesi- İhsan ATASOY- r:52-, 60
7 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r:77
8 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r:81

Negot Bifiroşe

Muhacir Hafiz Ehmed li Barlayê di dikana xwe de ji bo zarokên dibistanê şoqa difroşe. Ustad ji ber dikanê re derbas dibe. Dipirse: Hafiz ev çi ne? Ew ji bo zarokên dibistanê ne. Ustad jî dibejê. Wan bavêje. Hafiz Abê jî bêteredut wan davêje. Ê ku vê rewşê dibînin diheyirin. We, we Hafiz tu çer dikî! navêje tew nebe bifiroşe. Ew jî vê bersivê dide: Ji min re negot nefiroşe got bavêje[9].

Di şûna Ebdurehman de

Dema wefata Ebdurehman Abê, li dema telîfkirina peyva 32(sî û duyem) rast tê. Ustad xemgîniya ku ji wefata Ebdurehman Abê his dike û hejandina dil û laşê xwe tîne zimên. Li ser vê wefatê ji Xulusî Abê re dibêje: Lêbelê birê min a niha tu bi du wezîfan wezîfedar î. Yek jê ya Xûlûsî ye, ya din ewladê min ê ma'newî û biraziyê min, îhtimal hebû ku bibûya hişmendekî nûranî, wezîfa wî jî kete ser milê te..

Ew warisê min yê heqîqî bû. Nivîsê min û malê min mîna yê xwe dizaniya û werê xwedî le derdiket. Tu jî ji niha û pêve nivîsan û Peyvan, nivîsên xwe, malê xwe û peyvên xwe bizane û welê xwedî lê derkeve.

Xaîleke Xûlûsî Heye[10]

Di 1938'an de hatibûn wezîfedarkirin ku serîrakirina Dersimê biheciqînin. Tiştê jêre digotin îsyan jî, çend gundiyên di nava çiyê kaçorên xwe nedabûn. Li ser vê jî emrê ku ji me re hatibû dayîn bi peyvekê tenê qirkirin bû. Tiştekî zindî nehêlin. Ciwan – pîr, zarok – pîrek tiştekî nehêlin.

Ez jî serleşkerê qit'ê bûm. Wezîfa zor dane min. Gotin tu piyade yî, divê em te bi topan taqwiye bikin. Mezinê me digotin divê hûn qira wan bînin. Heta wê demê min di gelek cephan de bi neyarên bi çek re herb kiribû. Leşkerek wê çawa mirovên bêçek, masûm bikujin? Ji bo vê ez di nav xemgîniyek û izdirabek pir mezin de bûm. Lewra li Çeneqelê li hember Firansiz û Îngilîzan, li Qafqasê li hember Rûsan min şer kiribû. Lê belê ev kî ne, ne siwar in ne çepûlcî ne? Di vê hemberiyê de dibe ku ji her du aliyan jî yek bê kuştin. Yek jê bê kuştin wê çi bê hesêb?

Îmkan tunebû min hundirê xwe ji yekî re vekira. Min xatir xwest ji bav û mezinên li der dora me. Ez li hespa xwe siwar bûm, bi rê ketim. Min lê nêrî xizmetkarê min zerfek di dest de ye, ber bi min dibeze. Min zerf vekir wisa nivîsîbû:

Salîsen: Xaîleke Xûlûsî heye ez his dikim. Bila meraqan neke, şagirtên Rîsalê di bin parêzê de ne, rehmet li ser wan e, wan diparêze. Zehmetên dinê xêr e, derbas dibin. Li hember wan mûsîbetan bi sebr bişikirînin, bi zexmiyê li hember wan werin.

Dinê bidana min ez ewqas pê kêfxweş nedibûm. Welê ewlehiyek hate min, min maç kir û danî ser serê xwe. Min ew xist paşla xwe. Cihê Xûlûsî Abê lê wezifedar e, li Dêrsimê xelk berî wî ji wir reviyan. Xûlûsî nakeve nav tu şer û kuştinan bê kuştin û şer wezîfa xwe bi cîh tîne û vedigere.

Lê belê herkes mîna Xûlûsî ne xwedîşans e. Ustad li ser vê bûyera zilm û zordestî li dadgehê bersiv daye. Em dixwazin wê mudafayê bi bîr bînin. Ustad bi navê 'di dadgeha mezin de şikayet' neh maddeyan dinivîse û dişîne.

Di dadgeha Efyonê de Ustad bi saetan li sawcî guhdarî dike û dûre nahêlin Ustad xwe muda'fa bike Ustad pirî pê diêşe û wisa dibêje: Seba ku têkilî bi siyasetê ve heye û yê ku em mahkûm kirine ji bo xatirê Rîsalê mut'ala dikin û ji bo zêde nexeyidin min nenivîsî. Wê maddeya ku dibêje min nenivîsî (bi ma'neya neweşandinê) vê maddeya nehan e û têde behsa ev zulm û zordestiyên ku li Dêrsimê hatiye kirin dike.

Maddeya nehan[11]: Qererdayîna di 'aleyhê Seîd û nûrciyan de di rûpelên pêncî û heftan de ji bo ku me mehkûm bikin ji fikrên dawîn yek jê ev e: Amîr û memûrên zagonên dewletê tetbîq dikin û muariz û mixalifan teslîmî pençê dadê dikin, Seîd Nûrsî van mar, zindiq, qominîstê xef, neyarê dewletê, mulhît û munafiq binav dike ku em jî wî mehkûm dikin.

Li hember vê gotina van hinek telebên nûrê wisa

9 Jêdera berê- weş: Timaş. Cilda 1. r:57

10 Bediüzzaman Said Nursi mufassal tarihçe-i hayat, Abdulkadir Badıllı- weş: Timaş. Cilda 1. r:919

11 Hulusu YAHYAGİL – Nur'un Birinci Talebesi- İhsan ATASOY- r:109

bersiv didin: Di sala 1938'an de facîa Dêrsimê ku, di mecmûa Doğu hejmara 17'ê de bi serlewha "doğu facîasî" ev bûyer bi temamî nivîsî ku, zindiqtiyek, minafiqtiyek, li millet û memleket neyartiyek bê-hesab hate kirin. Bûyera mîna vê li ser rûye erdê çênebûye, bi vê hate îspatkirin. Helbet ji memûran zêdetir canî û wehşî, hezar carî zindiq, qominîstê xef, bêdîn gotinên wîsa ne ku sûc in, bîlakîs divê hûn van peyvan tesdîq kin û teqdîr kin. A Seîd ne ji hemiyan re lê ji yê wisan re zindiq, minafiq gotiye.

Dîsa dewema maddeya nehan de sawcî îddia dike ku di şûaya pêncemîn de Bedî'uzzeman dibê-je: Sufyan bi zordestîyê şewqe dide serê merivan û ji bo vê bi zilm û zordestiyêk wisa hereket dike ji bo neqenciyekê dikare sed gundî xerab bike û hezar mezlûmî qetil bike. Ji bo vê îddiayê Seîd di aleyhê me de ye.

Li hember vê îddiayê gotiye: Tesdîqkirina wê meselê, ji sed işaretan yek jê bûyera Dersimê ye he-zer mesûm, pîrek, îxtiyar hate kuştin, hem jî avêtine êgir. Bi gumana serhildanê ev zilma we bi kar anî ji hukmê şûa 5. re bes delîl e û dixe çavan.

Çend peyvên pîvan:[12]

Abê filankes di 'eleyhê te de ye hat gotin:

Wî jî got:

- Ew nimêja xwe dike
- Erê
- Rîsalê dixwîne
- Erê
- Ê bira di'eleyhê min de be.
- Hemiyet, mihafazakirina olê, namûsê, şerefê û 'ilmê heqîqî ye.

Ez di nav we de bi 'emr ji we mezintir im û pîrtir im. Eger ji min bipirsin bêjin peyveke te ji me re heye ezê bêjim: Herin dersê û Rîsalê bixwînin.

- Wextê me ji meşxûliyeta rîsale pêve ji tişkî re tuneye wextê me hebe emê dîsa bi rîsalê ve biştexilin.

-

- Rîsala biratîyê ta'lîma hundir e.
  Tiştê ku zêdetir li ser disekinî îxlas bû.

Dianî zimên: Risala îxlasê esas e, rîsalê din wê temam dike. Didomand, hûn dikarin bejin min dîn bûyê, dînê îxlasê ye, hûn çi dibêjin bibêjin îxlas ji te-lebê rîsalê cuda nayê hesibandin. Mirov libasa xwe ji xwe bike tê çi halî 'eynî wilo jî yê ji îxlasê dûr keve tên wî halî.

-Ez ne 'alim im. Ez xizmetkarê rîsalê me. Xizmetkarê Qur'anê me. Ez zilamekî di rêzê de me. Ez ji acziyeta vî halî razî me. Hûn şahid bin, padîşah-tiya dinê bidin min ez bi vê rewşê naguherim.

-Hûn min perçe perçe jî bikin ezê di vê riyê de bimeşim.

12 Hulusu YAHYAGİL – Nur'un Birinci Talebesi- İhsan ATASOY-

HESABÊ DU DÎRHEMAN

A. Hakim ERGİN

Artêşa Îslamê nîzama rêketinê standibû û li benda Sultan sekinîbû. Beriya ku çadira sultan vebe û sultan derkeve, pêlek kete leşker. Tevliheviyek kete derdora konê sultan. Leşkerên rasterast hatibûn rêzkirin hema di cî de kom bûn.

“ Tu niha nikarî wî bibînî ” digot bi dengekî xurt, leşkerekî.

“Niha ne dema dîtina te ye pîrê!”

Pîrê bi wêrekî dengê xwe bilindtir dikir û digot “ Ez ê bibînim, ez ê sultan bibînim! Ka hûn nahêlin ez wî bibînim! ”

Di nav leşkeran de serê gopalê pîrê yê dirêj xuya dikir. Rûyê wê di nava salên dûr û dirêj qurmiçîbû. Di kurahiyên çavên wê de agirê hêrseke nû peyda bibû. Hem diqêriya hem jî gopalê xwe li pêşiya xwe rast û çep dihejand û riya xwe vedikir.

“Ez ê bibînim“ bi dengekî bihêrs û bilind “ez ê sultan bibînim, ka çi sultan e”

Sultan Selaheddîn dema rewş fêhm kir ferman da:

“Berdin bila were.”

Jina pîr li hember sultan sekinî, gopalê xwe rakir û çavên xwe gerandin:

“Ji we kîjan e sultan?”

“Ez im ” got Sultan Selaheddîn, “ ma daxwaziyek te heye Pîra min a delal?”

Rasterast li çavên sultan nêrî:

“Min digot qey ez ê rastî yekî pîr werim, lê belê bila bibe. Tu çiqas xort bî jî divê tu halê xelkê xwe fêhm bikî, di hawara wan de biçî, yan na tu yê çima



li ser serê me bibî sultan.”

“Em ne li ser serê tu kesî ne pîra min a delal “ got Selaheddîn “ em xizmetkarê milletê xwe ne, em bi vî rengî xwe nas dikin.”

“Tu çawa xwe didî naskirin bide naskirin, ji min re qet girîng nîne, ger tu sultan bî sultaniya xwe rast bimeşîne.”

Ew kesên li der dorê matmayî man. Gotinên pîrê mîna gopalê wê xwar û çewt bûn. Li rûyê sultan nihêrîn, li ser rûyê wî ne qehr ne ji nuqteyek kibr hebû.

“Em dibêjin qey em rast dikin. Ger xwariyek, nerastiyeke me heye bila li rûyê me were dayîn.”

“Erê! Jixwe ez ji bo vê yekê li vê derê me, da ez li rûyê te bidim. Tu kesê min tune ye. Bi tenê du bizinên min hene. Ez carna şîrê wan difiroşim û rizqê gewriya xwe ya kor peyda dikim. Temenê min bi duakirina ji sultanan re derbas bû, xweş, min rûyê wan jî nedîtiye. Sultanê ku cara ewil ez dibînim tu yî. Bi rastî min tu dîtî û min ji te hez kir. Lê belê tu çima li leşkerê xwe xwedî dernakevî, ger tu yê xwedî dernekevî, çima xwe li sultaniyê digrî.”

“Pîra min a delal ka derdê te çî ye bêje?”

“Ma wê hê çi bibe! Çend ro berê leşkerekî te hat gund, ji min şîr xwest, got buhayê wê ev e û du pere dan min. Vaye ew pere!”

Destê xwe yê rastê ji nav entariya xwe derxist kulma xwe vekir û nîşanî sultan da.

“Tu jî dibînî, du pere ye. Ez ji pere meran jî tiştekî pir fêm nakim. Buhayê şîrê min firotî ev be ev e min got. Lê belê duhê leşkerekî din hat û min eynî qasî wî leşkerê berê şîr da wî jî. Wî derxist pênç pere da min. ‘ Lawo te zehf da min’ min got. Wî got ‘ na ne zêde ye, buhayê şîrê min standî evqas e”

Dîsa destê xwe ji nav entariya xwe derxist û pênç pere nîşanî sultan da:

“Aha perê leşkerê duyemîn jî ev e. Sultanê min ew leşkerê te yê ewil mafê min xesp dike? Ma te heq çi ye huqûq çi ye nîşanê wan nedaye? Te ji wan re negotiye ku heqê evdan nayê efûkirinê? Ez ev gav şikayet dikim û perê xwe jî bê kêmasî dixwazim. Lê belê vê yekê temahkarî nehesibîne, tu yê xelet bibî. Du sebebê min hene. Yek, ew lawê min ê ewil ez naxwazim bi heqê îbadî here axretê. Dibe ku ew di vê herbê de şehît bikeve. Ya duyemîn, dilê min qaîl nabe ku sultanê min bi wan leşkeran here seferê. Maruzata min ev e, ez li benda hukmê te me.”

Sultan hinekî fikirî. Diviya artêşa Îslamê te’rrûz bikira yan na dibû ku rewş xerab bûya.

“ Tu her hebî pîra min a delal” got. “ Te ez şiyar kirim, a niha destûra me bide û em herin, tu dibînî dijmin li ber me ye. Bi îzna Xwedê sibê were û em

bi hev re wî leşkerî bibînin û em heqê te jê bixwazin û em d'ewa te hel bikin."

" Nabeee!" got û dirêj kir jinika pîr. "Ez nikarim dîsa ewqas rê werim, ez heqê xwe a niha dixwazim, a niha."

"Pîr a min a delal em ê herin meydana cengê..."

"Ka tu li min binêre, baweriya te bi çi tê û tu dîçî herbê. Tu car ji bîr neke ku hesabê wan herdu dirheman dê ji te were xwestin."

Bi gopalê xwe leşker nîşan da û :

"Ma tu ne şivanê van leşkeran î, helbet wê hesab ji te were xwestin. Ez mafê xwe a niha dixwazim."

Pelek agir ket nava dilê sultan. Ger bixwesta dikaribû pîrê li wê derê bida kuştin an jî bi zorê ji wê derê biqewiranda. Na, wî nedikarî bi wî rengî bike. Dibe ku ew li vê cengê şehît bibûya. Wê demê ma wê çawa biçûya huzûra Îlahî.

Serê xwe rakir, çavên xwe yên vemirî da pîrê: " Aha vaye tevahî leşkerê min" got " kî heqê te xwariye em ê wî bibînin, heqê te jê bistînin."

Ev axaftinên di navbera sultan û pîrê de derbas bû di nava leşkeran de belav bû. Di nava leşkeran da xortekî çeleng û jîr derket û hat li ber sultan sekinî û serê xwe nizim kir:

"Ew kesê mafê vê pîrekê xesp kirî ez im."

Te digo qey herkes şeht bibû, nefes hatibûn birîn. Bêdengî. Di binê roja havînê ya herî germ de her kes cemidîbû. Zembereka zemanî şkest û dem sekînî.

"Te çi kir?" sultan got.

"Erê ew e. Min ew naskir." Pîrê got.

Leşkerê xort û çeleng li pêşiya xwe dinêrî:

"Min got qey buhayê şîr ewqas e. Min par ewqas şîr bi du pereyan kirîbû. Dema ez vegeriyam min zanî kû buhayê şîr bûye pênç pere, piştî cengê ez ê biçûma cem pîrê û min ê perê mayî bidayê û helalî jê bixwesta. Ez evqas hûr nefikirîbûm, min xeletî kir, ez musteheqê cezayê xwe me."

"Lawê min" got pîrê bi çavên kelogirî, "Lawê min!"

Berê xwe da sultan:

" Ez ji heqê xwe dibuhurim, sultanê min, min tu pir dadmend dîtî. Ez ê duayên xwe ji vê demê şûnde zêdetir bikim û bişînim dergehê Rebbê xwe. Vî lawê min jî bibexşîne ji kerema xwe re."

"Bi şertekî " got sultan, "bila deynê xwe bide û paşê tu dixwazî tu yê heqê xwe lê helal bikî."

"Min helal kir, sed caran, hezar caran min helal kir. Wek şîrê dayîka wî lê helal be. Min ew efû kir. Hûn jî wî ceza nekin."

Leşkerê deyndar deynê xwe bi tevahî da. Pîrika zana û têgihiştî heqê xwe girt û bi hezar d'uayan bi rê ket û çû.

Sultan jî di kurahiya mejiyê xwe de bi dilekî xemgîn hûr hûr digeriya. Çawa dibe ku di navbera salekê de buhayê şîr ji du peran were penç peran. Bi fikra şer, ceng û cîhadê qet xelkê paş ve mayîn li bîr nedihat, derd û kederên wan hatibûn jibîrkirin. Ev yek nedibû, xeletiyek mezin bû. Fetih kirina bajaran ne merîfet bû. Merîfet parastin, hewandin û perwerde kirina xelkê wan bajarên dihatin fetih kirin bû. Û merîfet dayîna jiyanek liqayê mirovahiyê bû.

"Here ciyê xwe" sultan ji leşker re got. " Ez 'uzrê te qebûl dikim."

Leşker bextewar bû, lewra sultan mezereta wî qebûl kiribû. Lê Sultan Selaheddîn xemgîn û xwediyê sed hizran bû. Ma wî jî dê mezereta xwe bikarîbûya bi Sultanê Sultanan re bidaya qebûl kirin. " Min nedizanî, haya min jê nebû, min nebihîstîbû." Ma ev gotinên wê li mehkemeya kubrayê wê bibûya sedema xelasbûna wî.

"Sefên xwe bigirin" vî dengî esman qelaşt.

Sultan Selaheddîn hinekê lerizî û li ser xwe ve hat û li hespê xwe siwar bû.

"Bimeşin!"

Weke tofanekê bi ser dijmin de çûn...

Gotara Bedîuzzeman a Kurdî

Gotara Bediuzzeman a Kurdî di sala 1908 da, di rojnameya *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi* [1]yê de hatiye weşandin. Orîjînala wê û latîniya wê ev e.

کردو تعاون وترقی غزتەسی

نومرو ۱

بدیع الزمان ملا سعید کردینك نصایحی

ای کافی کردان اتفاقیدقوت و اتحادیدە حیات و دی پرامیدە سعادت و حکومتیدە سلامت هپه . کلیکا اتحادی و شریعتا عجی قوی بکرین دا وەزیلان خلاص کە . فتح کوهی خوا بدەتی ، ازی تشتکی زورا بیژم : هون زانین کوسه مه جوهریاره هەمه مفاخرا ژەه دوخوازین ، پك اسلامیت ، کوهزار هزار خوین شەهیدانه بهای وی دانه . شەهیدوا انسانیت ، کو لازمه ام خودا نظرا خاتر دە بخومتا عقل ، جوامیرانی والمسلمتی اوخوا نشان دون بدین ، شەیطان ملیتامه یه . کو . مزیق دامه ئیری کو بخنجی اوخوا ساغین ؛ اپه کاری خودا بحفظا

نومرو ۷

ملیتا خوا روحه وان تیرا وانده شاد بکین پشتی زی سەدوتی مەعده ، ۰۰ اب دیکین پك فابریکه ، چهل هزار حال استانبولی وایل وی یه شەهیدانه حیاتا خواندنی کو هزار زیدە وایتك وقازانه نیکارین خوانین ایلاوی یه شەیطان ؛ دوزمنی واختلافه کو اف عداوت فرتانه روناهیکه ، مەزی صنعتی تربیه دیکه وحکومتی ؛ تربی المسلمانیا خواتلم اله دیکهر ، کو وه اوه کیر زانین چارەه اوه ، کو ام مه شورا مالی بدەستاوخوا بکرین ، تاکو ابرهمه جوهرا خوازدستاوخوا نکین ، هر یه دوزمنی خوا ، هر خوارا کین وشور عدل معارف وخواندنه شەهیدوین اتفاق وحیتا ملیه . شەیطانه انسانی بنفساخوا شلاخوا ، بیکوبنامیفیلان زقدر تاخلق هیری لکوبه تاخواندنی وحیتا باقی خواندن ، خواندن ، خواندن ودست هف گیرتین ، دست هف گیرتین ، دست هف گیرتین .

ملا سعید

1 Ev rojname (Kürt Teavün ve Terakki Gazetesi), heftê 8 rûpel diweşiya. Di pêncê meha Berfanbar a sala 1908'de dest bi weşanê kir. Birêvebirê rojnameyê helbestvanê Kurd ê navdar Tevfik Begê Silêmaniyeyî, sernivîsar jî ise Ahmet Cemil Begê Diyarbekirî bû. Ev rojname tenê 9 meha hate weşandin. Mijarên çandî û perwerdehiyê ciyekî giring digirtin.

Latînîzeya wê

Bediüzzaman Mela Said-i Kurdînin Nesayihi

Ey Gelî Kurdan!

Îttîfaqê de quwet, îttihadê de heyat, di biratîyê de se'adet, hukûmetê de selamet heye.

Kapika îttihadê û şirîta muhebbetê qewî bigrin, da we ji belayê xelas ke. Qenc guhê xwe bidinê, ezê tiştekî ji we re bibêjim:

Hûn bizanin ku sê cewherê me hene; hifza xwe ji me dixwazin.

Yek Îslamîyet e; ku hezar hezar xûna şehîdan buhayê wê dane.

Ê duduyan însanîyet e; ku lazime em xwe nezera xelqê de bi xizmeta 'eqlî, ciwanmêranî û însanîyetî xwe nîşanî dunê bidin.

Ê sisîyan millîyeta me ye, ku mezîyetê da me; ê berê ku bi qencîya xwe sax in, em bi karê xwe, bi hifza millîyeta xwe, ruhê wan qebra wan de şad bikin.

Piştî wê, sê dijminê me hene, me xerab dikin:

Yek feqîrtî ye. Çil hezar hemmalê Îstenbolê delîlê wê ye.

Ê duduyan cehalet û bêxwendinî ye; ku hezar ji me da yek "qazete" nikarin bixwînin delîla wê ye.

Ê sisîyan dijminî û îxtilaf e; ku ev 'edawet, quweta me wunda dike, me jî musteheqî terbîyê dike û hukûmet jî ji bêînsafîya xwe zulm li me dikir.

Ku we ev seh kir, bizanin çara me ev e; ku em sê şûrê elmas bi dest xwe bigrin, ta ku em hersê cewherê xwe ji dest xwe nekin û hersê dijminê xwe ser xwe rakin.

Û şûrê 'ewil: Me'rîfet û xwendin e.

Ê duduyan: Îttîfaq û muhebbeta millî ye.

Ê sisîyan: Însanê bi nefsa xwe şuxla xwe bike û mîna sefîlan ji qudreta xelkê hêvî neke û pişta xwe nedetê.

Û wesîyeta paşî:

Xwendin, xwendin, xwendin... Desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin...

Bedîuzzeman Mela
Seîdê Kurdî

Çavkanî: Ji arşîva Ahmet Demir

BERPIRSYARÎ

Asiye BOSTANCI

Di zemanê berê, zemanê padîşahan de li bajarekî bi navê Mîrze zilamek hebûye. Bêhna wî gelek teng bûye. Mîrze ji jiyana xwe tamek nedistand û ji jiyana xwe ‘enirî bû. Ji heval û hogirên xwe dûr ketibû. Ne diçû nêçîrekî û ne jî kêfeke wî hebû. Ev rewşa hanê mîr dilteng dikir, wê çawa bikira nedizanî. Mîr her rê ceribandibû lê belê tu çareyek nemabû. Rojekê mîr re hate gotin ku mirovek hatiye bajêr, pir ‘alim û zane ye. Dema derheqê wî ‘alimî de wisa hate gotin, mîr ferman kir, ew zana anîn cem mîr. Mîr hefteyêk mihlet dayê û jê re got; “Heke tu di navbera hefteyekê de çareserîyekê nebînî ez ê serê te lêxim.”

Du sê roj derbas bûn wî ‘alimî tu çare nedît. Mêze kir ku tu çareyê nabîne, ji koşka mîr reviya. Çû nêzîkî gundekî, rastî şivanekî û bira bizinên wî hat. Rûnişt cem û pê re suhbet kir. Piştî demekê baweriya şivan pê çêbû ku ew mirovekî bêzirar û ziyan e, jê re got; “Xalo tu li vir ber heywanên min bisekine, min îro tûrikê nanê xwe ji bîr kiriye. Ezê herim gund hildim û werim.”

Dema şivan çû, zanyarê me kete nava ramanan, ew ramanên ku di hişê wî de dihatin û diçûn ew gêj kiribûn. Bi xwe ev çend roj bûn ji bilî ramanên bêserî tu tiştî wî meşxûl nedikir. Cardin kete nava ramanan. Bizin û karik her yek bi aliyekî ve belav bibûn. Piştî demekê karikeke nehs xwe hilavêt, çû serê zinarekî, ji wir jî berjêrî bintara kendalê bû. Zanyar dema dît ku karik ji kendalê ketiye û dike nake nikare derkeve, dev ji betaliya xwe berda, kete pey xilaskirina karikê. Zanyar mirovekî misilman bû, heq huquq çiye dizanibû, heywanên şivan emanet hildabû û wê xwedî li wan derketa. Lê belê nizabû a niha wê çawa bikira.

Bi tenê çarek hebû, wê berjêrî jêrê bibûya û karik hilda, hêdî hêdi derxista jora kendal. Xwezî kirin mîna fikirandinê rehet bûya, bi wê kaltiya xwe li wî kendalî hêdî hêdî berjêr bû, di nîvê kendalê de çokên wî dest bi lerizandinê kirin, xwêdan ser re avêt. Bi ‘inte ‘int berjêr bû an tilol bû ne kifşe bû. Hema di cihê xwe de rûnişt, hinekî bêhna xwe stand. Te digot qey her alê wî de dukel bilind dibe. Dev û gewriya wî ziwa bû. Çend deqan bêhna xwe stand, rabû karika xwe hilda himêza xwe, destê xwe avête kevirekî kendalê û piyê xwe danî ser yekî din. Ka ew teqet?, nebû. Cardin xwe ceriband, cardin nebû. Ev çi bela bû hatibû serê wî, mîr, kurê mîr, derdê wan û ramanên ku hiş di mejiyê wî de nehîştibû hemî winda bibûn. Di xwêdanê de mabû, ketibû nava xebateke bi zehmet, nexuya û tengezar. Ji xwe re; “Heke qetek hebûya min bi rehetî karika xwe li vir derxista” got. Lê belê li cem wî ne qet ne jî bendekî zirav hebû. Bêhnek kûre kûr kişande nava xwe û subhanellahek bihêvî, ji dil û devê xwe derxist. Kum û şaşika xwe li serê xwe hilda û destê xwe, ew serê ku nava şilatiya xwêdanê de maye miz da. Destê ku hema bi carekê serî heta binî şil bibû daweşand. Cardin destê xwe rakir serê xwe û miz da, lê vê carê destê xwe yê şil li kirasê xwe yî gewr xist. Li kirasê xwe nihêrî, ji xwe re; “ çima nebe, ezê şalvarê xwe jî pêve girêdim, wê çêbe bi îzna Xwedê” got. Ev çend roj bûn kêfa wî bi hezaran kilometre dûrî wî ketibû, qet nedizivirî. A niha cardin vegeriyabû.

Kirasê xwe ji xwe derxist. Xwe berjêr kir, destê xwe avête şalvarê xwe, ew jî ji xwe derxist. Di binê

kirasê wî de kirasekî spiyê din hebû mîna bincilekî bû an jî cilê şevê bû. Di binê şalvarê wî de jî derpiyê wî hebû. Lê belê dîsa jî xwe tazî hîs kir. Hînî wan cilan nebibû, hema bi tenê şev di oda razanê de li xwe dikirin. Anî kiras û şalvar bi hev ve girêda û herdu milê kirasê di navçenga karikê re derbas kir. Te qey digot karik jî ji wî karî betiliye û êdî dixwaze ji wî kendalî derkeve, bê hîs mabû û li wî kalê ku ‘inte ‘int pê ketiye mêze dikir.

Zanayê me serê qeta ku bi kiras û şalvarê xwe çêkiriye da destê xwe û ji bo ceribandineke din xwe bi kendêl ve girt û dest bi hilkişandinê kir. Piyekî xwe avêt, yê dinê rakir ku bavêje, dengê şivan hat; “ Xalooo, xalooo” piyê ku rakiribû cardin danî ‘erdê. Bersiva şivan da, heta şivan hate serê kendal. Şivan aliyê wî kir û karik li wir derxistin, piştre destê xalo girt û ew jî ji kendal derxist.

Zanyarê me ketibû derdê karikê. Mîr, kurê mîr û ev belaya ku serê wî hatibû girêdayî ji bîr kiribû. Ew bûyera ku demek bû hatibû serê wî nîşanê wî kir ku mirov bi tiştekî meşxul bibe derd û kulên xwe ji bîr dike. Hema di cî de rabû, xatirê xwe ji şivan xwest û kete rê, çû cem mîr.

Ji mîn re got; “ Min çareya derdê kurê te dît, kurê te mirovekî bêkar e, û tu meşxuliyeteke wî tune, berpirsyariya wî jî tune. Mirovên ku bêkar bin derd û kul dibine hevalê wî. Heke tu karekî bidî wî û ew bibe berpirsyarê wî karî û bi wî re meşxul bibe wê ev derd û kulên wî hemî winda bibin. Kurê te jî wê kêfxweş û bextewar bibe.”

Di zemanên berê de di malbatekê de ji bavê bigre heta zarokê biçûk hemî dixebitîn û herkes karekî wan hebû. Di nimêja sibehê de radibûn dixebitîn heta roj diqulibî. Ji bo derd û kulan û ji bo xeberdanên wala wext tunebû. Ji bo wî însan bi dil rihet bû û jiyîna xwe tijî tijî derbas dikir. Bêhna hemî tiştan distand, rengîniya hemî jiyanê didît, tama avê hildida û hebûna xwe hîsdikir. Nexweşî kêm û çûyîna doktoran jî hindik bûn. Kul û derd berê jî hebûn lê belê ta’m û bêhna jiyanê jî hebû û çawa ku di hertiştî de bereket hebû di jiyanê de jî bereket hebû. Sedema wê bereketê bi tenê xebat nebû lê belê ew jî sebebeke mezin bû. Ji bo wî divê mirov tu demê xwe betal nehêle. welhasilê kelam çavkaniya xirabûyînê û nexwaşiyan betalbûn e.

PÊLÎSTIKÊN MIRINÊ

Mustafa acar

Li pê deriyên mohrkirî
Li pê kuçên bê dawî
Ewr hebûn mîna qetranê
Zarokekî destên xwe yên bi herî dimalaşt
Û bi wan hêsirên sor...
Destên şil diêşandin hinarikên ziwa
Dilê hilweşiyayî dişewitî
Bi malaştinê mijank giran dibûn
Û ew ewrên tê de
Palikek ziravokî serîkî mîna nexşeyên dinya têkel ditewand

Nabe...
Roj di berîkê naçe ava
Stêra rijyar bûye diravên hûr
Berik jî bîrên bêbinî
Nuqitek ji hêsirên çavan
Vebeyînên hezar rojî ye di rojên şaşo mayî

Dinya wî gerdûnek hovî ye
Û atmosfera wê dorpêçkirî ye bê hiş...
Çiqas destên xwe dirêjî stêrkan dike
Baqekî hildigre ji pêçên qutkirî

Ewrên bêwijdan hidilweşiya bi ser hilweşînan
Peymanekê gotinek dixemiland
Û sondeke bê dengî...
Û diyariyên ewran bû zimanekî hunerperwerî
Yekî li gor xûyên herkesî û her tiştî
.....
Dema çav dihate girtin dil bi merhebayan li hişyarbûnê vedibûn
Noşî can be...
Noşî can be ji te re zaroko!
Ma wê para me jî nekeve şerbeta şehadetê
Qe nebe firek...

MEDRESE: ENSTÎTUYÊN ZIMANÊ KURDÎ

Selam ERTEKİN

Li Zanîngeha Çewlikê Fakûlteya Îlahiyatê sempozyûmek li ser medresan hat li dar xistin. Di vê sempozyûmê de bi Tirkî, Erebî, Farisî, Kurmancî û Zazakî bîst rûniştin pêk hatin û bi tevahî heştê û pênc danezan hat pêşkêşkirin.

Di vê sempozyûmê de gelek mijar li ser medreseyên Kurdistanê bûn bi awayê ku min fam kir medreseyên Kurdistanê di sedsala dehan hatine avakirin û heta îro hatiye. Digotin dîroka medreseyên Kurdistanê di dema Selaheddîn Eyyûbî de belav dibin û zêde dibin. Di vê demê de li medresan zimanê perwerdahiyê dibe kurdî, bi destûr û bi tawsiya Selaheddîn li herema Kurdistanê weqf û medrese tên avakirin û zêde dibin. Di nav kurdan de belav dibe û ji Kurdistanê gelek Zanyar, Seyda û Mele derdikevin. Beriya Selaheddîn li medresan zimanê perwerdahiyê erebî bû ji ber vê yekê gelek zanyarên Kurd wekî Ereb dihat nasîn.

Beriya herba cîhanê ya yekemîn gelek medreseyên Kurdan hebûn. Medrese, cihê ku ders lê dihat dayîn wek îro em bêjin enstituya îlahiyatê yan jî fêrgeh. Di vê sempozyûmê de navê medreseyên navdar ku derbas bûn ev bûn: li Cizîrê medreseya Sor ya Mîrê Botan, li Muksê medreseya Hesenê Welî, li Wanê medreseya Şîkal, li Bilîsê medreseya Xeyda, Mûş, Oxîn, Farqîn, Amed, Tîllo, Musil, Zaxo, Axtepe, Tillo, Colemêrg, Bazid, Badînan, Hewlêr, Birîfka, Hamîdiyê û hwd.

Bi avakirina Cumhûriyetê medreseyên rojava hatin girtin, ê rojhilat bi qanûna Tewhîd-î Tedrîsat (3 Adar 1924) hatin girtin û hatin qedexekirin. Tevlî qedexekirinê, tevlî zilm û zordariyê jî li Kurdistanê medresan di bin zordariyekê bi awayekî neeşkerane perwerdahiya xwe berdewam kirin. Em dikarin bêjin medreseyên me ketibûn bin erdê. Sazûman û sîstema nû ya dewletê xwes ku perwerdehiya dînî, û zimanê kurdî bidin ji bîr kirin. Bi van polîtîkayan, bi zor û zextan bi hincet êrîşî ser medreseyan dikirin. Seyda, Mele û feqî digirtin, mişextî dikirin,



ew dixistin girtîgehan û bi piranî jî ew dadiliqandin. Bi çi zor û zehmetî ew pirtûkên ku nîvîsandibûn hemî berhev dikirin û dişewitandin.

Rejîma nû baş dizanibû çand, huner, wêje, dîrok û hwd di van medreseyan de dihatin dayîn, dihatin zanîn, dihatin gotin û dihatin nîvîsandin. Bi vê awayî îro bi taybetî jî zimanê Kurdî heta îro li ser piyan maye. Li wan medreseyan tenê zimanê Kurdî nedihat bi kar anîn; zimanê Erebî, Farisî, Rûsî û zimanê Rûmî jî dihat bi kar anîn. Lê Kemalîstan ev baş fam kiribûn û dixwestin vê hereşê ji holê rakin.

Di sempozyûmê de axaftevanekî li ser medreseyên Axtepeyên agahî didan. Ev zat lêkolînerê zimanê Kurdî Zeyneabidîn Zinar bû. Li medreseya Axtepeyê pirtûkên di hundirê medresê de tevan derdixin bêndera gund li ser hev dicivînin, gazî gundiyan dikin, wan li derdora wan pirtûkan dicivînin û ji wan re dibêjin li çepikan xin û bi vî rengî agir bi wan pirtûkan dixin û hemiyan dişewitînin. Li gelek medreseyên Kurdistanê jî pirtûkê wan derdixin û wenda dikin, hê îro li rojava pirtûkên Seyda û zanyarên Kurd derdikevin holê.

Tê fêmkirin ku medreseyên Kurdistanê ne ciyê perwerdahiya olî û ziman tenê bû, pirsgirêka civakî, siyasî, aborî û ciyê ku dewlet nedigihîştê yan jî nedixwest xwe bigihîne otorîteya wê derê jî kontrol dikirin. Mirovê ku ji terefê dewletê nedihat nasîn xwe li medresê digirtin, mirov an jî eşîretên ku di navbera wan pirsgirêk an jî xwîndarî hebûna Seydayên medresan çareser dikirin. Di dadgehên Tirkan de Turkî mecbûrî bû ji ber vê yekê yê ku bi Tirkî nizanibûna bi peran wergêr digirtin ji ber vê gel ji bo pirsgirêkê xwe çareser bikin diçûn medresan li ba Seydayan çareser dikirin. Di medreseyan de perwerdehî jî belaş bû. Ji ber vê di nav gel de pêşbazî hebû. Yê ku medrese xilas bikirana di nav civakê de xwedî qîmet bû. Ji ber vê gel li medreseyên xwe xwedî derdiketin, ji xwarinê û heta cilan ew pêşwazî dikirin. Di dîroka Kurdan de serhildanên Kurdan piranî ji medresan derketine.

Di sempozyûmê de li ser dîroka medresan, perwerdehiya medresan, li ser hinek medreseyên taybet, li ser hinek zanyarên medresan, li ser rojaneya medresan, zimanên perwerdehiya medresan, çima îro medrese di vî halî de ne û hwd. mijar hatibûn neqandin. Kêmasî û zêdetirê wan çi bûn hatin nîqaş kirin. Bi rastî ji bo min sempozyûmek gelek taybetî bû û zahf bi adan bû.

DÎSA BIHAR

Vaye dîsa vebû bihar
Sorgul û nêrgiz hatne xwar
‘Erd û ezman tev bûn sitar
Kes nemaye bê ciy û war

Her kesekî ra xweşhalek
Di her malê da dermalek
Roj û meh havîn di salek
Vaye dîsa hate bihar

Vê biharê em mest kirin
Bi dil û can sermest kirin
Ji nû ve em dilbest kirin
Vaye dîsa geş bû bihar

Bihar bê jan û xem vebû
Bê te’m û bê hêvî nebû
Her çi kêfxweşî pê rê bû
Vaye dîsa vebû bihar

Hûrik hûrik bilezûbez hat
Di kaşan da weke pez hat
Roj û şev her nefes hat
Vaye dîsa kenî bihar

Emin AGAHDAR

DI RONAHÎ YA AYETAN DE HORMON û OBG

Mustafa ACAR

''Û (bi bîr bînin) dema we got: ''Mûsa! Qet hewya me liser xwarineke tenê nayê, vêca tu ji ber me ve ji Perwerdekarê xwe bixwaze bira ji me re tiştê zemîn hêşîn dike, ji baqlan û xiyar û sîr û nîsk û pîvazê wê, derîne''(Mûsa) got: ''Ma hûn dixwazin tiştê çêtir bi tiştê jê kêmtir biguherînin? Hûn dakevin Misrê, êdî bê guman ji we re tiştê hûn dixwazin heye.'' Bêrûmetî û xizanî li ser wan hat lêdan û ew bi xeşma Xuda vegeriyan. Evê han bi sedema ku ew bi ayetê Xuda kafir dibûn û bi neheqî pêxember dikuştin. Evê han, bi sedema bê fermanî dikirin û ew hey ji hedê xwe derdiketin.''(Beqere:61)

Ev ayeta kerîm ya me meala wê li jor da, ayetek girîngbûna lipêçûna pêxemberan dide zanîn. Her wekî tê zanîn Benî İsraîlî di dîroka mirovahiyê de yên herî isyankar in. Çawa ku Xwedê(c.c.) di zaf ayetan de vê rastiyê ji me re dibêje.

Îlhamên ayetên Qur'ana Pîroz ta qiyametê naqede û wê her dem li gor her zemanekî ji mirovatiyê re tiştên ku ji wan re pêwiste bibêje, da ku mirov ji nexweşî û xirabiyên wî zemanî xwe biparêzin. Lê heke mirov peyvên Xwedê (c.c.) fahm nekin û wateyên li gor zemanê xwe nebînin wê têkevin tora Şeytên û wê bi kafiran bên xapandin û her dem di her tiştî de wê dijminên Xwedê bişopînin.

Weke ev ayeta jor jî dibêje, cihê İsraîlî lê bûn fêkî û çandinî lê nedihat lê Xwedayê mezin tiştên ji wan baştir û bi fêdetir-goştê sûsikê û gezo-ji wan re dişîne, ew bi vê qayil nabin û fêkî û çandiniyê dixwazin û heta paşiya meselê…

Weke tê zanîn aniha jî (bi zanebûnî) İsraîlî û (bi nezanî) pirrên gelan bi ni'metên Xwedê qayil nabin loma jî xwarinên ne tebi'î derdixin holê. Mînak, çawa ku li Tirkiyê jî gelek nîqaş li ser hate kirin û peyv hate gotin û nivîs hate nivîsandin ku çandiniyên bi hormon û OBG(organîzmayên ku genetîka wan hatine guhertin), çiqas bi fêde ye û çiqas zirar e? Bersiva vê pirsê di vê ayetê de ye. Ji bo em bizanibin bê ka OBG an hormon baş e an ne baş e, tenê ev ayet bes e.

Heke ev çandiniyên bi vî awayî wiha dom bike weke pispor dibêjin wê bizir û tixûmê zahf çandiniyan nemîne û dinya dê bêçare bimîne û serpêhatiyên İsraîliyan yên berî niha bi esran wê dubare bibe û dê bi serê dinyê de were (Xwedê neke). Lewra gava afirandina Xwedê bê guherandin wê Xwedê jî guherîneran biguherîne.

İsraîlî beriya dakevin Misrê çiqas çandinî tunebe jî ne bêrûmet bûn û xizantî bi ser wan de nehatibû. Piştî neqayilbûna ni'metan, zemanekî bi daketina Misrê re rehetî dîtin û maldar bûn lê vê dom nekir û bêrûmet bûn û xizantî bi ser wan de hat.

Ayet hemî bi wateyên xwe yek bi yekê girêdayî ne. Li pey vê ayeta şêst û yekê, di ayeta şêst û pêncan de Xwedê dibêje: ''Sond be we, ên ji we ku di roja şemiyê ji hed derketin baş dizanî; êdî me ji wan re got ku; ''hûn bibin rezîl û riswa''. Ne dûr e ku gen/biy ên mirovan bi sedema xwarinên bi hormon bê guhertin û şeklê zarokên ji wan çêdibin jî çend sal şûnde bêguhertin. Li ba min ew bêrûmetî meymûntî ye û meymûntiya vî zemanî wê biguhertina gen/biyan çê bibe û xizantî bi hindikbûn jî an jiholêrabûna tixûman wê bê serê mirovan.

Bi cih anîna emrê pêxemberan di tu zemanî de wekî vî zemanî girîng nebûye. Çawa ku, cihana rojava bi deîzmê yanî bi baweriya Xwedayek bê pêxember ji rê derket û bi pozîtîvîzm û marksîzmê ev deîzm guherî bû ateîzm, paşê jî gelek exlaqê xirab kete nav wan û ji bo îxtirasên xwe yên bi mal û milk û mekan û şehwet têr bikin berê xwe dan neheqî û zilm û şiddetê, fitne û fesat derxistin holê; misilman jî heke mesaj /hinare yên pêxemberan fahm nekin û wan neşopînin û werin lîstika Rojava û İsraîliyan-Xwedê misilmanan bi parêze- wê serpêhatiyên Rojava yên wan esrên borî û yên Îsraîliyan ên demên berê bê serê wan jî. Ji bo em xwe ji van biparêzin, pêwiste pêşiyê em gotin û kirinên pêxemberan bişopînin û duyemîn jî em xwe ji xwarinên bi hormon û ji OBG'yan mihafize bikin.

SÎR

Alameddin ERTEKİN

Bi kurmancî navê wi: Sîr

Bi Latînî: Allium sativum

Bi Tirkî: Sarımsak

Bi ‘Erebî: Sewm

Bi Ingilîzî: Garlic

Danasîn:

Sîr nebatek ji malbata pirasan e û pismamê pîvazê ye. Pelên wê 15-25 cm dirêj dibin, zirav, rimane û kesk in. Qurmê wî di nava axê de wekî pîvazekê ye, di her pîvazekê de di navbera 13-20 tuzi hene. Ji wê pivaza tuzikiri re ‘sîr’ tê gotin.

Welat û dirok

Welate sîrê baş naye zanin, lê wisa tê bawerkirin ku başûrê Asyayê ye. Tê gotin ku Misriyan 2500 sal berya mîladê, ji bo ku paleyên piramîdan çêdikin nexweş nekevin, sîr didane wan.

Naverok: Magnezyûm, Potasyûm, Selenyûm, Çînqo, Fosfor, Qarbonhîdrat, Hesin, Runen eter (alliin, alicin, ajoen), rûnên bi kukurt e ku bêhne dide, witamînên A,B,C,E

Gotinên zanyaran û pisporan der bare sîran de pir balkeş in; Prof.Dr.İbrahim Gökçek dibeje: Di van 20 salên dawîn de li ser sîran ji 2.500 î zêdetir lêkolîn û ceribandinên tedawîkirinê li klînîkên zanîngehan û nexweşxaneyan pek hatine; di encaman de tesbît bûye ku kapsul, heb, rûn û sîrê xav kolesterole, lipid, trigliserit û şekir daxistiye. Pêşiya girikbûna xwînê, hişkbûna rehan û tansiyona bilind girtiye.

Prof.Dr. Ahmet Maranki dibêje: Sîr, di hundire xwe de, maddeyen antîbiyotîk, şekir, esansên dijwar, witamîn A,B,C, îyot, kukurt dihewîne. Bandora wê ya herî girîng ji bo mirovan ew e ku bedenê zindî dike/dihêle. Ji ber ku miqropkujek bihez e bedenê ji gelek cureyên nexweşiyan diparêze. Di dema belavbûna zekemê de hewce ye zede bê xwarin.

Bikêrhatin:

1-Bandora xisardayina cîgerê kêm dike,

2-Li hember hemû cureyên jehrîbûnan bibandor e,

3-Şekirê xwînê kêm dike,

4-Li hember penceşêrê bibandor e,

5-Pêşiya tîrbûna xwînê digire û hişkbûnên rehan kêm dike,

6-Kelmêş û heşeratan ji bedenê dûr dixe,

7-Sîstema ji reh/tamar û tevgera xwînê sererast dike,

8-Pêşiya hemû cûre zekem, şewb û persîvan digire,

9-Hêz û enerjiyê dide bedenê, Zixte (Tansiyon) siqal dike û hêza zayendî(cinsî)zêde dike,

10-Pişik, melak(kezeb)kîsika sefrayê û dil bihêz dike,

11-Hûr û rûviyan paqij dike, ji bo astım, bronşît, janazirav(werem) bêhntengî, bawîbûn û kuxikê bi-fayde ye,

Kerhatina rûnê sîran;

1-Ji mikrobkuştinê re zede kujardar e,

2-Kolestrolê dadixe,

3-Dil bihêz dike;

4-Ji bo ketina kurman li nav rûviyan dibe alîkar,

5-Belxemê davêje,

6-Li hember weşîn û şkestina por bifayde ye,

7-Ji bo tedawikirina nexweşiya nemayina por û antiseptikê tê bikaranîn ji bo difterî, tîfo û hemû nexweşiyen ji sermayê tên pir baş e,

8-Kevirên mesanê dixe,

9-Peşiya çêbûna kevirên gurçikan digire,

10-Bedenê ji hemû awayên penceşêran diparêze.

Rojê 3 caran 3-4 dilop rûn, bi qedeheke avê re bê vexwarin bes e.

Fêdeya sîr û lîmonê:

40-45 diranen sîran bikutin, 2 lître ava lîmona nûgivaştî berdin ser, di qawanozekê de devgirtî û bi kaxiz pêçayî di cihekî hênik de 25 rojan bidin seki-nandin, lê rojê carekê bişilqînin. Piştî 25 rojan heroj

2 caran nîv qedeha çayê jê vexwin. Ev awa, berê ji aliyê alimên Rûs hatiye dîtin, niha jî li Amerîkayê dest pê kirine.

Li gor hinek pisporan ev awa di pêşerojê de, di tibê de dê bibe şoreş. Bikêrhatinên wê em çiqas behs bikin em nikarin xilas bikin:

a) Hemû cureyên ‘edawên (kurmîbûn) ji û rehan tedawî dike.

b) Kolesterol û lipidê dadixe.

c)Şekirê xwînê dadixe, iştahê vedike û nûjenkirina pankirasê pêk tîne.

d)Kevir û xîzên sefra û gurçikan diheline.

e)Îdrarê zêde dike, di bedenê de hemû cureyên perçivîn û werman hiltîne.

f) Mikroba bi navê ‘Helycobacter Pylorî’dikuje, kul û birînên made û rûviya duwanzdepêçî tedawî dike.

g) Nûbûna sîstema hucreyên mejî, ji û rehan pêk tîne, refleksan xurt dike.

h) Pêşiya hemû ‘edawên bawîbûnan digire û hemû awayên êşên bawîbûnê kêm dike.

i) Li hember şel(felc)pir baş e.

j) Pêşiya hemû cureyên alerjiyan ji binî ve dibire û ji holê radike.

k) Li hember pençeşêran tevahiya bedenê diparêze.

ZİMANÊ KURDÎ

Mehmet YİLDİRİMÇAKAR

Seîdê Kurdî nivîseke bêhempa li ser Zimanê Kurdî di pirtûka xwe ye Dîwana Herbî ya 'Urfî de nivîsiye. Pêşiyê çêla rewşa Zimanê Kurdî têde kiriye :

"Kurdno! Zimanê we gelek bêserûber maye û tenê hinek çiqilên wî fandom/aşî kiriye. Zimanê we mîna Dara Tûbayê ya bihuştê xwedî şiyan e;lê belê jiber dilxaviyê dilê zimanê we şkestiye û giliyê we li rûmeta netewî dike."

Paşê mînakek dide:

"Mînakekî pêşkeşî we dikim ku; ew jî Xelîl Xeyalî ye di warê ziman de peşekiyê bi dest xistiye. Alfabe û gramera ku esasên zimanê me ne, aniye holê. Ji bo zimanê me yî netewî hîmek avêtiye."

Di dawiyê de jî şîretek li me kiriye:

"Ez mirovên bixîret şîret dikim ku li rêça wî herin û li ser hîmê wî ava bikin." Ev pirtûka tam sed sal berî niha di sala 1911'an de hatiye weşandin. Li wê rojê heta niha bav û kalên me yên ***xwedî xîret*** gelek xebat li ser Zimanê Kurdî kirine û zimanê me hatiye vê rojê. Çima xwedî xîret? Bifikirin; zimanekî ne zimanê perwerdehiyê hem jî qedexe. Encax mirovên ***xwedî xîret û bi rûmet*** dikarin di van mercên neyinî de xebatên bêhempa pêk bînin.

Ez dixwazim ku bal bikêşim hevokek jorê***."Tenê hinek çiqilên wî fandom/aşî kiriye."*** Belê sed sal derbas bûye lê hê jî hinek çiqilên zimanê me tenê aşî kiriye. Heta niha bi piranî li ser çand, huner û wêjeyê xebat hatine kirin. Ji ber vê yekê Kurdî di gelek qadên jiyanê de ji lîteratûra zanistiyê bêpar maye.

Divê Kurdî ne tenê di wêje, huner û çandê de pêş ve here, hewce ye di her qadê jiyanê de bi pêş keve û lîteratûra wê were avakirin. Ev kêmasiya girîng hêj li holê ye û nahêle em zimanê xwe bi hêsanî di her qadê de bikarbînin. Gelek caran dema em Kurdî dipeyivin wexta ku mijarekî zanistî derbas di be em verdigerin zimanên biyanî.

Bi kurtî, heta niha xebat bi giranî qada weje, huner û çandê de hatine kirin û qadên jiyanê yên din mîna matematîk, fîzîk, endezyarî,esmangerî û hwd hatine dilxawîkirin. Em bawerin zimanê me wekî zimanên din têra xwe heye. Em jî dixwazin vê bidin nîşan.

Pêwist e ku nivîskarên Kurd xebatan li ser zanistê jî bikin û bersiv bidin pêdiviyan. Bibin pêpelûkek ji bo Kurdî bibe zimanê zanistî. Guh bidin Seîdê Kurdî bi destûra Xwedê li ser hîmên bav û kalên me yên xwedî xîret ava bikin û di rêça wan de bimeşin. Dilê zimanê me yî şkestî şad bikin û rûmeta me ye netewî ser bilind bikin.

Em dizanin ev karekî ne hêsan e lê belê hewceye zivistan sar be ku mirov qîmeta biharê bizanibe.

ZIMANÊ KURDÎ: DO ÎRO Û SIBÊ

Rifat ABLAY

……ji ayetên tecellayî ixtilafa elsînayî
qe nezmek şaş tune li ba wî çi însan û çi cinnayî

Ez zarok bûm heta heft saliya xwe li gundê mala kalik û pîrika xwe, Kanîsipiya navçeya Çinarê ku girêdayî bi Diyarbekirê ye dimam. Sal zivirî dema xwendevaniya min hat, dê û bavê min xeber şandin da ku ez bêm li gundê xwe yî navçeya Şemrex a Mêrdînê ku navê wê Şewaşî ye dest bi dibistanê bikim. Ez giham gund, birayê min ê ji min bi çar salan meztir go: Mamostê me Mistefa bang li te dike. Em rabûn çûn ber hewşa mektebê û mamoste bi zimanekî ku hema ez bibêjim min qet nebihîstibû (wê çaxê jiber ku televîzyon û înternet, radyo pir tunebûn me jî hema bê me qet nebihîstibû. Jixwe birayê min ê mezin diçû pola 4. jî lê pir hindik zanibû bi wî zimanî biaxiviya) Xwedê giravî ji min dipirsî, qey digot tê werî dibistanê, birayê min jî wergera wê ji min re kir. Min jî serê xwe bi jêrve çend cara leqand bi ma'neya erê lê di zimanê min de jî gotina '**yoxx**' hebû ji min ku bi maneya erê (evet) bû.

Destpêka zimanê tirkî ji min re bi vî hawî dest pê kir; jixwe heta mektep qediya jî me pir ji hev fêm nekir. Rojekê em di pola duyemîn de ne, mamoste ji me re got bila yek ji we rabe, hîkayekê bibêje. Me go hîkaye çi ye law, hevalekî me yî ji pola çaremîn rabû û qala meseloka bizin û miyê kir. Me fêm kir ku mamoste ji me re dibêje rabin çîrokan bibêjin. Herwiha gelek mînakên balkêş hene. Pênc salan me xwend, bêyî ku em çend herfên tirkî bielimin me pir tişt fêm nekir, jixwe dê û bavê me jî pir tişt nizanibûn û herwiha dê û bavê wan jî. Em di dibistanê de bênc pol di nav hev de bûn. Me çiqas li berxwe dida jî em hînî tirkî nedibûn, lewra li nav malê û li nav gund hemû kes bi kurdî diaxivîn ji ber vê yekê me tiştek ji perwerdehiya xwe jî fêm nekir. Jixwe heta wan salan, ji gundê me jî pir xwendevanê lîse û zanîngehê dernediketin. Karê welatê me cotkarî, şivanî, 'emeletiya li Anadolê bû. Lê belê li hember vê perwerdeyê perwerdeyek me ye din jî hebû ew jî bi hatina seydayê gundê me Mela Salih kurê Seydayê Mela Îbrahîmê Birkî bû. Sal dozde meh zarokên gundê me çi qîz çi law xwendina quran, mewlûd, eqîde, nehcil enam, nûbihar û xayet -ul îxtîsar bi giştî perwerda dîn, bi zimanê zikmakî… Rola seydayê me ji bo perwerda me zarokan pir mezin bû heta ez wiha dibînim ku îro ez di tirkî di xwendina quranê û azanê duyemîn im ev a hanê giş bi xêra seyadayê min e. Piştî ku me perwerda xwe li cem Seyda qedand em şandin feqîtiyê û me dewam kir heta ku me zanîngeh jî li Stenbolê xelas kir me zimanê tirkî bi awayekî zorane hîn bûn.

Lê belê îro roj keça min a pênc salî heta îro ku ez pê re bi tirkî nepeyivîme dîsa jî pir bi kurdî nizane ji ber ku kanalên dewlata me, kolanên me û dibistanên me, mezinên me yên li bajaran giş pê re bi tirkî diaxivin heta diya wê; heta ku bavê min ê hema bêje qet bi tirkî nizane em derin gund bi tirkî pê re diaxive ew jî tirkiya xwe pêş de dibe. Di nav ewqas herc û mercê de hînkirina wan her wekî ne pêkan e heta ku perwerda wan neyê kirin bi kurdî.

Lê belê di van rojê han de mijarek gelek girîng di nav welatê me de dere û tê, ku zimanê kurdî jî di dibistanan de dibe dersek hilbijartî. Gelek meriv dixwazin û gelek jî dibên: madem em kurd in çima dersa zimanê me dibe dersa hilbijartî; bila bi giştî bi kurdî be. Belê dibe ku ev rewş têrê neke. Dibe ku em ji veya re nebêjin bes. Lê dîsa jî ev bidestxistin ne tiştekî hindike. Lewra heta îro zimanê kurdan ne di dibistanan tenê li kuçe û sikakan jî qedexe bû, îro roj ew astengiyana nemaye heta ku li camiyê welatê me mewludê me di televîzyona de bi kurdî tên xwendin, di zanîngehan de beşên kurdolojiyê tên vekirin. Ev gavên han li gor min gavên erênî ne, lewra ''tiştekî ku meriv nikaribe bigihêje giştahiya wî meriv dest ji ê ku bidest meriv dikeve jî bernade"lê belê ez dizanim ku wek mesela min a jor ew birayê meyî ku dibêjin em vê dersê naxwazin, erê dibêjin **yoxx** ew jî serê xwe berbijêr ve kildikin û dilê me bi giştî dibêje erê…lê bi vî awayî bidome perwerda zarokên kurdan bi kurdî jî neyê kirin di demek nêz de kurdî wê ji tedawulê rabe lewra em li zarokê merivên herî kurdparêz jî dinêrin bi kurdiyek gelek qels diaxivin heta meriv nikare bibêje kurdî ye.

Ev gavên 'ewil in, hêviya me avitina gavên mestir, girîgntir û xurtir e. Lewra ew qedexeyî yên dîrokê tu xêr neanîn ji bo tu kesî. Û divê birayên me yên tirk jî vê ji bîr nekin ku ne kurdî tenê hemû zimanê ku li ser rûyê erdê giş ayetên Xwedê ne û divê neyên înkarkirin.

XEBERA TO EST A?

Xebera to est a
Dêso sîyin, bero asinên, penceraya kore
Balişnaya mi, ranzaya mi, rêzila mi
Qandê cû ez şîya merg û ameya
Resimo xemgîn ke zulada mi do
Vînayoxê mi pîyazo kiho erşawito
Cixeraya mi qeranfîl boy dana
Wesar ameyo koyanê ci ê welatê min.

Nuştox: Ehmed Arîf
Tadayox: Ehmed Kirkan

HOLİ HOLA...!

Zimistonid vor varena ser ‘ard
Ow ard bena sipî ser siya’ra
Vor hemmû xiravi erzena bin xwe
Ow kelomono safî vona vindena

Vora sipî kuena ser ‘ard
‘Ard xwe nîpawena sipîtira
Verar şina aya hel vorra
Zona kî vor qe gonîtiye yîwa

Merdumuz gerek zê ‘ardiv in hayatid
Ay çiyeg yî ben ser riyiya rindid
Verar şiyer ayon pyerunra
Ow sipîtiyê hayetê xwe biyar ca

Eg komig von “ina hina niya
Mar luzum nîken ma hay riyîra”
Ina dinyad xiravî çita arda?
Bizonen her wext “HOLÎ HOLA..!”

Merdûmek dest xwera nîverd ra holî
Ow merdûmra çire yen ca xiravî?
Homa qe holi emir dawa ser kitavî
Aya kitavid qe inson Holi pyera omî yo cayî

Selapati PAMENDÎ

Mirina Reş

Yakup AYKAÇ

Li her derê xem û keser. Agir, mij û dûman. Sêpêyek li navîna meydanê danîne. Dengê gîrînê bilind dibe. Mirov berhev bûne. Dûrve lorandina dayikekê tê…

Ferman derxistine ji bo kurê min
Hawar hevalno, hawar cîrano, hawar bisilmano
Destê wan hişk be, lawikê min darda kirine…
Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo…
Gotin padişah ew fermana reş derxistiye,
Padişaho, padişaho, padişaho…
Xwedê agir li ser te bibarîne
Padişaho, mal wêrano, kok qelyayo
Te mala min xira kir, qesra te jî bila li ser de tep be…
Kurekî min hebû ew jî te nehişt, gumanê min j'Xwedê ye bila Ew jî te nehêlê
Dilêm îro xem û kul e hey felek, hey felek, hey felek…
Şabedînê min mînanî pehlewanan bû,
Aqilmendê me bû, rêberê wezîr û padîşahan bû, xwediyê me bû…
Gula dîwanan bû,
Lêdan çilmisandin ew gula nesêle…
Sî şeş sal 'emrê xwe temam nekiribû
Mînanî tirhê dara bû, hêj kok nedabû, çîlê wî hêj geş nebibû…
We tirhê min qetandin, Xwedê jî bila we biqetîne…
Wey lê lê, wey lê lê, wey lê lê…

Û wiha dirêj dibû diçû lorîka dayîkê. Me'na mirinê herî rind dayîk dizanin. Rengê wê jî û dêngê wê jî. Dayik derd, êş û jana mirinê di kûrahiya dilên xwe de dijîn. Kes nizane, kes nabihê. Ew dayika li ber sêpê sekiniye û ketiye 'erdê ew jî wiha ye. Kurê wî serê sibê hatibû dardakirin. Bedena wî hêj li ser sêpê bû. Bedenek, hêj 36 salê xwe tijî nekiriye. Navê wî **Şehabeddîn Suhrewerdî**. Li Bajarê Helebê îro agir dibare. Sal 1191 e. Zeman derbas dibe. Heyam diguhere lê lihevrasthatina mirin û kurdan ne diguhere ne jî paş dikeve. Belê, ji wê rewşê re encax gotinek heye: Hawar!

Îro ‘esman rengê xwe li ‘erdê hildaye. Hinek tarî ye. Rojeke reş e. ji aliyekî jî Xaçperest li ser welatê Kurdan teşî dirêsin. Li her derê xirecirek… Kê, li ku derê, çi dike ne diyar e. Sixûr tijî nav gelê Kurdan bûne. Kî rast e, kî nerast e xwe eşkere nake. Giyan di devê gur de ne. Rojê yekî an darda dikin an dixeniqînin an jî winda dikin. Rewş xerab e.

Lê hal û rewş her çibe jî mirin mirin e. Û niha kes nikare di cihê wê dayîkê de be. Laşê kurê wî di sêpê de bi xuşe xuşa bayê re hêdîka diheje. Bedenek spî çîl. Rûyek bi nûr. Kirasek li xwe kiriye. Bêdeng e. Dûrve wisa xuya dike ku ew jî, tev dayîka xwe, di sêpê de tîke tîk sekiniye û guhdariya dengê bêdengiya mirinê dike. Herkes belav bûye. Li meydanê xêncî kur û dayîk kesek tune ye. Suhrewerdî dardakirine û paşê jî qey ew jî dijmin û neyar têr nekirine ku piştre jî gotine: “kî cendekê Suhrewerdî dayne ‘erdê ew jî yê were dardakirin.” Hey li min! Ew çi hal e? Dijminatîke wiha li ku derê heye? De bêjin, çima dardakirin ew xortê çeleng û ‘egit?

Çend meh beriya hingê dîsa gengeşiyeke xurt di navbera Suhrewerdî û ‘alimên Helebê de çêbibû. Weke her car Suhrewerdî bi ser ketibû. Piştî wê gengeşiyê navbera wan ‘aliman vebû. ‘Alimên Helebê çûn alikî Suhrewerdî çû alikî. Suhrewerdî êdî piştî wê gengeşiyê, di dawiyê de tenê mabû lê pişt gotinên xwe bû. Her çi digot bi birhanan li wan dipeyitant. Yek, do, sê... ev hal ‘alimên Helebê acizkiribû. Ji ber wê yekê, ‘alimên Helebê berhev bûbûn û ji parêzgarê Helebê re giliyê Suhrewerdî kiribûn ji ber ku qaşo Suhrewerdî nifaq dixist navbera wan. Guhdarî kirin ku yek ji ‘idam kirina sedema Suhrewerdî ev bû. Xêncî wê, di nav komek de paşbêjiyek derketibû ku digotin Suhrewerdî peyxemberiya xwe ragihandiye. Kenehû Suhrewerdî peyxember e. Çawa galgaleke welê derketibû holê. ‘Alimek yekî mînanî Suhrewerdî, ‘alimê heyama xwe, çawa dibe ku dibêje -haşa- ez peyxemberê dawiyê me. Ew guman nîn bû. Lê çend mirov derketibûn holê û ew derew belav kiribûn. Ji ber wê, dijminatiyek kûrahî hemberî Suhrewerdî qewimîbû. Li aliyê din jî, rêbariya Xaçperestan li ser Eyyubiyan kêm nedibû. Lewre Selahadînê Kurdî bajarê Qudsê ji destê wan standibû û ew jî ji wan re bûbû kul û derd. Bi wê yekê sîxurên xaçperestan di nav Eyyubiyan de kêm nedibûn û di navbera ‘aliman û dewletê de lîstikên siyasî ava dikirin. Li ser ‘alimên hêja teşiyên siyasî dirisîn. Guhdarî dikin ku teşiyek jî li serê Suhrewerdî risîbû.

Belê, piştî mirina Suhrewerdî gelek tişt pêk hatibû. Kîjan rast bû û kî ‘emrê dardakirina wî dabû ew kifş nebû. Lê tiştekî rast hebû ku ew jî li holê bû: ew xortê sî û şeş salî li nava meydanê li ser sêpêyekê hatibû dardakirin. Êdî navlêka wî maqtul bû, El-Maqtul. Dinya dê navê wî paşê bi Suhrewerdî el-Maqtul bibîhîsta. Lewre, li gorî ‘umrê xwe zêde zêde pirtûk nivîsîbû.

Ew xortê dardakirî ‘alimek hêja bû. Di ‘emrê xwe yê kurtik de tam 49 pirtûk nivîsîbûn. Hêsan nîn bû. Di wan demên zor û dijwar de, nav wan teşqeleyên bêdawî de 49 pirtûk. Li ser **felsefeya îşraq** wekî momosteyê mezin dihate pejirandin. Suhrewerdî bi zanayî navê wê felsefeyê “îşraq” danîbû. Lewre mana îşraqê di ‘Erebiyê de “rojhilat” bû. Yanê ku ‘ilm û ‘irfan li rojhilatê diza û li ser dinyayê li vir belav dibû. Felsefeya îşraq li dijî ekola Meşşaiyan derketibû. Rêgezên felsefeya wî hes/pêhesî, vedîtin/keşf û hest/sirûş/îlham bû. Lewre li gorî Suhrewerdî mirov bi riya aqil nikare bigîhije rastiyê. Lewma ku hê ji mêj ve, piştî Arîsto, feylesofên ku riya aqil diçin her tim rabezîne hev. Suhrewerdî felsefeya xwe di nav pirtûka xwe ya **Hikmetu’l Îşraq** de libo libo vegotibû. Piştî wan xebatên Suhrewerdî, felsefeya îşraq bala ‘aliman kişand ser xwe. Suhrewerdî li ser îşraqê dişixulî, tevî ‘aliman gengeşî dikir. Ramanên xwe bi ‘aliman re digot, ramanên wan distand. Suhrewerdî beriya ku hatibû Helebê li gelek cihan geriyabû. Li Amedê, Farqînê mabû. Li welatê Artûqlûyan hemî geriyabû piştre çûbû Qonyayê. Demekê li welatê Selçûklûyan mabû. Piştî gerîna Anatoliyayê hatibû Helebê. Ji ber wê yekê gelek ‘alim û zanyarên hêja naskiribû û beşdariya suhbetên wan kiribû. Ev tişt hemî ramanên Suhrewerdî perisandibûn. Suhrewerdî tevî xortbûna xwe ‘emrê xwe yê herî gihîştî dijiya. Lê dîsa jî ber çavên dayika xwe hêj mîna zarokekî bû.

Çawa bûbû ku ‘alimek welê hêja hatibû dardakirin? Tiştê bûyî re çare tunebû. Ew ên ku diçin êdî nikarin bizivirin. Suhrewerdî jî wisa bû. Ew jî çûbu û herkes jî dizane ku ew jî êdî venagere. Lê bedena wî hêj germ bû. Hêj sartiya mirinê bi giştî li termê wî nealiyabû. Lê çarê ji wê re jî tunebû. Her mirov jixwe dê bimire lê mirin bona Suhrewerdî zû hatibû. Bayek hişk û germ dihat. Tavê hundirê mirovan dikeland. Tîrojên rojê bûbûn tîr ji nav dilên dayîka Suhrewerdî re derbas dibûn. Lê dayîk pê nedihesiya lewre êş û jana kurê wî ji xwe di nav temarê wî de xwîn hişk kiribû. Rengê asoyê mînanî rengê xwînê sor û gevez e. Roj ava dibe. Dil xemgin e. Lê lorîka dayîkê berdewam dike…

ŞÊX NEBÎ

Amadekar: M.Emin DEMİR

Di nav welatê kurdan de her wextî girîngiya şêx, axa, mîr, beg û malmezinan zêde bû. Ji ber ku bi hezaran mirov û malbat li cem mirovên wisa kom dibûn, guhê xwe didan gotinên wan û li dû wan dimeşiyan. Bandora şêx, axa, mîr û began li ser civaka kurdan geleki zêde bû. Ji van jî di nav civakê de rola herî girîng ya şêxan bû. Lewre hem aliyê wan yê olî û hem jî yê civakî hebû. Barê civakê yê giran li ser milên wan bû. Di nav welatê kurdan de kêmasiya desthilatdariya dûgelê jî girîngiya wan zêde û rola wan ya ku di nav civakê de dileyistin mezin dikir. Kurdan tengezarî û gengeşî di nav xwe de bêyî ku serî li saziyê dûgelê bidin, bi qasidiya şêx, axa, mîr û began di nav xwe de çareser dikirin.

Şêx herêma ku lê dijiyan, hem ji civakê re rêberî dikirin û hem jî çareseriya pirsgirêkên civakê jî li ser milên wan bû. Ji bo ku civak bi aramî bijiya hewl didan. Medrese vedikirin, feqî û xwendevan xwedî dikirin û bi xwendina wan ‘eleqedar dibûn. Bi xizmetên xwe ji civaka kurd û Kurdistanê re dibûn riyeke ronahî. Ji vana yek jî yê ku xizmeta wî ji gelê kurd re gelekî zêde bû, li herêma Pirsûs (Sirûc) ê Seyîd Şêx Nebî bû.

Seyîd Şêx Nebî nêzîkî salên 1815 – 1880 li gundê Ziyaretê yê ku girêdayî navçeya Pirsûsa Riha yê jiyaye. Şêx Nebî di wextê xwe de ji aliyê gel ve wek sencaq’a Pirsûsê dihat pejirandin. Ji Deşta Pirsûsê ji ber pirbûna ‘egîtan dihate gotin ku Deşta Sirûcê ‘embara mêran, ji 92 ‘egîtên Sirûcê yek jî Şêx Nebî bû. Dengbêjan li ser wî helbestên wisa digotin.

Şêx Nebî yê Şêx Bozan
Sencaqa çewliga Deşta Sirûcê
Reîsê ‘eşîra şêxa,
Siyarê hespê bitezen, bavê Nûh û Osmên

Şêx Nebî gelek qutabî dan xwendin, murîdên wî z’ehf bûn û ji gelê xwe re xizmetên giranbiha kirin. Xizmetên wî hem olî û hem jî civakî bûn. Emê qala çend serpêhatî û xizmetê Şêx Nebî bikin.

Di dema berê de li herêma Rihayê talana ‘ereban z’ehf bûne. Ji ber xela û tunebûnê ‘ereb gelek caran ji bo talanê dihatin welatê kurdan û di nav wan de şerên mezin diqewimîn. Şêx Nebî ji ber ku pêşiyê li ber vê talanê bigire di nav kurdan û ‘ereban de li mintiqa Reqqayê tixûbek diyar kir da ku tu kes sînorê kesî îşxal neke. Ev sînor ji bakurê Reqqayê heta Çemê Ferat e. Ji vî sînorî re ‘ereban oxî digotin û ev sînor di roja me de jî diyar e. Piştî ku Şêx Nebî vî tixûbî diyar dike careke din ‘ereb vî tixûbî derbas nakin.

Rojekê Brahîm paşa zarokên dewlemendên Rihayê dîl digire û di zîndana de îşkencê bi wan dike. Li ser vê, malbatên zarokan tên cem Şêx Nebî jê tika dikin da ku zarokên wan ji vê zilmê xelas bike. Şêx Nebî û siwariyê xwe û hin ‘eşîrên din diçin ba Brahîm paşa ji bo ku zarokan berde lêbelê, Brahîm paşa daxwaza wan qebûl nake. Li ser vê Şêx Nebî şûrê xwe li benê konê Brahîm paşa dixîne û konê wî xirab dikin. Dûvre Brahîm paşa wan zarokên dîl girtî serbest berdide. Şêx Nebî û hevalên xwe li vegerê ji hêla gel ve bi kêfxweşî û bi coş tên pêşwazîkirin.

Xwedê te’ala di van rojên kurdan ên tengezar de mirovên wek Şêx Nebî ji nav gelê kurd kêm neke.

Jêderk : Tarih boyunca aşiretçilik ve Şanlıurfa aşiretleri tarihi. (weşanên İmaj – 2003)

Çîroka Xewnê

Sadık YALSIZUÇANLAR
Ji tirkî: Rojbîn ÖZKAN

Bi tirs ji xew şiyar bû. Ji diya xwe re xewna xwe vegot.

Şev bû.

Bahoza xîzê çêbû. Dev û bêvilên me tijî xîz bûbû.

Me pêşiya xwe nedidît.

Em tî û birçî bûn. Herkes digîriya.

Rewşa me qet nebaş bû.

Ji nişkê ve her der ronî bû.

Bahoz tebitî.

Mirovekî rû şewl hat. Me sîwarê darekî kir ku, ew dar dikarîbû di çolê de bimeş e.

Û em birin ba pelê kulîlkeke bi tac.

Dayika wê, xewna wê şîrove kir û got:

berxa min te rastî dîtiye.

Çol dinya me ye.

Bahoza xîzê jî heyîniyên ku li rûyê erdê vedinişin û koçber dibin ew in.

mirovên dilbirîn pêşerojên xwe tarî dibînin. Kes qêrîna wî nabihîze.

Giyanê wî tî û birçî ye. Dinya ji bo wî mêvanxaneyek e.

Mirov, mevanên Xwedayê mihrîban in.

Ew mirovê rû şewl ê ku we xelas kir nûnerê Xweda ye.

Ew ronahiya ku aniye jî, bihuşt e. Bihuşt kulîlk e.

Zarok bi hêviya ku dîsa xewn bibîne. Bi xew re çû.